

Pênûs

Kovareke rewşenbîrî giştî ye

Rostem I

Socin û Prym

Tîpguhastin: Cankurd

Hunera helbestê

Heyder Omer

Gelê Kurd li Kurdistanâ Sûriyê

Xeleka sêhem

Dr. Ebdilmecit Şêxo

1915

Pîr Rustem

Bi Erebi-

برج الصست

جمعية الداود



Efrîn



Pênûs

Kovareke rewşenbîrî giştî ye

**Kovareke rewşenbîrî giştî ye
Her sê mehan carekê der dikeve**

Sernivîser

Dr. Evdilmeçit Şêxo

mecidshexo@hotmail.com

Detseya nivîseran

Keça kurd: serastkirina zimanê kurdî

H. Gundî

Eli Cafer

Cim'a al-Dawod

berge
Çapxane

Reşad Yûsif
BABOL Druck
Köln

Navîşan û Email

www.efrin.net/penus
kovarapenus@hotmail.com

Her nivîskarek di ber berhema xwe de ; di ber
nêrîn , dîtin û helwesta xwe de bepirsyar e.
"Pênûs" wî maffî dide xwe ku hemû nîvîsarên
ku jê re têñ, li gor rêziman û rastnîvîsandina
mîrê Kurmanciya nûjen
Celadet Bedir-Xan, serast bike.

Pênûs

Jî weşanêñ

Partiya Yekîtî a Demokrat a Kurd II Sûriyê -
(YEKİTİ) Rêexistina Europa



Penüs

Kovareke rewşenbîrî giştî ye

Hejmar / 18

Havîn / 2005

Naverok

Sergotar _____ 3

Keviran davêjin esmên

F.G.Lorka

Wergera Husêñ Hebeş-----7

Rostem I

Socin û Prym

Tîpguhastin: Cankurd-----9

Têbîniyêñ li ser Kurdan û Sûriyê

Dr. Zorab Aloian-----27

Hunera helbestê

Heyder Omer-----31

Bingehêñ Gotinê

Keca kurd-----42

Gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê

Dîrok,rêxistin,siyaset

Xeleka sêhem

Dr. Ebdilmecît Şêxo-----50

Çêrok

1915

Pîr Rustem-----64

POR GULÎVANKÊ

Nîzamettî Akkurt-----69

NAMEYA PÎROZBAYIYÊ-----84

Lêborîn-----86

Bi Erebî-----

www.arsivakurdji.org

SERGOTAR

“Welatek ava nabe, eger di wî welatî de, yasa tune be, lewra jî, gelên ku di bin nîrê setemkariyê de dijîn, bê welat in .”

San Gust

Berêzan!

Di vê dema borî de, jiyana siyasî li Rojhilata Navîn encamên pir kîrhatî hatine holê, têkoşanên gelên azadîxwaz berhemdar bûn, eniya dîroka gelên kurdistana başurê mezin û netewên Îraqê bi rûxandina hovtirîn dikttetur û bi serkewtinên dêmokrat hatiye xemlandin. Giringtirîn bûyer di cîhana ramyarî de, ku têkoşer û siyasetmedarê gewre mam Celal Talbanî bi erêkirina hevpeymana kurdistanî, di encumena niştimanî ya Îraqê, di 6.04.2005 an de wek serkomarê Îraqa fêderal hate hilbijartin. Bûyera dîrokî ya duhem, ku herdu hukumetên Hewlîr û Sulêmaniyê bûne yek, berêz Nêçîrvan Berzanî dibe serokê hukumeta Kurdistanê û rêzdar Ednan Muftî jî wek serokê perlemana Kurdistanê hate hilbijartin.

Di 12.06.2005an de encumena Kurdistanê, pêşmergê herî mezin û navdar, kek Mesud Berzanî wek serokê herêma Kurdistanê hildibijêre.

Di rastiyê de, ewan bûyerên jorîn ne tenê li nik kurdistana bashurê mezin û Îraqê, cihêن shehnaziya nin, lê gelê me li her sê besê din jî, bi van serketinan, xwe serfiraz û serbilind dibîne, bi milyonan kurdistanî hestêن xwe yên dilşdiyê derbrîn, û gotin, kek Mesud ne tenê layiq e, ku bibe serokê kurdistana başûrê mezin, lê ew layiq e, bibe serokê 40

milyon kurdistanî jî.

Eger çiqas hin dewletên dirawsê wek Turkiyê, û Sûriyê, li gel pir partî, an 6rêxistinê kevneperst û ne dêmokrat astengan li pêş rêveçûna dêmokratiyê li Îraqa nû û azadiya Kurdistanê durist bikin, an jî, bi hev re pîlanan li dijî Îraqa nû bihûnin, lê rêberê Kurdistanê, bi palpişta gelê xwe û bi berxwedanê resen li Bexdada nû berevaniya fêderaliyê û erdnîgariya Kurdistanê dikan.

Di vê sebaretê de, hêjayê gotinê ye, ku em pêşengên bizava azadîxwaz û cemawerên Kurd li hemî perçeyên kurdistanê û di sereta de herdu serokêن nasdar, berêzan kek Mesud Berzanî û mam Celal Talbanî pîroz bikin.

Li Turkiyê jî, serokşalyar R.T. Ordegan di 10.08.2005 an de pêşwaziya 151 rewşenbîrên Turkiyê kir, ewanan vekirî bi Ordegan re goti bûn, "pêwîst e pirsa kurdî li Turkiyê bi awakî dêmokrat û di çarçewa yekbûna welêt û neteweyekê de çareser bibe, ..." piştî vê yekser Ordegan seredanê li Amedê dike, li wir kurdistanî bi gul û govendan, wî pêşwazî dikan, li pêş cemawerê Kurd, ewî weha goti bû, "Dewletên mezin jî kanîn şaşîyan bikin, em dixwazin dêmokratiyê ji bo kêşa kurdî pirtir bikin û pirsgirêka Kurdan jî rastiyek e."

Eger em wek çavdîrên siyasi, van peyv û sozên Ordegan bişopînin, û bi çavên dîrokî li rabordiyê serdarên Turkiyê vejerin, emê bi hesanî gelek xopandinê siyasi ji aliyê Toranan de bibînin. Damezrênerê Turkiya nû, Kemal Ataturk jî di rewşike siyasi dijwar de, çû bû Kurdistanê, bi serok û oldarê Kurdan re rûnişti bû, û bi wan re weha goti bû, "Eger hun alîkariya me li dijî hêrişen Yonaniyan bikin, emê mafêñ netewî bidin we.

"Li gor vê sozê, hêz û kesayetiyên Kurd alîkariya Turkiyê kirin, û Tirkîyê bi piştvaniya Kurdan, kanî bû Yonanê serniva ji Tirkîyê derxista.

Berî serdana Ordigan li Amedê, gelek serokwezîrên din jî wek S.Dêmêrêl, T.çêler çûne Kurdistanê, û sozên çareserkirina kêşeya Kurdî dabûn miletê me.

Hercarê ku Kemalîstên şovenîst, li jêr sîbera têkarî û egerên dervayî xwe di tengayê de dibînin, hin sozên bê bingeh û ne pelandî didin Kurdan, û eger ewanan berê çiqas soz dabûn gelê me, lê herdem sozên wan di

çarçewa van xalên jêrîn da bûn; Turkiyê yek dewlet e, di bin yek al da ye, Turkiyê yek netewe, yek ziman e yek çande.

Evan hemî xêzên sor bûn, lê niha Ordegan û di nirîna me de, piştî rîdana Cenêralên Kemalist, du xêzên sor (ziman û çand) bi gotinan derbaz kirin.

Eger sedemên vê ragiyandinê ji bo endametiya YE be jî, dîsan gelê Kurd bi Ordîgan re dibêje, erê, lê pirsgirêka me, netaweyeti, rêzanî, mîjoyî, û erdnîgarî ye û ne tenê ziman û çand nin. Eger hukumeta Lubnanê ,yan ya Urdinê ji Kurdên nav xwe re,pirsên zimanî û çandî çareser bikin, ewan dewletan dîbin xawenî biryarên dadmend û rewa, lê eger biryara Ordegan rast be jî,ewa ne MAFÊ ÇARENÛSÎ ye û ewa dibe dadmendiyeke pir melul û SERXWAR.

Li Îranê, li gor hin belge û ragiyandinan,ku serkomarê nû, destêن xwe di gelek bûyerên têrorîstî li Îranê û li dervayê welêt de pir dirêj bûn, vêca, ji bili karêن hovane li dijî vîna azadiyê,dê demokratîxwaz ci hêviyan ji vî oldarê kevneperest û rastrewî bikin?

Piştî işkencikirina ciwanê Kurd Şivan Qadir û şehîhdbûna wî,gelê Kurd di 7.08.2005 an de bi xwepêşandanêna aştiyane hukumeta şerxwaz bersivand,lê hukumetê jî, çend bajarêن Kurdistanê tijî leşger kirin û hêriş birin ser xwepêşandarêن Kurdistanî, di encamê de,20 kurd şehîd bûn, bi sedan ji wan, jin, mîr birîndar bûn,û bi sedan jî kurdperwer hatin zîndan kirin .

Lê hîn berî van karêن têrorîstî, serdarêن regezperest, derçûna weşanêن kurdî li Tehranê wek "Aso"û "Aşitî"qedexe kirin.

û bi serda jî sernivîsera kovara "Resen" Dr.Roya Toloo di 2.08.2005an de li Sine girtin û xistin zînadanê .

Em di vê baweriye de ne, ku neviyên serkomarê Kurdistanê, nemir Qazî Muhemed û demokratîxwazêن Faris û netewêن din, nema kanin di sedsala 21 ê,û di nav van pêlên azadiyê û serxwebûnêna dewletan li chîhanê de, serêن xwe ji oldarêن kevneperest re bitewînin,lewra em dîsan dibêjin, dermanê nexwaşiyê hemu destlatdarêن paşverû û şerxwaz,tenê pêşverû,demokratî,aştîxwaz,wekheviya gelan in.û serdema me, ji vir pê de, van nexweşiyê kujdar nema gotir dike.

Di sebaret Sûriyê de pirî caran hatiye gotin,ku serdarên welatên Ereban kanin bi hêsanî welatên xwe bifroşin, lê ewanan, ne amede ne bi hêsanî kursiyêن xwe bi cihbihêlin Hukumeta Esedê duhem jî li ser çend werîsan dilîze,ewa niha hîn ji berê pirtir tengijî ye,cîhana siyasî berxwe dide, ku hawîrdora wî teng bike, şîret û pêşniyarêن welatên ewropî, daxawaz û lavayêن civata şaristanî li Sûriyê, berxwedan û bangawazêن tevgera kurdî, rêexistinêن mafêن mirovan li hundir û li dervayê welêt,û bi ser da jî gefgûrêن Emêrika ji hukumeta Sûriyê re, serêن serdarêن partiya Bees nerm ne kirine.

Yasa li Sûriyê tune ye, aboriya welêt gelek sernizim û şermokî ye,çapemeniyêن azad pişt şikestî ne,partîyêن tevgera kurdî û yên démokratîxwaz bê rôdana dewletê bizavêن xwe dikin, li gor biryara kongira Bees a dehan jî, dîsan partiya Bess di desturê de,partiya pêşeng e,û pêwist e ew dewletê û civakê bi rêve bibe.

Partiya şovenîst hîn weke berê di karên têrorîstiye de,nemaze li dijî Kurdan ,berdewam e.kuştina Dr. M .M El-xiznewî bi awakî dirindane,nimûneyeke geş e. .

Li hember vê siyasetê,çalakiyênaştıyaneweke xwepêşandanêncemawerî li hemî şarên kurdî û erbî erkeke siyasî û têkoşînî ye û ewnan yek ji şêweyêن pir rewa û dadmend in,lewra jî em serêن xwe li pêş hemî şehîdêن xwepêşandanânditewînî,û daxwaza serbestkirina hemî girtiyêن welatparêz û démokratxazêن Sûriyê dikin .

Li dawiyê em dixwazin,nirfinênen xwe bi dubarekirina peyva Celal Cewahir Lal Nêho kuta bînin û wê weke biruskekê arastî karbidest û dagîrkerêن Kurdistanê bikin,ewî goti bû”..çawa mirov dikane bawer bike, ku berdewamkirina zordestiya milettekî gengaz e,eğer ew milet bi pîdarî daxwaza azadiyê dike, û ji bo pêkanîna wê, ew gel amede ye,buha û nirxênen pêwîst ji bo serbestiya xwe bide ...”

Sernivêser

23.08.2005



Keviran davêjin esmên

Pexşana dawiyê (Fragment)

Fedîrico Garsîya Lorka (1898 – 1936)

Wergera Husêن Hebeş (12.07.2005)
û Ines Hagemeyer (1998)

Pêşgotin ji vê minhoyê re:

Ev minhoya "Keviran davêjin esmên" perçepaxşana dawiyê, ya ku Fêdêrîko Garsiya Lorka nivisiye.

Xizmeke wî di sedsaliya bûyîna Lorka de, li mala wî dîti bû, û ewa di rojnama spanî ABC -ê de belav kiri.

Wêjevan Ines Hagemeyer ew têksta wergerand elmanî. I.Hagemeyer li Berlinê hatiye dinê, li gel malbata xwe çûye Ûrogway, û ew li Motêvêdyo mezin bû ye, li wir û li Elmaniya xwendîye, wek mamosta zimanê elmanî li Geothe- Institut, û li pir welatên spanîaxêv xebitiye.

Ew ji sala 1981-ê de di rêdeksyona kovara "Dichtungring" de dixebite, min ew di civîneke rêexistina "Yekîtiya Nivîskarên Elman" de, li Bonnê nas kir û jê xwest, ku rê bide min ez jî vê berhemê wergerînim kurdî. Di nameya xwe ya di 30.06.2005 de ji min re nivîsî bû, şabûna xwe bi wê pêşniyazê numa kir û ewî rêdana wergeran-dina vê fragmîntê da min. û ez jî li gel pir spasiyên xwe ji berêz I. Hagemeyer re, wergera wê pêşkêşî rewşenbîr û xwendevanê Kurd dikim.

Husêن Hebeş

Gava keviran davêjine esmên,
sirweya êvarkî dilerze!
Weha ji min re cobarê meng şirove
dike, ku çawa ji wan candaran
ditirse.
Ji dûr ve min carekê dît, ku
kalemêrek û xortek dihatin.
Rûyên wan sirî bûn û destêن wan
dirêj dirêj bû bûn.
Dema herdu seyran-geran,
helperîna matmayî ya Kevi-ran li
nav kewşenê dîtin, ewan di cihêن
xwe derawestiyan. û yê xort got: “
Zaro deriyê camanî kevir dikan.” li
ser wê yekê kalemêr bersivand:“
Ew bi meraq li abedînê digerin û di
ber re keseran dikşînin.”

Derbasbûna keviran di ser wî
pêşgirê neçemyayî re bizaveke
pesindar ji binketina kuştinî re
peyda kir.
Bi saya karkirina dilê hêzdar
kereste (madde, Materie)
têvejandin.
Ew kevirên li nîvê rê ketine, tibê

ew li wê mirinê., dudilî ne ,hin jî
serikên xwe ye pêryanî xwar kirin
û bi nermî dahatin.
Hineke din jî weke çavine
vekirî,ku çawa tîreke birûskanî li
wan dabe û kor kiribin, xwave
dihatin.
Piraniya wan bi şayanî tewjma
bayê guhêrbar gotir kirin û her carê
gava li orta dîwarê çavrênekirî
diketin, ew bi sergêjî û xwîlibûyî li
ser erdê tol dibûn.
Kevirên ji aliyêن zaroyên por reş,
por sîs û por qehwerengî de dihatin
avêtin.
Her kevirek xwedî rengek û têvel
hest bû.Hinek ji wan mîna pozê
tîrekê bûn, hinke jî nola serê ava ji
bîrekê de hildavêt bûn.

Kalemêrê rîwî bi xemgînî li
komika zaroyan nirî û axavt:
„Xwedê civîk afrandin, dem kevir
avêtine asmên” Û şevê dest bi
gerîna xwe kir.

Rostem I

Socin û Prym

Tîpguhastin: Cankurd

Çêroka Rostem, ji pirtûka herdu rojhilatnasên mezin **Albert Socin** û **Eugen Prym** ên alman (**Berhevoka çêrokêk kurmancî**), ku di sedsala 19ê de bi Kurdî û Almanî nivisandine û li ba Instituta Rojhilatnasiyê li **Petersbourgê** li **Rûsiya** belav kirine, bi dest min ket. Min bi lez û bez dest bi guhastina tîpêñ wê kir, ji ber ku wan –tevî ku bi tîpêñ latînî nivisandine- ji ber ciyawaziya tîpêñ kurdî ji ên almanî, bi şêweyekî nivisandine û bi taybetî tîpêñ dengdêr, ku bi rastî pêdiviya nûkirinê ne, her kesek nikare bi asanî wan metnan bixwêne.

Min dît, ku pêwîste ev metin bêne asankirin, bi Kurdiya nûjen ser ji nû ve bêne nivisandin. Di vê xebatê da min gelek dem derbas kir û ez tê de westiyam, lê ji ber ku ev xebat divêbihata kirin û bi taybetî ji bo paristina kelepûra neteweya Kurd.

Niviskarê vê parçeya hêja di serî de gotiye, ku wî pir giranî di nivisandina metnên Rostem de dîtiye, demekê dev jê berdaye û paşê dîsa lê vegeriyaye, lew re dubarekin di hin deran û hinek çewtî, weku wî bi xwe gotiye, derketine holê.

Cankurd

ROSTEM I

Go carek ji cara, rehmet li dêy babêd gohdara, go Zilxetê (*Zelxê*) li Solmê bû, Hemze li Mekkê û Medînê bû, Keyxisra (*Xışra*) paşa, paşayê Îranê bû, Rostem fêrisê wî bû, pêncî û pênc fêris (*li*) ser textê Îranê rûniştî bûn, bêjim te kî bû, kî ne bû, navê wan bêjim:
Rostem bû kurê Zalê, Zalê kurê Qarê bû, Qar kurê Samê bû, Sam kurê Pîrî bû, Pîr kurê Nelima bû, Nelima kurê Qawiya (*Kawa*) bû, Qawiya kurê Qeyteran bû, Qeyteran kurê Qamêran (*Kamran*) bû [*Di vir da zincîra bavikan wilo jî hatiye: Xantûzî, Xan Qubad, Gêve û Gohderz, Feremes, Feremes Êxnîk..*] Qamêran ji neviyê Adem bû (*Kamêran nevixê Adem bû*).

Gurgî kurê Meladî bû, Fêders zavayê Rostemî bû, Bêjan xwarza ê Rostemî bû, Gurnîs birayê Rostemî bû, Kasimê (*Qasimê*) kun (*kût*) xwaher, Feremesê (*Feremezê*) xînc (*meqlüb*) bû, dîwana efresayî kafira (*Tûranê*) bû. Navêd hakimêt wî navêd bajara bûn (*navê hakimê wî bajarê bû*).

Got hat qaqqanê (*xaqqanê*) Çinî, hat pîlabendê (*polabendê*) hindî (*bû*), hat Çikepisê berberî, hat Çikepisê kaşanî, hat Selmanê sindî, hat Pîranê vay sermalê xweyî bû, Pîranî Kendekanî, Hemêtat Cemşîş (*Cemşîr*) Cemşar fêrisê di Efresayî bûn [*Eva dîwanê Efresayî bûn*].

Rojeg (*rojek*) rabû Rostem, li cil û çar mehtera xorî, li Rexşa Belek [*Navê hespê Rostem e*] vepelijî (*vepelisi*), mexes û gulweşîn kir, zîn avête ser piştê (*zînê Meroze*), tang û baletangêd wî şidandin, rikêbed yaldûzî pê ve kirin, şeş gaze çingala ber qelûsa zînî ra kirin, ligavê zêrî da ser, gulîsk û kotik jê berdan, gehîp û dirkerk tê deynan. Rostem rabû ji pê ve, bejn û bala xwe ma fikirî hev zêrî hev kumzêrî ser êk û du wergirtin, tîr û kevan ber pişta xwe ra kirin, îna keşerî (*qeşerî*) bi stûyê xwe (*ve*) dakêşa, hungustîra fetixî (*fethî*) kire tiliya xwe, Elmasê hindî

avête pişta xwe, çekmanûyê zer pê xwe da kêşa, kotiya (*qutiya*) dohnê senedûkî (*seledûkî*), milxamê silêmanî avête delxanê da, pê xwe kire rikêbê, suwar bû. Dez (*dest*) avêde (*avête*) gurzê giran, hezar û êk xûnkarî (*xunkari*) deyna ser milê xwe, destê çepê avêt ruma heşde gaz(*i*), deyna ser milê xwe, rikêbe li Rexşa Belek da. Ji akarê (*erdê*) Îranê derket, çû, rabû nêçirê.

Nêçirê xwe kir heta nîro (*nîvro*), kir ewrekî biharê lê peyda bû, taviyek baranê bi ser da hat. Ji ber baranê şil û şepîrze (*melbûk*) bû, cavê xwe li dinyayê gêra, ji dûr (*ve*) qesrek spî dîd (*dît*), evî rikêbê Rexşê Belek şidandin, çû ber vê qesrê, hindî fetkirî çarexî qesrê ne kulakek lê heye, ne pencerek lê heye, ne dergahek lê heye, çeko (*weku*) hêkekê ev qesra vê deynadî.

Ji wêrê fekirî li ber çiyayekî dîd şikeftek, rikêbê Rexşê Belek şidandin, kire xar, çû gehîste ber wê şikeftê.

Ew bi xwe, bi Rexşê xwe va, bi gurzê xwe va, bi suwarî çû di şikeftê va. Li şikeftê peya bû şill e (*sil e*) û şepîrze ye ji ber baranê. Ew peya bû, li dor şikeftê gerha, kiloxê dara ïnadin (*ïnandin*), destê xwe lêdan, agirek bo xwe helkir, cilkê xwe zoha kirîn, malhazirişek şîva xwe xwar, fincanê qawê (*qahwê*) vexwar, kalûnek (*qalûnek*) tütinê kêşa, serê xwe deyna, nivîst heta subehî hişyar ne bû. Subehî rabû, pê xwe kir rikêbê, li Rexşê Belek suwar bû, des (*dest*) avêt gurzê giran, hilîna deyna ser milê xwe.

Wekî ji qesrê (*şikeftê*) derket, serê wî hora bû (*rakirî bû*), serê wî li derê qesrê (*şikeftê*) ket, wekî fetkirît rêzek dudana wê li ser derê qesrê (*şikeftê*), rêzek dudana wê li bin derê qesrê (*şikeftê*), ecêbek serê Rostem girt.

Go: “Eve ne qesr e.

Dorvedora qesrê geriha, fetkirît eve cihê guha, eve cihê çava, eve cihê define (*dfnê*).” Meeceb mayî Rostem.

Go: “Eve kiloxay e, ez vê çûyîm tê da.” Rostem rabûy, hespê xwe da ber rikêbê, cilawê xwe bi terefê Îranê (*da*) berdan (*badan*), hespê xwe da ber rikêbe, kire xar, gehîste mal, peya bû. Mehterêd wî ji pêş ve derketin, cilwa wî girt, Rostem pey kir, gaza Rostem pîroz kir, çengek zêra ser serî wî (*ra*) hilavêtin, hespê wî bir, ser afirî girêda, tegarek kuncî(yên.) spî kir, dênan ser afirê hespê wî.

Rostem rabûy riya xwe girt, çû dîwana maqûla, pisyar ji xelkê mezin kir extiyar,

Go: "H'al û hewalê min filan e, şikeftê eve bû."

Go: "Şevê dî ev roke jê derketin (*derketim*), fetkirim rêzek dudana wê li serî wek wê li binî."

Go: "Aya Rostem me ne dîtiye, ne bi dorê me ye, bapîrkê te Qarîgaugo (*Kargango*) ew mezin e, herê pisyar jê bike. Hêdî Rostem vegera hate mal."

Got deyka xwe: "Dayê!."

Go: "Ha day gorî."

Go: "Bapîrkê min Qarîgaugo li kê derê ye?."

Go: "Eyho eyho, dêy gorî, evro hefd (*heft*) roja me bîra wî ne hat, me ji bîr kiriye, wê li pişt heft menzila, wê deynadî kolaçekê."

Rabû dergah vekir, çû pişt hefd (*heft*) menzila, fetkirî bapîrkê wî wê muhera (*bêhêz*) bû. Kerasék qerêj wê li ber, nûzenûzek jê têt. Rostem degî (*dengî*) li xulama kir. Me (*wan*) mencelek avê germ kir(*in*), cilkêd Qarîgaugo ji ber kirin, laşê wî taze û naze şuşt(*in*), qerêja hef (*heft*) salî ji laşê wî bir, serî wî qenc (*qeş*) teraşî, müjilankê çava qusandin, nînokêt wî ê destâ qusandin, nînokêt pêya jê qusandin, wê neqlê rabûyî destek cilkêt paqîş kirne ber wî.

Gotê: "Hey lawê qenc, te ev qenciya di gel min kir, bêna min hat."

Gotê: "Ya babo, ma tu me nas nakî?"

Go: "Tu Kî?"

Go: "Ez neviyê te Rostem im."

Gotê: "Ha kurê min."

Gotê: "Mergê (*ruhê*) min te, careka dî ez seg, me dîd (*dît*) navê Rostemî li mala min derket, vê neqlê bila mirina min heq bid (*bit*)."

Gotê: "Ya babo."

Go: "Ha kurê min."

Gotê: "Ez duhî çûme nêçîrê, baran ser min da hat, ez çûm min (*min*) dîd qesrek, çarexî qesrê gerham, mi ne dîd (*dît*) ne kulakek ne pencerek ne dergahek.."

Go: "Xudanê di wê qesrê di kê derê da [*Li kê derê da*] ne bû."

Gotê: "Kurê min, ew qesra dêwê balafiran e, ew bi sehera jor da, têr êd (*êt*) qesrê da."

Go: "Ez wê derê çûm, mi (*min*) dîd şikefta li ber çiyayî."

Go: "Ez bi Rexşê xwe ve, bi gurzayê xwe ve, ez mam di şikeftê ve, şevê dî mam tê ve. Bi Subehyê ez suwar bûm, serê min ser devê qesrê ket, fetkirîm rêzek dudana wê li seri, êg (*êk*) wê li binî, wez (*û ez*) zivirîm dor şikeftê, eve cihê guha, eve cihê çava, eve cihê definê, eve çitov kiloxe ye, ez çûme tê va?"

Got: "Eyho kurê min, new me û hinde bû (*ewqas bû*) ji ber aşûta berfê ber leye (*lehye, lêmişt e*), baranê vemejhî, sê cara hinde bû, bila ew kiloxeyê bapîrkê te yê Samê Nelim e, dêwê Mazinderanê serê wî bi şîrekî (*sûrekî*) firandiye."

Go: "Wey eve ci dibid (*dibit*) li dinyayê, pa me hêf li xelkê hene, xelkê çu hêf li me nînin."

Go: "Wee'daw bid bi nan û nemakê Hemzey, gora Samê Nelim e, pi (*bi*) serê Keyxisra paşa wee'daw bit. Jin û malê min heram bit, ax û avê ((n))îranê li min heram bit, ez rûnamim, biçim heyfa bapîrêkê xwe Samê Nelim a vekim."

Go: "Kurê min, h'edê te nîne (*ne wek te ye*), Mazindera nîne, ew fikrê te dê te bi awira çava tikuşin (*dikujin*)".

Got: "Kurê min, tu berê wa nîne, wekî tu bibî qalûnek titûnê, tu binê qalûna wan nagirî, wekî tu bibî fincanek jehrê, te vexun, serê wan pi (*bi*) te germa nabid (*nabit*), tu bibî firekek (*gumek*) avê, te vexun dîhna (*tîhna*) wan pi (*bi*) te naşkêt."

Got: "Ya babo, tu bo ci van rêya li me tikî (*dikî*)?" Gotê: "kurê min, ma qîmeta te çend e?"

Go: "Qiweta min wextê biçî pi(*bi*) ser ferê di mermerî mîvanka (*çoga*) xwe li ser vedim, li bin dest û pê min de ti(*di*)helin."

Go: "Pa kurê min, here nav rezê min, kehniyek wê li nîva rezî, des (*dest*) limêjê xwe bigire, ser wan ferşê di mermerî nimêja xwe bike [*Di vir de Rostem musilman tê xuyakirin, tevî ku ew berî Islamê jiya bû, eve jî diyar dike, ku çêrokbeh nezan e an jî ji dev nezanekî girtiyej*], heke çogê te têd biçin xwarê, tu fêrisî, dê vêca tê gerî (*tuyê karibî tiştekî biki*). Rostem rabû çû nav rezî, destlimêja xwe girt, ser wan ferşê di mermerî rawesta minimêjê (*nimêjê*), çogê xwe li ser ferşê di mermerî veda sergilol bî (*bû*), kete xwarê. Careke dî li ser rawesta li ser veda, sergilol bî (*bû*), kete xwarê. Cara siyê (*sêyê*) li ser rawesta, Şahname jê dibêjin

şiqûlêd qahîla (*ji qewlêd qaîla*) Rostem bayê fêrisiyê lêda, kirmê serê wî livî, evî sê reng girtin, zer bû, sor (*sohr*) bû, spî bî (*bû*) şibyeta kevya befrê lêhat.

Sê reh li enya wî hebû(*n*), hersê li ber êk û du stûr bûn, şibêtî sê gira bikevin sê nuhala. Rostem çogê di xwe deynan ser ferşê di mermerî, ev ferê di mermerî dibûm (*dibûn*) vehelhan. Rostem rabû vegerha hate nig bapîrkê xwe.

Got: "Ha kurê min."

Go: "Babo ci bo te bêjim?! Axir ferşê di mermerî bim (*bin*) pêd (*pêyêd*) min vehilhan."

Gotê: "Kurê min, ez her neşême te di herdî çî axir dêye kuştin (*ez her neşême te, tu her diçî têye kuştin?!*)."

Go: "De here."

Ew jig (*jî*) hate mal, god (*got*): "Dayê, hilo bo min kesm û kada bipêje, dê çim bi dinyaê ve dîv (*dûv*) da'weyek vê ketî pê çim vê nîvda'wayê diçim safikim (*safî bikim*).

Deyka wî rabû, hevranek (*arvanek*) avêt şikevê da. Ji temamî vî hevramî hind şekir, hind gezo, hindê givîn têkil kirin, bo wî kirin hevîr, kirin savîk, kirin kesm û kade, boy (*bo wî*) pextin, ew rabû wê şevê alîk (*bi*) xwe da Rexşê bimbarek.

Subehî rabû seharê, Rexşa Belekê kêşa derê, digel cil û çar mehtera (*xizmetkaran*) xurî, il (*li*) Rexşa Belek vepaliştin, mexese kir, gulweşîn kir, zînê merosa ser piştê rakuta, tang û baletangê wî şidandin, rikêbêt altozî pê ve kirin, şeşgazî çingale ber qelûza (*qelpûza*) zînî ra kirin. Qebûrê tîra ber qelpûza zînî ra kirin, ligavê zêrî da ser, gulîfkê qotek jê berdan, gihip (*gihmî*) û dukar tê deynan. Rostem rabûyî ji pê va başnû (*bejin û*) balayê xwe fekirî, hev (*ev*) zerî he (*ev*) kumzerî ser êk û du vegirtin, başnû beyan (*bavl û beyan = Manto û kum*) avêt serê xwe, qestek (*xestek*) tîra ber pişta xwe ra kirin, kemera xîretê avêt pişta xwe, bazbendê (*bezm û xemâil*) xêrê avêt milê xwe, hungusfîra feth'î kire tiliya xwe, îna keşerî bi stoyê xwe da kêşa, almasê Hindî avêt pişta xwe, metalê pilayî avêt paş pîlê xwe, çemkanan û zêr pê xwe va dakêşa, kotya serê dûkî, melhemê silêmanî avête delganê da, pê xwe bi rikêbê deynat, destê rastê avêt gurzê giran, hezar û êk xunkarî destê çepê avêt rumâ heşde gaz, dêna ser milê xwe, rikêbek ê (*li*) Rexşê Belek da, ji akarê

(erdê) Îranê derket, berê xwe da vegevê (xêrê), pişta xwe da mewtana. Çû serê meydanê, birayê Gurnîs, xwarzê wî Bêjan, herduka wê li serê meydanê bo xwe goyanê ti(di)kin, bezîn hefin pêşiyê [ev pevek naye fêhmkirin!!!]

Go: "Ya keko, dê kî ve çî?"

Go: "Kek-xulam, diçim dinyaê ve nîvda'wayek wê ketî pêşiya me, dê çîm safikim (safîkin)."

Evan gotê: "Keko xalo, em dê di gel te ên (bêñ)."

Gotê: "Kek-xulam, bira-xulam, ez diçime vî edrî (erdi) ê xelkê bi awira çava dikujin. Ez diçime wê derê, ê xelkê bi dudana ti(di)kujin."

Gurnîz gotê: »Ma ez ne birayê te me? Ma ez ne ji wî babê me ê tu jê bû? Tu mi (di)tirsînî?"

Bêjan gotê: "Xalo, ma ez ne xwarzê te me, tu mi (di)tirsînî? Biraw Allah eman Allah, em dê di gel te ên (bêñ). Naxwe jê ra pê va (ji vir û pê va) em dê digel te êyîn (têñ)."

Go: „De werin, dam (da em) biçîn.“ Gotê: "Hûn ê biçük in, we dinya ne dîtiye."

Go: "Ma em şte (ji te) çêtir in?."

Ew rabûn aujotin (ajotin) ber wî ketin. Bi rê da çûn heta nîvroj. Avek bi dez (bi dest) ne ket ew vexun, zadek bixun, cî nîne lê peya bibin. Ajotin heta êvarî, deh konaga (qonaxa) bêtir çûn, çûn dîtin rezekî li nîva rê da, avek xweş wê tê da, fêqiyê zehf wê di wî rezî da. Peya bûn li wî rezî, li ser wê kehniyê.

Rostem gotê: "Hûn berê avê vexun." Wan berê avê vexwar.

Birayê wî, xwarzayê wî go: "Xwe ji ber destê min bidim (bidin) paş."

Ewa xwe da kenarekê. Çengek avê vexwar, çenga duyê kehnî bire binî, çengê siyê kehnî xelas kir. Li wî rezî gerhan, çend fêqî jêkir, înad ser kehniyê, fêqî xwe xwar, şîva xwe xwar, qehwewayek vexwar, qalûnek tütinê kêşa, xewa fêresiyê dilê Rostemî girt.

Rostem gotê: "Xwarza, bira." Gotê: "Hûn dişen nobê li min bigirin?"

Go: "Herê, em şîyin (dikarin) nobê li te bigirin."

Go: "Ev reza bê xudî nine." Gotê: "Dinyaye ayhaye (Heyhaye). Tengaviyek li we biqewimit, barek vê li we derê." Go: "hûn şen herdu vê hilgirin?"

Gotê: "Xalo, binve, te dil pê nebid (bila di dilê te da nemîne)."

Gotê: "Heke dinya ye tengavî li we biqewimit hûn herdu vî barî hil(*ne*)girin li sîngê min bidin, ez dê hêşar bim. Heke ez hêşar ne bûm li textê enya mi (*min*) bidin, ez dê hêşar bim."

Ew nivîst, serê xwe deyna li ber rexekî rezî, pêt (*pêyêd*) wî derketin li binê rezî, ti(*di*) xew çû nivîst. Herduka rûniştin balgî serî, wekî fetkirin binê piya (*pêya*) nabînin, çûne binê piya serê wî nabînin, tegbîra xwe kir(*in*).

Herduka got: "Êk ji me li balgî serî rûnişt, êg (*êk*) ji me binê piya." Wextê Bêjan çû binê piya, Gurnîs rûnişt balgî serî, noba xwe girt heta subehî. Pa Rostem hêşar ne bû. Bêjan fikirî bi nava rezî tûhûrkek (*darek hûrik a tuyê*) dîd (*dît*) li wê derê, werîsek pê wer nayêt, bela kire, bi reh ve hilkêşa, bi destê xwe lêda, pêjinî kirê, darek çîvek (*covek*) bi destê xwe ve girt.

Nebêje, ew rezê sê kafiran e, hersê biran e, mala wan wêt li şikeftekê li çiyayî. Rojekê du bira çîne (*çûne*) nêçîrê, birayek têt nav rezî avê dibid (*dibit*), fêqî dibid, bo birayêd xwe şîvê hazır ti(*di*)kit heta birayêt wî êvarî ji nêçîrê têñ. Wê rojê herdu birayêd mezin çûne nêçîrê, birayê piçûk rewia (*reviya*) xwe li gergedanê (*kerka*) xwe kir, hat kesta (*esta*) rezî kir, dê êd (*êt*) nav rezî fêqî avê bibit, da haziriyê bo birayêt xwe bikit.

Wextê hat riya xwe girt, qesta rezî kir, fetkirît tofanek wê ji wê ve têt.

Gurnîs gote Bêjan, gotê: "Çiye xalo?".

Gotê: "Ef (*ev*) çitov kafir e ji wê ve têt?".

Gotê: "Ya xalo, tu berê xwe bidê, dê ci pi (*bi*) serê wî ïnim (*bînim*)!" Bêjan sertanê rezî bazda.

Gotê: "Ya kafir, heke te av divêt diçim bo te avê tînim, heke te fêqî divêt diçim fêqî bo te ïnim. Xalê min vê li nav rezî rûniştî da hêşar bid (*bit*)."

Gotê: "Ya kafir, ya Ereb, xwe ji riya min vede, tu (*du*) xal bo mi (*min*) li dinyaê hene, fêqiyê min bixwî, ava min vexwî, tu bêjî min newê nav rezî da?" Bêjan ne kirî ne merdî, xwe hilavêt ev e'kaze (*çûv*) li destê wî, li serê wî da, ho li xwe zivirî, li patekê quta, ho zivirî, nav milê wî quta. Kafir sews kir (*hiş ji serî bir*), avête xwarê.

Kafir gotê: "Aman li bextê te û li bextê xalê te, min ne kuje, destûr ya min bide de ez biçim ve."

Gotê: "Hilo kafir." Pê wî hilgirt, avêt ser gergedanî, suwar kir.

Gote kafir: "Birayê Ella, carek dî bêjî ez diçim nav rezî ez dê rehêt pişta te piçinim (*bışkinim*)."

Gotê: "We'daw bit, çend hûn li hîrê ne, êdî nayim nav rezî heta hûnê ne hêra ne."

Ew gotê: "Hindî xalê min nav rezî nivistî bit, hûnê bêñ, dê rehêt pişta we dê piçnim."

Kafir riya girt, gehîste mal. Ewî peya bû, nivîst, lê bû ta, mam (*ma*) bê şîv, mam (*ma*) bê agir, mam (*ma*) bê av. Herdu birayêt wî êvarî ji néçîrê hatin.

Gotê: „Bira, derdê te çiye?“

Gotê: „Gelî bira, ez çûme bi rê va, ez çûm nîva rê tayê ez girtim, serê min êşa, janê serê min girt.“

Gotê birayê navî (*orte*): „Çûyî bi rê va Erebekî ku reş vê pix kiriye, ji tirsa da lê bû ta.“

Gotê: „Kuro, te çawa ne, te sor in, te sipî ne, ci tebana te (*germbûna te*)? Ma te ne dîtiye heyho li te ne hatiye.“ [Niviskar bi xwe dibêje, ku ev pevek naye fêhmkirin]

Birayê wî (yê) navî god (*got*) birayê mezin, got: "Keko, tu sube here néçîrê, ez diçim nav rezî avê fêqî bo te înim, şîvê çêkim."

Wê şevê çende néçîre kîrî, evan şîva xwe xwar, nivistin. Subehê rabûn, birayê mezin çû néçîrê, birayê navî li gergedanê xwe suwar bû, revya xwe înat, hat qesta rezî kir.

Gurnîs gote Bêjan, go: „Kafirê te dîsa hat rezî.“

Gotê: „Xalo, eve ne ew kafir e, êkî dî ye.“

Kafir hate quesda rezî kir. Bêjan ji rezî derket, hat pêsiyê.

Gotê: "Kafir, vê neqlê tu piçi (*bo ci*) hatî? Ma min ew tayê înadî te ji te çû?"

Gotê: "Wey gidi Ereb, ef (*ev*) ta te înadî birayê min?"

Gotê: "Herê kafir, min ta ïna birayê te, ta mirîne deynim lêvê te, veger paş da here, Erebo pêşilko, xwe ji riya min vede dê te kime birnût, kime difna xwe."

Gote kafir: "Biray-Ella, aman Ella, tu ji vêrê pê ve bêy, dê rehêt pişta te kitînim."

Bêjan çû ji pêş ve, gote kafir: "Dê vegerhe."

Kafir gotê: "Wey gidî, ez seg bim ser dinyayê, tu li rezê min deynî (*dakevî*), fêqiyê min bixwî, ava min vexwî, rehêt pişta te kitînim."

Carekê Bêjan gehîstê, ewî xwe hilavêt, ewî ef (*ev*) dare li nav çavê kafirî quta. Kafir zivirî, li parsûya quta, kafir zivirî, li petyê quta, kafir di gergedanê da avête xwarê, xencerâ xwe kêşa, bezî ser kafirî dê kafirî serjêket.

Gotê: "Kafir, min tu kirî sedeqa serê xalê xwe, belê de here carekê dî berê xwe nedî rezî, hindî xalê min nivistîye nav rezî heta em biçin, paşê rezî ve, serê we bixwît."

Kafir suwar kir, pêşûpaş bî (*bû*) [*berê wî bi paş ve*], çû lig (*li nig*) birayê xwe. Darek hilgirt, hate birayê xwe.

Gotê: "Xwes h'alo, derew te kirî." Da ber darê.

Gotê: „ Te ne gote min fêrîsek vî di rê da ta ïnadiye min?!"

Gotê: "Keko, aman û dexîl, xwe bigire, tu ji min vebe, da birayê me ê dî jig (*jî*) da vê şerbetê vexut. (*da li wî jî bidin*).

Ew nivistin, herduka bî (*bû*) nalmala wan. Birayê wan ji nêçîrê hat.

Gotê: "Ya bira, vê neqlê te çiye, çi li te hatiye? »

Go : « Ya keko, ez çûme bi rê va da çime (*bîçime*) nav rezî, ew tayê hatî birayê min, ew taye hate min. »

Gotê : « Peya bira. « Go : « Pa wekî ta hatiye te, ta hatiye birayê te, pa vê neqlê pa em dirabîn, kî dê avê dêt (*bidêt*) we, kî dê fêqî dêt (*bidêt*) we, mirovê taw (*tayê girtî*) bit divêt avê vexut, divêt fêqî bixut. » Got : « Subehî em dê rabîn têgda diçîn li nav rezî, hûnê rûnin nav rezî, ez diçime nêçîrê, hûn wê derê nav rezî rûnin, fêqî bixun, avê vexun, axir heta çend rojî heta tayê ji we biçît. »

Gotê : « Qenc e ».

Wekî rabûn subehî suwar bûn hersêka, birayê mezin suwar bû li ber wan ket. Ew bi gar (*tenê*) çû, birayê dî herduka hêdî hêdî têن, birayê mezin kire gar bi rikêbê da, quesda rezî kir. Gavekê fekirîn, Gurnîs, Bêjan suwar rê da hate li xarê. Suwarek berê hat, herdukyê dî li dù wî hatîn.

Wextê dîd (*dît*) Gurnîs gote Bêjan, go:« Ya Bêjan, pa suwarê te vêt hatin, quesda rezî kir(*in*). »

Gotê : »Gurnîs. » Go : « Evê ha li pêşiyê têt, ew ta ne hatiyê, ewê ta herdu ê li dumahîkê.

Ew herdu ne ê min ta ïnadiye. »

Hatin berê xwe da(n) rezî. Bêjan derked (*derket*) ji rezî, çû pêşıya kafirî.

Gotê: "Hey gidî kafir, vê neqlê tu piçi (*bo çi*) hatî?."

Gotê: „Wey gidî, pêşilko, ev ta de (*te*) ïnad birayêt min?.“

Gotê: "Hey posê (*písê*) gidî, ya kafir, min ta ïnadiye birayê te, dê ta mirinê ïnim lêvê te. Xalê min Rostem vê li nav rezî tu dê hişyar kî."

Go: "Hey mergê (*canê*) te û xalê te ber min bikevit." Gote kafir.

Evî Bêjan xwe hilavêt ev dara li nav çavê kafirî da. Karêt (*milêd*) wî bîn (*bûn*) wekî çûva. Dar firî ji destê wî. Kafir li xwe ne ket şikê, bezî çû darik dî hilkand (*hilkişand*), ew jig (*jî*) li nav çavê kafirî da, ew jig (*jî*) pê va hûr bû. Kafir rehêt enya xwe nakirîn (*Nûkirin*), kûrîşk gazî Gurnîs kir, Gurnîs hat harê wî, herduka kafirî dane ber sîngê hespê xwe. Bêgem kirîn, li wê rezî geran, herdu bezîn, xwe avêtine ser sîngê Rostem. Rostem hişyar bû.

Gotê: "Wehweh (*waxwax*), ev çiye?

Gotê: „Ev kafir, zora me hemberî ne bû.”

Rostem rabû rûnişt, carekê destê xwe avêt zilayek li serê kafirî da, zirênî jê hat, dengê sufre-toqatê jê hat, serê wî çû du sae'ta dûrî rezî. Kafir kete ti (*di*) rezî da, rê zep kir, (*én di*) dîtin revîn.

Rostem rabû, şîrê (*sûrê*) xwe kêşa, bi dû wan kafira ket, gehîştê bi rê va, êk serê wî birrî, ê dî jig (*jî*) berda dûv, gehîştê li ber derê şikeftê. Kafir xwe avête e'drê (*erdê*), aman û dexîl ji Rostemî xwast. Rostemî rabû nalçayek (*nalek*) ji sola hespê wî kêşa, tiliya xwe li gohê wî da, gohê wî sumt kir (*sunt kir = kun kir*). Ev nala bada, kire gohê kafirî, yexsîr (*destegîr*) kir, ïnade rezî.

Gotê: "Ya kafir, mi divêd (*divêt*) ber mi bikevi, biçîn bajêrê Mazinderanê nîşa min bidî.

Go: "Dê ez xwe binyê (*pêkevê*) te me, ez Mazinderanî me."

Rostem suwar bû, ew û Bêjan, Gurnîs, kafir, bi rê ket berê (*ber*) ve çiyayî kir, dîd bajêrê Mazinderanê, got: "Eve ye bajêrê Mazinderanê."

Pa fetkirit bajêrê Mazinderanê gellek mezîn e.

Bêjan gotê: "Xalo, tu dê çawe vî bajêrî distînî?."

Go: "Ez nizanim."

Bêjan got: "Ez tegbirê il (*li*) te bikim."

Go: "De bêje Bêjan."

Bêjan gotê: "Xalo." Go: "Çekêt xwe, cilêt xwe û Rexşê xwe bihêle li

hêra, tu here bajêrî bicesisîne, birêne (*binêre*) çawa distînî.”

Gotê: “Bêjan dê bi xeberê te kim.”

Rostem rabû, çek û cilê xwe hemiye êexistin, hêlan li wê derê. Gurnîs, Bêjan, xulam, Rexşê Belek, hemî hêlan li wê derê, riya xwe girt, qalûna xwe têkir, agir dêna ser, qalûna xwe kêşa, quesda bajêrî kir, çû bajêrî, gehîste bajêrî, jina dîd (*dît*), biçûka dîd, mezina dîd, li ber çavê wan bî (*bû*) jûje (jûjî).

Go: “Hey gidî jûje.” Yarî pê kirin, da(*n*) ber berra (*berrika*), piçûka bi dûv ketin, mezina bi dûv ketin, da(*n*) ber berra, da(*n*) ber tepe sera.

“Wey gidî jûje tu lçî (*li çî*) tigerî (*digerî*)?”

Go: “Ez li mala dêwê Mazinderanê digerhim.”

Yekî gotê: “Kulmal, ha ha ha ew qesraa dêwê Mazinderanê ye.”

Gavek avêt êre, gavek avêt pişt pirê, axir leze li xwe kir, çû gehîste qesrê, çû nav dergahê qesrê, xulam gotê: “Jûje, dê kî ve çî (*biçî*)?.”

Go: “Ez diçim salel (*sale bi erebi*) li dîwanê.”

Xulama gotê: “Vegere.”

Go: “De herê xweşh’al û derê Odeyê vekirî.”

Çingilê xulama girt her êkî palek pê rana, riya xwe vekir, çû ber derê dîwanê.

Gotê: “Selam elêk.”

Ho fetkirin eve jûjeyek. Gotê: “Ne elêk, ne selam, ne reh’met û lena (*bo me*) bereket, eve çitov jûje ye ho mîr ser. »

Dêwê Mazinderanê gotê : « Jûje, tu ji kî ve têyî ? . »

Gotê : « Ez jûjeyê Îranê me. »

Got : « Tu jûjeyê Îraneyî ? . »

Got : “Belê.”

Go: “Tu li çî tigerhî (*digerhî*)?.”

Go: “Ez benî, ez hatime nik te xulamiya te bikim.”

Gotê: „Jûje, tu dê çi xulamiya mi kî (*bikî*), tu pi (*bi*) kêr çi têyî?.”

Gotê: „Ez benî, min quesda Xwedê (*û*) ya te ve kirî. „

Gotê: „Jûje, tu pi (*bi*) kêr nayî; qalûn û bazkê min helgirî, tu pi (*bi*) kêr nayî; avê bidî des (*dest*) min.“

Gotê: „Ez benî, qetîî (*helbed*) xilmatekê bo te bikim, da nanekê nik te bixum.“

Go: „Hay gidî jûje, heft kafir li vî tayî (*li vî terefî*) vê li dîwana vî

rûniştin, kerbêt vî vebûn, dege (*denge*) li kafirekî kir, go: „De rabe kafir, çingilê vî jûjeyî bigre, li taqê bide, bipeqîne, da çu terez dî nebêjin dê çîne xulamiya dêwê Mazinderanê kin (*bikin*).“

Kafir rabû, dez (*dest*) avêt çingilê jûjeyî, hir ve dileqînit wê ve dileqînit neşêd vî jûjeyî ji e'drê (*erdê*) bilivînit. Dêwê Mazinderanê gotê: “Kafir, te xwe li çi girtiye?.“

Go: „ Ez benî eve sindan e, çovê di e'drê ra.“

Jûje rabî (*rabû*) gazî kir, go: ”Destûr ya min bidit, dêwê Mazinderanê, ez çingilê vî kafirî bigrim li taqê bidim, pê ve biperçiqînim.“

Gotê: “ Jûje, min destûrya ta dayîye. »

Jûje des (*dest*) avêt cingilê kafirî, çingilê kafirî helgirt, bada li taqê qesrê da, pê va perçiqand. Dengê xwe lêke (*li êke*) dî kir, kafireg(*k*) dî rabû, ew jik (*jî*) dez (*dest*) avêt jûjeyî, kir ne kir jûje nelivand.

Jûje gotê: »Tu destûrya mi lê bidî, eve bikim hevalê ê dî. »

Axir go jûje: »Destê te bo te.“

Jûje rabû, çingilê wî girt. Ew jik (*jî*) avêt li taqê de ew jik (*jî*) peqand. Axir rabûne her heft kafir, her heft kafir kuştin li dîwanê de, zehmê dêwê Mazinderanê girt.

Gotê: “Jûje were destê min, me tu kîrî xulamê xwe. »

Jûje bezî destî. Paj (*paş*) ve hat li ber temena (*supasî*) kir, wextê rabû, çî sufra nanî bo (*wî*) ïnat, jûje gehîştê, zilayek li serê wî da firrand, her çî dêniya girarê bo ïnat jûje serê wî firrand, ê çavîşê wî gehîştê serê wî firrand, ê qehweçî qehwe ïnat jûje gehîştê serê wî firrand.

Xizmetkarêt wî jûjeyî birhandin (*birrîn*), hemî kuştin, jûje ma pi (*bi*) tinê ber xizmeta wî. Xizmetê wî hemî pêkfinît ji hemî şola, şîvê ïnat şîva xwe xwar, qehwe gera (*gerand*), qehwe vexwar, qalûna tutunê kêşa.

Dîwan verevî (*belav bû*), dê (*dêwê*) Mazinderanê çû salil ket, çû serayê nig jina xwe nivist.

Wê şevê pi (*bi*) xewna xwe dîd (*dît*) Rostem hat bajêrê wî xerab kir ewî kuştî. Subehî rabûyî rûnişd (*rûnişt*) di dîwanê, qeherî, kerbe bû.

Xelkê dîwanê gotê : »Ya paşa tu bo çî ev roke ho kerbe bûyî ?. »

Gotê: « Şevê dî mi pi(*bi*) xewna xwe dîd (*dît*) Rostem had (*hat*) bajêrê min xerab kir, ez wê kuştî. »

Gotê: »Pa me navê Rostem ne bihîstiye. »

Go: »Pisyar jûjeyî bike. »

Gazî jûje kir. Gotê : »Ya jûje. »

Gotê : « Ez benî. »

Gotê : « Rostem Îranê heye ?. »

Go: »Belê ez benî. Rostem wê li Îranê hey.»

Go: « Rostem çend e?.

“Gotê:”Rostem ew jik (*ji*) ji tematê min e.“

„Wekî Rostem bête bajêrê me tu tişeyî (*dişeyî*) nobê lê bigrî?..“

Go:“Belê ez benî.” Go: “Wekî bête bajêrê te çi hedê wî, babê wî ye, ez çingilê wî bigrim pi (*bi*) saxî bo te bînim.“

Go:“Emferî (*eferîn*) jûje.“ Gotê:“Jûje ev şeve biçî nobê li bajêrî bigrî.“

Go: „Ji kî tereff?.“

Go: “Ji terefa rojavayê.“

Go:”Belê ez benî.”

Wî şevşîva xwe xwar, jûje rabû, nanek helgirt, lepê xwe li girarê da, dêna ser wî nanî, ew nane têg werkir.

Gotê:”Jûje, eve bo çiye?”

Gotê:” Ez benî wextê biçim nobê nîva şevê luqmayek hose (*ho bo paşevî*) bixum, da xewa min divê rabît.”

Jûje rabî (*rabû*) ev nane kir danga (*dehmaña*) e’baya xwe, nivîna xwe bir, çû dergahê rojavahê deynat (*deynand*).

Ew rabû çû lig (*li nig*) piçûka, ev nane û ev girare dêname (*dêname*) ber wan, riya xwe girt, cilê xwe kirîn ber xwe, li hespê xwe suwar bû, gurzayê xwe ïnat, çû li ba dergahê roelatê (*rojhelatê*), gurzayê deynat, hefd (*heft*) mexal li ser êk xerab kirin, riya xwe girt, çû lik (*li nig*) piçûka, çek û cilê xwe êxistin, hate mal.

Dîtra şevê hefd mexalê dî xerab kirin, çarexê bajêr gerha, her şev hefd mexal xerab kirin, bajêr kambax kir.

Bî (*bû*) hawar. Xelkê Rexşê Rostem dîd (*dît*), li bajêrî bû hawar.

Go:”Rostem vê li ber çiyayı şikeftek tîra. Şevê tê pê bajêrî xerab kit, bi rojê vê li wêrê.”Çûne hawarê.

Heçî Gurnîs bû Rexşê Rostem suwar bû, Bêjan darek bi destê xwe girt. Dêwê Mazinderanê go: "Jûje hespê min çêke." Hespê wî çêkir, suwar bû, gurzeya xwe bir çû hawarê.

Jûje derket li dû wî diçît.

Keça dêwê Mazinderanê gazî kire Rostem, gote: 'Çiye?.'

Go: "Were nik min."

Riya xwe girt çû nik keçikê. Gote Rostem: "Tu biçi (*bo ci*) hatî?.."

Go: "Eve çend roje kes nizanî ez Rostem im."

Go: "Tu piçi (*bo ci*) hatî??"

Go: "Ez hatim babê te bikujim."

Go: „Babê min dê te bi vî şîrî (*şûri*) kujim (*kuji*)."

Go: „Xulî bi serê te, stoyê babê min ew begûranê mufriqî (*menderûnê pirinc*), heke şîrê (*şûrê*) te birrî, tu dê babê min kuji, naxwe babê min dê te kuji.“

Ewî şîrê xwe helgirt, li wî begûranê mufriqî da, şîrê wî bî (*bû*) du ker.

Ew gotê: „Ya Rostem.“

Go: "Ez şîrê (*şûrê*) babê xwe bidim te, tu babê min pê bikujî, tu dê min bi xwe (*re*) bî (*bibî*)?."

Go: „Herê.“

Go: „De were biçemhe (*xwe xûz bike*) ez bêm ser pişta te, şîrî (*şûri*) vê hilavistî (*mue'leq e*), bo te bînim xwarê. Rostem cemha, kecûg (*keçik*) rabû piya, xwe deyna li ser pişta Rostem, hefd paresû ji paresûyêd Rostem ewî (*wê*) şikandin, hestî ve sax lê pelixandin.

Go: "Ya Rostem pa wekî piyayekî min çû(*m*) ser pişta te, min tu kuştî, pa tu dê çawa babê min kuji?."

Belê de rabe tu were ser pişta min, şîrî (*şûri*) bîne xwarê."

Keçik cemha, Rostem pê xwe deyna li ser pişte.

Herdu qewetê xwe li ser berdan, keçik rakir, Rostem şîr (*şûr*) ïna xwarê. Ev şîre (*şûre*) deynat begûranê mufreqî, kire du qat. Rostem şîr (*şûr*) kire bin kefşê (*ebayê*) xwe, riya xwe girt, çû hawarê birayê wî Gurnîs, xwarza ê wî Bêjan, kelex (laşe) wê êxistin erdê, xwîn bi cobara çit.

Destê xwe li Gurnîs hejnad, Gurnîs hat, çek û cilê xwe êxistin, Rostem wergirtin. Rostem rabû, li Rexşâ (*Rexşê*) Belek vepeleşî, mexes û gulweşîn kir, tang û baletang lê şidandin, rikêbê deltozî pê va kirin,

ligavê zêrî da ser, gulîf û kutag (*kutan*) jê berdan, gehîp û dukep tê deynan, qebûrê tîra ber piştê ra kirin (*kir*).

Ew rabû ji pê ve, bejn û balayê xwe ma fikirî, hef (*heft*) zerî hef (*heft*) kumzerî li ser êk û du wergirtin, îna qeşerî bi stoyê xwe da kêşa, gustîra feth'î kire tiliya xwe, pê xwe kire rikêbê, Rexşê Belek ajot, çû ber kepê dêwê Mazinderanê rawesta.

Gotê: "Hey gidî jûje, eve tuyî Rostem?."

Gotê:" Tu kûrê jar du (*ji herdu*) çava, ma tu nizanî ez Rostem im ?. »

Ewî gotê : « Gidî Rostem, karê xwe bike, da li dûr û heta bigejim (*te*) » [*Niviskar di vir da bi xwe dibêje, ku ev hevok naye fêhmkirin.*].

Ewî gotê: " Ya kafir bi ray (*rûy*) Allah, aman Allah, bi nan û nimakê Hemzey, pi (*bi*) serê Keyxisra paşa, bi gora Samê Nelima, ez hatim h'êfa Samê Nelima şte (*ji te*) vekim."

Gotê: " Gidî jûje, derbê xwe deyne."

Gotê: " Ya kafir, heçî rêza me malê sahib, qeraniyê rêza me nîne, em berê derbê xwe deynin, tu berê derbê xwe deyne. Heke tu min bikujî da ez bê imam (*iman*) bim, heke tu min bikujî da ez wecekî (*rûyekî*) bo Zalê pîr Keyxisra paşa ser textê Îranê bigrim."

Kafir rabû ser rikêbe, gurzayê meresank (*giran*) hilîna ber perêt esmana, zûrezûr (*awîs*) jê hat, şibêtê kûçkê sa rewîn (*rewî*). Talpêt (*terpêd*) qerêjê jê rabûn, toz û e'cacê girtî serêt kêriya, baranek emranî lê barî.

Ader hate hejanê, behir hate liqyanê, hûta lehenga serê(*d*) xwe ji behra deranî, kevra berê pist (*berêd pût*) xwe werandin, milyaketa ji ezmana lingê xwe ji ber hilkêşa, ewî ev gurze deynade.

Rostemî mitalê pilayî ser stoyê xwe dekelînat dêname ser serê xwe, gurzayê kafirî ji ezmana hate xwarê, (*li paş*) piştê Rostemî bi erdê ket, hef (*heft*) kumzerî kirne xelek stoyê Rostem ïnan xwarê, bayê Nîsanê lêda, dunya zelal bû, ev toz û e'cac betal bû(*n*). Rostem rabû, rikêbekê Rexşê Belek da, ewî nef (*zêt*) di xwe da, go: "Ey ez Rostem im. Rostem kurê Zalê ye, Zal kurê Qarê ye, Qar kurê Samê ye, Sam kurê Pîrî ye, Pîr kurê Nelima, Nelima kurê Gawiyyaxî, Gawiyyayî kurê Qeyteran, Qeyteran kurê Qamêran, Qamêran ji nevî Adem.

Go: " Hey dost, hey dost, bi bevr (*bevl*) û beyan, bi hukmê şahê Îran, gemertîlo ejgesto (*kembertîlo eşkesto*) ber miyan.

[*Niviskar bi xwe dinivîse, ku ev pevek naye fêhmkirin.*], bi hukmê şahê

Mazinderan, ewî pê xwe bi rikêbê şidand, hat ber kepê dêwê
Mazinderanê, li bayê bezî, ev şire (*şûre*) avêt, li şîlka serê wî da, heta
bejinî kire du qat.

Kafir gotê: " Ya Rostem bo çi derbê xwe deynanî?."

Go: " Ya kafir derbê me derbek e, zerbê me zerbek e, dê meydanek
bide hespê xwe."

Wekî kafir dicemha kare kete wê rexê, êk kete vê rexê.

Go: " Subhan ji Rebbê a'lemê."

Go: " Kiloxayê bapîrkê min Samê Nelima şikeftek bû, eve bû du
şikeft, êk bo dewara, êk bo mirova, da karwan û bazirgan têda biêwirin
(*bihêwirin*)."

Ewî ji wêrê kire xar, qîrek li eskerê wî kir, da ber gurza, kunfeyekûn
kirin, xelas kirin, birhandin.

Gazî kir: „Aman dexîl Rostem. Mêr (*nêr*) xelas bûn, mane jin.“
Rostem serê xwe betal kir, gazî kir Bêjan, Gurnîs.

Gurnîs hat, Bêjan hinda bû.

Gote Gurnîs: " Ka Bêjan?."

Go: " Heta nuha li hêre bû. Ew rabû keleg (*Kelex*) vedan.

Gazî kir: " Bêjan, Bêjan."

Bêjan ciwaba wî da, go: " a... ",

Çingilê wî girt ji bin kelexa ïna derê.

Go: " Ya xalo, te ez nuha ne ïna (*înama*) derê, ez dimirim bee'cim,
ruhê di min nedima."

Bêjan bir ser avê şuşt. Riya xwe girt, çû bajêrî, mala dêwê Mazinderanê,
batmiş kir, bar kir.

Keça dêwê Mazinderanê bo xwe ïnad, gohêd dêwê Mazinderanê jêkirin,
riya xwe girt, suwar bû, vegeha hat, hate şikeftê, xûşka kafira bo Bêjanî
ïnat, keça dêwê Mazinderanê bo xwe ïnat. Pê da bî (*da bû*) rikêbê ba
(*va*), hate mal. Şivanek dîd (*dît*).

Go: " Here mizgînî bibe bo Zalê pîr, Kêxişra paşa; Rostemî hat, dêwê
Mazinderanê kuşt, kiça dêwê Mazinderanê bo xwe ïnat."

Mizgînî bire bajêrî, bajêrê Îranê suwar bûn, fêris û palewan hatin, ji pêşê
Rostemî va hatin, kire cedîd (*tirad*), kire şehyane, riya xwe girtin, çûne
mal. Rostem peya kir, zêr ser serê wî ve hilavêtin, dawed (*dewat*)
şehyane bo Rostemî kir, jina wî mar kir bi dawat û şehyane, kire

şeqlobeqlo, da nav aqilo qoz qelfendî, şorbe bi tiloxê, behare li Bosilê (*Mûsilê*), kerkête hatiye il (*li*) ber kujulkê asê kirin, hîkaye çû bi deştê, da (*dayka*) wî û bab çûn bihiştê.

Heçî nebihist bijîd (*bijît*), hat û ji wê ve, rehmet li dêy û babêd gohdara, êd me jig (*ji*) vê ra.



Têbînî

Ev gotar, weke ku ji me re hatiye, me derbasî kovarê kiriye; bê ku em des bidin rênivîs û rêzimana wê; da ku ew weke jêderek ji vekolînêñ zimanê me re bimîne..

Komîta PÊNÜSE

Têbîniyêن li ser Kurdan û Sûriyê

Dr. Zorab Aloian

Hebûna mirovê kurd ji vê baweriyê tê, ku niştimana wî ber bi azadiyê ve diçe.

Lewma mafê her kurdekî, çi li welêt, çi li xeribiyê, heye ku ew nêzîkî rewşa Başûr-rojavayê Kurdistanê, mîna her beşekî din, bibe.

Lê belê Kurd li Sûriyê xwedî dîrokeke dûr û dirêj in, û ev dîroka han ne tenê bi Başûr rojavayê ve girêdayî ye.

Lewma ez dixwazim bi cureyekî kurt nêrînên xwe li dor Kurdan di pêvajoya guhartinê Sûriyê de bi rêz bikim. Nêrînên Kurdperweran ne belge ne, ne jî peyvên pêxemberan in: ew li ser koka eş û hêviyê şîn dibin.

Hebûna Sûriyê

Herêma bi navê Sûriyê ji serdema Imperatoriya Romayê de ketiye ferhenga siyasî. Komara Erebî ya Sûriyê a îroyîn dewleteke xwezayî nîne, çûnke ew ne ji dab û nerîta dîrokî tê, ne jî ji ya neteweyî (berwelatê Ereban nagihije sînorêن Sûriyê).

Ev dewleta destçêkirî ji çarçoveya bingehê xwe derketiye: Navendêن Xaçparêzan yên Dema Navîn – mîna Laziqiya, Heleb û Dîmeşq – ne di destêن Xaçparêzan de ne.

Zimanê aramî û kurdî, yên ku bi hezar salan li ser xaka Sûriya îroyîn li kêleka hevdû dijiyan, zimanê fermî nînin.

Li derveyî sînorêن kevnare yên Sûriyê herêmên giranbuha mane: Dewletêن Urdun, Lubnan û Israyîl, nîvdewleta Filestîn û deverêن Iskenderûn û Mûsilê.

Herweha herêma Dêr el-Zor a bêbext, di warê zaravî û erdnîgarî de, bêhtir bi ser Iraqê ve ye.

Ev Sûriya, ya ku em dibînin, tenê bi xêra îdeologiya Beesiyan dikare weke dewlet bimîne.

Gelo eger Beesîzm û birêvebirên wan li Sûriyê ji aliyê leşkerî ve jî têk biçin, wê çi pê bê? Sînorêن kelevajî, serkeftina zimanekî biyanî (erebî), lawaziya bingehê neteweyî, desthilatdariya hindikahiyeke dînî û guhartina mayeya kêseya kurd – ev xalêñ binavkirî hebûna Sûriyê dêxin bin pirs û gumanan.

Belkî dewleta Sûriyê ji neqşeya Rojhilata Navîn nayê rakirin.

Lê dîsan jî ne rewa ye ku şêweyeke nû ji bo Sûriyê neyê xwestin.

Çawa *Henry Kissenger* bi eşkereyî digot: “Av û nift tiştên wisa girîng in, ku nabe ew li bin kontrola Ereban bimînin.”

Federalîzim wek paşeroja Sûriyê

Herçend bêtirî nîvê gelê Sûriyê Erebêñ Sunî bin jî, navçeyên civakêñ din riya federaliyê rewa dikin.

Di vê pêvajoyê de rola Kurdan gelek mezin e.

Berpîrsiyariya hêzên siyâsî û rewşenbîrî yên Kurdan ew e ku ew basa sê herêmên Başûr-rojavayî bikin û vê babetê têxîn rojevê.

Hêdî-hêdî, gav bi gav, divêt ev herêm weke yekîneyêñ federasiyonâ Sûriyê werin dîtin.

Ev hersê yekîne divêt autonom bin, bi du zimanêñ fermî birêve biçin (ji bo şikestina tirsa Erebêñ wir) û pêwendiyêñ xurt di navbera xwe de ava bikin. Bi vî awayî, piştî demeke pêwîst, ev hersê herêm dikarin xwe bikin yek. Bi gotineke din, ev formeya federasiyonê, ya ku Paul Bremer ji Kurdêñ Başûr re pêşniyaz kiri bû û ya ku hati bû redkirin, ji bona Kurdêñ Sûriyê wê gelek baş be.

Bêguman, federalîzim wê yekîneyeke elewî jî bixwaze.

Belê, ne gengaz e ku ev civaka han bi dirêjxayanî li serê jorê bimîne.

Helbet, komên Elewiyan serwaxt bûne, ku ji ber sedemên demografi, bihêzbûna İslama sunî û avabûna rewşa nû ya navneteweyî, rojekê wê hukûmet ji destê wan bê standin. Li Sûriyê ev yek ne tiştekî veşartî ye, ku serkêşen Erebêñ elewî amadekariyêñ xwe ji bo damezrandina herêmeke taybet dikin.

Ne dûr e ku li Başûrê Sûriyê herêmeke Dirûziyan jî derkeve holê. Herçende di dînê Dirûziyan de armanca pêkanîna dewleteke serbixwe tune be jî, hizreke wisa li ba hin navgînên siyasî têne gengeşekirin. Yekîneyeke dirûzî dikare bibe magnêt ji bo hewbawermendê wan li Lubnan û Israyîlê.

Dîmeşq bi xwe jî divêt rista dîrokî û çandî bilîze û wek paytexta Sûriyê statûseke zelal – heya statûsa yekîneyeke federal – ji xwe re wergire. Hejmara yekîneyan, sînorêن wan, firehiya mafêن wan ên qanûnî hê ne xuya ne. Lê civaka Kurdan divêt bibe motora gotûbêjên federalîzmê.

Ev konsepta han projeyeke neokonservatifan tîne bîra mirovan: Çareseriya herî baş ji bo dewletêن wisa “pirrengiya demokratik a hundirîn” e (democratic pluralism within states).

Li aliyekî cîhana nûjen regîyonâlîzmê gotûbêj dike, li aliyê din jî li navçeya Rojhilata Navîn pergala federaliyê cihê xwe digire (Iraq û Imaratêن Yekbûyî).

Berjewendiya zimên û têgîna Kurdistanê

Xuya ye ku yek ji sedemên sistbûna tevgera kurd ew bû, ku di platforma wê de navê Kurdistana Sûriyê winda bû. Encama vê kompromîsê bi şewat bû. Niha dem hatiye, ku bi nermayî navê Kurdistanê vegere rojeva Sûriyê. Daxwaza azadiya edebiyat û çanda kurdî û statûseke fermî ji bo zimanê kurdî (yan li tevaya Sûriyê, yan jî bi kêmanî di yekîneyêن Kurdan de) pirseke biryardar e.

Li wan parçeyên Kurdistanê, li kû derê ziman ketiye navenda jiyanê, derfetêن siyasî jî firehtir in.

Tevliheviya rewşa Bakur heta qonaxeke mezin ji wê yekê tê, ku Kurdan ziman û çanda tirkî weke taca şaristanîyê pejirandine.

Bi rastî, serbestiya zimanê kurdî dermanê Kurdewariyê ye.

Xwezî, partiyêن Kurdan li Sûriyê zorbeya xebata siyasî û nivîskî bi kurdî bikirana!

Yekîtiya hêzêن Kurdan

Mirovê kurd hez dike, geşbîn be, ku ev yekîti ava dibe. Hêzêن ku nekevine xebata hevbeş, wê bi pêşveçûnên objektîv ji holê rabin.

Hêvî heye ku partiyêن me li Başûr-rojava ji serboriya du beşen

Kurdistanê rawêjê hildin û mifayê wergirin:

1. Yekîtî heye, ku ji parçebûnê jî xerabtir e;
2. Dutîretî heye, ku gelê kurd di çavêن xêrxwazan de jî dike sosret.

Dîn û siyaset

Piştî ku Lîbiyayê jî dev ji Înternasiyonâlîzma İslamê berda, ci pêdivî ji bo parastina îslama siyasî ji hêla Kurdan ve ne maye.

Îslam dînê piraniya Kurdan e û cihê wê di mizgeftan de ye.

Xweşiya İslamê ji bo mirovêن bawermend cejin, çîvanok, yasayêن civakî û pêdviyêن ruhî ne.

Lê dîrok diselimîne: Bi çendî İslama siyasî bi ser dikeve, hewqas nasiyonalîzma Kurdan lawaztir dibe – û berevajî.

Rista Kurdan di pêvajoya guhartinê de

Bihêzkirina dostaniya gelan, da ku raya giştî ya Ereban dijminatiya doza Kurdan neke (yan bi kêmanî asta vê dijminatiyê nizimtir bibe) û mafêن Kurdan wek komployeke berhingaran temaşe neke;

- a) Çêkirina yekîtiyeke hêja di navbera hêzên siyasî yên Kurdan de;
- b) Xistina statûsa zimanê kurdi nav rojeva siyasî;
- c) Destpêkirina gengeşeyan li ser federalîzmê (pêşî li derveyî welêt);
- d) Pêwendiyêن bê tirs û xof bi dewletêن Anglo-Saxon re. Rexneya propaganda Ereban di vê xalê de bi hêsanî dikare bê şermezar kirin: Ereban bi xwe bi Îngîlan re kar dikir, heta ew ji Osmaniyan rizgar bûn.



Hunera helbestê



Heyder Omer

Di van çend salên dawî de, gelek nivîsarên, ku bi helbestê têne navandin, derketine holê, û gelek xortênu nugîhayî berxwe didin, ku para xwe bixin vê meydanê.

Bi ser de jî pir guftugoyêna pirsa helbestê dubare dikin, hatine, û tênu xwendin û guhdarkirin.

Lê mixabin pirêna wan nivîsaran, wek xuyane, hîna li ser riya helbestê dikulin, û pirêna wan guftugoyan jî pirsa helbestê gelekî biçûk dikin, ta radeya, ku wê tenê di hundirê kêsê û rêzbendê de

dihêlin.

Pêre jî mirov pê hay dibe, ku helbest, li gor boçûnên wan, kêşesazî û nekêşesazî ye.

Eger nivîsarek bi awayê malikan û rêzbend jî pê ve be, bête nivîsandin, ew helbesteke kilasîk e, lê eger vê sistemê biguhêre û bi awayê hevokên, ku di bin hev re rêz dibin bête nivîsandin, ew jî helbesteke nû ye.

Bi baweriya me, kurtkirina pirsa helbestê, wek celebekî wêjeyî û cureyekî hunerî, di hundir vê têgihiştina bê nirx de eniya helbesta kurdî dide hember

metirsiyeke mezin û sawdar. Lewre jî xwezî alavên ragihandin û rewşenbîriya kurdî (rojname, kovar, komeleyên nivîskaran û televiziyon) karibûna hin keysan lê bînin, da ev mijar tev hemû awa û warêن xwe, bête guftugokirin, belkî hunera helbestê, ku çetintirîn beşê hunera derbirinî ye, bête naskirin.

Heya ew keys lê tê, dê berxwe bidim, nerîneke, ku heyâ ji min tê zanistî be, berdim holê. Lê ji ber ku xebatêن ji vî cureyî, bi zimanê kurdî, di destan de nînin, ku ji mirov re alîkar bin, ez dê berê xwe bidin boçûnê rexnevanê toreyî ên din, û sûdeyê ji wan werbigrim, wek Dr Fayiz Eddaye û pirtûka wî (Ciwaniya şêwe), Dr. Nayif Belloz û pirtûka wî (Zanista ciwan), Dr Şukrî Mihemmed Eyyad û pirtûka wî (Rêbazêن wêjeyî û rexneyî), Giyorgî Gaçiyêv û pirtûka wî(Hışyarî û huner), wergera bi zimanê erebî, û nemaze jî Dr Îzeddin Îsmaîl û pirtûka wî (Şîrovekirina wêje li ber ronahiya pisîkolojiyê), ji ber ku pîrrê vê lêkolînê ji pirtûka wî hatiye wergirtin. Têgihîştina xebata wêjeyî giringtirîn û metirsîtirîn qunaxa

karê rexneyî ye, lê eger xuristiya wê xebata wêjeyî li pêş rexnevan ne sayî be, têgihîştin zor û dijwar dibe, lewre divaye rexnevan berî pêşî xuristiya berhema, ku mijara rexneya wî, nas bike.

Helbest jî berhemeke wêjeyî pirralî ye, lê giringtirîna wan aliyan, ew e, yê ku xuristiya wê, wek celebekî wêjeyî şirove dike, ango naskirina hemî hêmanên hukardar, ku jê peyda dibe. Ji ber ku hemî celebêن wêje û huner berhemên aferînê û taqetkirina (tecrûbê) hestewerî û hunerî ne.

Hemî helbestvan, çîroknivîs, gotarnivîs, şanonivîs, û romannivîs di xalekê de hevbeş in, ku di tecrûbeyên hunerî re derbas dibin, û berhemên xwe diafirînin, lê cudabûna durvê hunerî yê her celebekî û awayê avakirinê li ser rîbaz û awayê aferîna her yekî ji wan xwedî bandûreke mezin e.

Ji ber vê jî divê rexnevan rîgaya, ku her yek ji wan berhema xwe pê diafirîne, bipelîne û nas bike. Eger em jî li gor vê boçûnê mijara xwe bipelînin, em dê pêşî li ba du awayê durvkirina (Teşkîl) helbestê rawestin.

Yek demdarî ye, mijara vê xelekê, û a din cîgehî ye.

Ü eger keys lê bê, dê di dû re jî, bi awayê piratîk, li ba wêneyê hunerî rawestin.

Durvirkirina demdarî:

Ji demeke zû de, rexnevanan tiliya xwe dabûne ser xaleke giring, ku hunera peyvê ji cureyên din cuda ye. Hunera peyvê demdar e, lê ên din, mîna wênekêşî û peykervaniyê, cîgehî ne, alav û metiryalên a pêşî peyv e, lê yên a paşî reng, herî, hevîr û kevir in. Her yek ji wan bi alava xwe karekî hunerî xwedî bandûra derûnî diafirîne.

Ziman alava helbestê ye, ew jî alaveke demdar e, çiku ji dengan û bergehan peyda dibe; ew jî wek mofirkên zincîrekê, geh tevger in, û geh rawestan in, li pey hevudu rêz dibin.

Ziman, bi vî awayî, durvkirina sînorkirî ye, ji hin bergeh, tevger û rawestanê xwedî wate peyda dibe.

Yan jî ew bi xwe durvkirina demê ye, lê durvkirineke xwedî wate ye, wek çawa wênekêşî (resim) durvkirina cîgeh, ya xwedî wate ye, an jî ew durvkirina cîgeh bi xwe ye, da wateyeke taybet bistîne.

Lê digel hindê, ziman xwedî wateya cîgehî ye jî, ta radeya, ku

mirov dikare bibêje: Durvkirina demdarî a cîgehî jî di xwe de dicivîne.

Ez bawerim, ku peyva (dibistan) dikare mebesta me rave bike. Ev peyv ji sê bergehê (kit) dengdêr (di- bis-tan)peyda bûye, gava mirov wê bilêv dike, pê hay dibe, ku di pey her bergehêkî re rawestaneke kin, an dirêj heye, û her sê bergeh vêkra peyvekê durv diken, ango bûne bingehê dengdêra vê peyva, ku bûye zîmbola cîgehekî sînorkirî û nas, ango gava mirov vê peyvê bilêv dike, an dibhîse, yekser cîgehekî taybet û sînorkirî tê pêş çavan, pêre jî tê xuykirin, ku ziman durvkirina dengdêr a xwedî wateya cîgehî ye. Bi vî awayî, em dikarin bibêjin, ku gava helbestvan zimên wek alava derbirînê bikar tîne, hîngê ew di yek demê de durvkirina dualî, an durû, pêk tîne.

Ango ew ji demê û cîgeh bingehêkî xwedî wate çê dike.

Eger cefayê hunermendê muzûkê ew e, ku dengan bi awakî lihevhatî, li dû hevudu di hundir demê de rêz dike, û yê wênekêş jî ew e, ku bergehan, di cîgehekî de, li hev tîne, helbestvan her du taybetmendiyan di karê xwe de dicivîne; ew cîgeh di demê de, û

demê di cîgeh de, durv dike. Xuristiya alava derbirinê (ziman) jêderâ vê yekê ye. lewre jî karînên derbirîna zimanewanî ji yên derbirîna wênekêşî pirtir û hêzgartir in.

Lê tevî dewlemendiya karînên alava derbirîna zimanewanî, û tevî ku ziman wateya demê û cîgeh di xwe de dicivîne, helbestvan nikare pozbiindiyan li wênekêşan û peykervanan bike, çiku ew alaveke, ku beriya wî pêk hatiye, û tewaw bûye, bikar tîne. Wênekêş xêzan û rengan bikar tîne, û tabloweke xwedî wate pêk tîne, û peykervan hevîr an herî û kevirê bê wate bikar tîne, û peykerekî xwedî wate jê peyda dike.

Lê rewşa helbestvan cuda ye, ji ber ku ew peyvîn zimê bikar tîne, ev peyv jî ji beriya wî çê bûne, û wêne û wateyên wan li nav civakê diyar bûne û hatine naskirin.

Ma çi cudabûn di navbera bikaranîna wî û ya kesen din de he ye?!

Gelo em dikarin weha biçin, ku helbestvan bermayêن civakê bikar tîne, û ti cefaya wî di durvkirinê de nîn e?! Em dikarin weha biçin, ku helbestvan ti tiştên nû çê nake, wek çawa wênekêş û peykervan tiştên nû çê dikin?!. Eger em weha

biçin, em dê çîma serêن xwe biêşînin, û aferînê di karê wî de bipelînin?!

Tevî vê jî mirov dikare bêje, ku helbestvan jî hin caran peyvine nû, ku berê bikar nehatine, çê dike, wek çawa hin caran peyveke nû ji yeke din dirêse û dizeyîne. Lê rastiya hunerî ew e, ku helbest karek e, di dû çêkirin û peydabûna peyvan re dest pê dibe. Anglo zayendina peyvîn nû ne nişana helbestvaniyê ye.

Bi baweriya me, zanîna vê xalê yekemîn gav e li ser riya durvkirina helbestî. Helbest wek xebateke hunerî, durvkirina taybet e, ku ji gelek peyvan peyda dibe; durvkirina taybet e, ji ber ku her hevoka zimanewanî, çi helbestî be, çi na, ji peyvan peyda dibe, ji peyvan çê dibe.

Lê taybetiya çêkirinê sedema serekî ye, ku derbirîna helbestî ji hemû cureyêن derbirînên din, ên zimanewanî, cuda dike.

Eger em careke din vegezin ba têgehê (durvkirin), em nikarin ji bîra bikin, ku meydana durvkirinê, hunera wênekêşiyê ye. Lê ev têgeh ji wir jî ber bi meydana hunera peyvê tê kişandin, anglo durvkirin, wek karekî, di hemû huneran de dibe, lê cudayî ew e, ku hunerên

wênekêşî hissî ne, li ber çavan
û destan in, lê hunera peyvê
paşhissî ye.

Metiryal (reng, herî, hevîr, kevir...
..) li pêş hunermendê wênekêş he
ye, berhemekê jê durv dike, ew
berhem jî yekser dikeve pêş çavan
û ber destan, û di vê riyê re derbasî
rehêن mejiyê mirov dibe, û li wî
hukardar dibe, lê berhema
helbestvan, tevî ku li pêş alavên
hiskirina mirov in, (nemaze çav û
guh) û di navbera wan re derbasî
hundirê rehêن mejiyan dibin, û lê
hukar dikin, lê ne xwedî hebûna
ber biçav in, ango berhema
helbestvan zîmbola tiştan û wateya
ye, bê ku taybetmendiyêن wan
tiştan di wan zîmbolan de hebin.
Wek nimûne, çiqas em peyva
(kevir) dubare bilêv bikin, ew
nikare kevirekîbîne pêş çavêن me,
lê dikare xuristî û wêneyê kêtir
bîne bîra me, dîsan wek nimûne,
wênekêş dikare di navbera
taybetmendiyêن xweyîti yên (rengê
sor) re hukariya yekser li rehêن
mejiyêن xweneran bike, ji ber ku
wî rengî yekser bikar tîne, û
xweneran rû bi rû dide hember, lê
helbestvan nikare vê hukariya
hissî, ya yekser, li xweneran bike,
çimkê wan rû bi rû nade hember,
belê ew zîmboleke biçük e, ku

wateya wî rengî hildigre, bikar
tîne, ew zîmbol jî peyvek e, ji yek
bergehê dengdêrê peyda bûye, ti
taybetmendiyêن rengê sor tê de nîn
in, lê dikare wî di bîriya mirov de
bilivîne, û li pêş cavêن wî amade
bike.

Bi vî awayî, xuya dibe, ku rewşa
wênekêşî û ya helbestvanî ji
hevudu cuda ne.

Li ba wênekêş, pêşî çav rengê sor
werdigre, û di dû re jî bandûra
wî li rehêن meji berhemdar dibin,
lê li ba helbestvanî, pêşî guh
peyvekê dibhîse, û çav jî wêneyekî
bê bandûr, ku ji çend tîpan peyda
bûye, taybetmendiyêن wî rengî tê
de nîn in, dibîne.

Lê gava ev peyv di navbera çavan
û guhan re derbasî hundirê heşê
mirov dibe, û wêneyê hissî, ê ne
diyar, yekser dide pêş his, hîngê
ew jî dikare wê lerzîna, ku
berhema wênekêşî di derûnêن
xweneran de pêk tîne, pêk bîne.
Bi vî awayî mirov dikare bêje, ku
hunermendê hunera peyvê, di
berhema xwe de, bi karê
durvkirina, ku di ser tiştêن hissî re
ye, radibe.

Ev boçûnêن jorîn tenê di tengâ
metiryalêن durvkirinê,
êن pêşî re ne, (reng, kevir, herî,
hevîr li ba wênekêş û peykervan, û

peyv li ba helbestvan), lê helbest, wek karekî hunerî çawa tê durvkirin?.

Ev boçûnên jorîn diyar dikin, ku pirsa helbestê ne tenê lihevanîna çend peyvan e, wek çawa her hevoka zimanewanî tê ristin.

Li meydana helbestê durvkirina taybet heye, ku axiftinê dike helbest, û ji cureyên axiftinê din cuda dike. Gelo ci rûcikên wê taybetiyê he ne, ku axiftinê dikan helbest?!

Eger em careke din li xuristiya zimên vegerin, wek çawa ew hem demdarî ye, û hem jî cîgehî ye, em dikarin bibêjin, ku durvkirina zimanewanî her du awayên durvkirina demdarî û cîgehî ye. Lê tevî vê jî, pergala durvkirina cîgehî cuda ye, ji ber ku wênekêşî meydana vî cureyê durvkirinê ye, çimkê metiryalên pêşî, di vê meydanê de, xwedî cîgeh û li ber alavên hiskirina mirov in, û dikarin bandûra yekser li rehêne mejiyên xwenerên berhema hunerî bikin, lê hunera derbirinî, mîna helbestê, ne bi wî awayî ye, ji ber ku durvkirina cîgeh, di meydana vê hunerê de, cîgeh derbas dike, û jê bilindtir dibe.

Me gotibû her du cureyên durvkirina demdarî û cîgehî, di

meydana durvkirina helbestê de hevbest in, tevlihev dibin, û berhemê diafirînin. Pêre jî mirov dikare bêje, tevî ku helbest, bi rastî jî, demê û cîgeh vêkra derbas dike, lê ew bi xwe bingehê demdarî û cîgehî ye.

Ji ber vê rastiyê jî, gava rexnevan helbestê dixwîne û vedikole, divê ew vê hevbestiya her du cureyên durvkirinê ji bîra neke. Tevî vê jî xuristî û mebesta vê lêkolînê, ku dixwaze evan her du têgehan rave bike, dê her yekî ji wan bi tenha vekole.

Çarçewa helbestê ya muzîkî meydana durvkirina demdarî ye. Zanyarê kêsên helbesta ereibung Xelîl Bin Ehmed Elferahîdî hizrek hebû, heyyarên wê ta roja îro jî hene. Ew hîzr weha diçe, ku her kêsike helbestê taybetiya derûnî heye, lewre jî her yek ji wan ji bo pergaleke derûnî layiq e, hinek ji wan ji bo şâhiyê, û hinek ji bo şînê, hinek ji bo pesnê, û hinek ji bo laqirdiyan(û h w k) layiq in. Helbestvan jî kêşa, ku ji bo pergala xwe a derûnî û hestewerî layiq e, vedibjêre, û helbesta xwe li gor muzîka wê dirêse. Li gor vê boçûnê, mirov dikare bêje, tevî ku kês bi xwe wêneyekî ne diyar û ne li ber çav e jî, lê wateya hestewerî

di xwe de dicivîne, û şirovekirina wê wateyê ji peyvan re dihêle.

Mirov dikare çarçewa vê nerîna Elferahîdî firehtir bike, û di hundir kêşen helbesta erebî de nehêle, çimkê awazên muzikê li her deverê, û li ba her çandê ev xuristiya derûnî heye, li her deverê tu dibînî hinek awaz hene, dikarin mirov bikenînin, hinek wî ber bi semayê de dikşînin, û hinek jî wî digirînin. Bi baweriya me, mirovê kurd,ji ber ku helbesta kurdî demeke dûr û dirêj lêvane bû ye,ji kesen din pirtir hestedarê vê taybetmendiyê ye .

Dêmek, kêşa helbestê bandûreke derûnî heye, dikare pergala helbestvan a derûnî wergerîne. Ev yek rastiyekê bêguman e. lê tevî vê jî ev rastî li ba helbestvanê pêşî, zê ku yekemîn car ew kêş afirandi bû, dimîne, an jî ew kêş ji pergala wî a derûnî bi der keti bû, ji ber ku hîngê ewî helbestvanê pêşî wêneyê surûştê, ku berê tune bû, afirand, ango ewî muzîka, ku ji bo pergala xwe a derûnî layiq bû, afirand.

Bi rastî jî divê avahiya muzîka helbestê ji vê wateyê bi dûr nekefe,divê ev avahî, ji bo pergala derûnî ya helbestvan, neynika sayî be, ango divê helbestvan surûştê di navbera hest û derûnê xwe re

wêne bike, ne li gor çarçeweke, ku berê hatiye çêkirin, li ser wî destlat e, û stûyên hestên wî, li gor pîvan û pêdiviyêن xwe, badide.

Ev boçûnê hanê eniya me didin hember pirsekê; gelek helbestvanê din, di pey ên pêşîn re hatin, û kêşen, ku ji bermayêن aferîna wan bûn, bikar anîn. Gelo ev helbestvanê paşîn li gel xwe, û li gel hestêن xwe ne dilsoz bûn?!. Lê wek me berê jî goti bû, gelek awazên muzikê hene, her hinek ji wan ji bo pergaleke derûnî layiq in, gava helbestvan helbesta xwe durv dike, layiqtrîn awazên muzikê ji nav ên din vedibjêre, û helbestê lê siwar dike, ango ew her tim kêşa, ku ji bo pergala xwe a derûnî layiq e, ji nav koma kêşan vedibjêre. Ev yek dide xuya kirin, ku helbestvan ne girêdayî kêşike sînorkirî ye, û tevî ku ew di hundir çarçeweke sînorkirî de diliye, lê ew çarçew fireh e, gelek kêş tê de hene. Ev jî rastiyekê berze.

Tevî ku ev boçûna jorîn gelek rûçikên rastiyê di xwe de dicivîne, lê nikare xwe ji rexnê biparêze, ji ber ku kêş bi xwe, ango wêneyê wê ê nediyar ti wateya derûnî nîne. Mixabin li ba me Kurdan lêkolînê tecrûbeyî nîn in, ku vê yekê sayî bikin, lê miletêن din,

toreyên din, gelek lêkolînên wisa hene, ku deng di mexberên zimanewanî de tomar kirine, û li wan dengan guhdar bûne, li dawiyê hatiye çespandin, ku kêş bi xwe ne rasteqîn muzîka helbestê ye, belê awayê rêzbûna dengan li pey hevudu, digel kin û dirêjiya wan, sert û nermbûna wan, bilindî û nizmiya wan, digel bergehêن kin û dirêj, ku di navbera wan dengan de hen in, ev yeka hanê muzîka helbestê ava dike, da karibe pergala derûnî ya helbestvan wergerîne.

Zanyarê derûnî G.B.Gêlford di pirtûka xwe de (meydanên pisikolojiyê), wergera bi zimanê erebî, weha diçe, ku encamên wan lêkolînên tecrûbeyî diyar kirine, ku divaye malika helbestê mîna awayê xêzeke muzîkê bête nivisandin, her xêz li gor hulma hestewerî be, hejmara deng û bergehêن, ku di wan xêzan de hene curbecur be, ne hejmareke sînorkirî be, bi ser de jî divê muzîka her xêzê li gor bilêvkirina peyvan û wateya xêzê be, çimkî pêlên hestewerî û derûnî her tim bi awakî namînin.
Ev lêkolînên piratîkî diyar dikan, ku curbecuriya dengan û bergehan, çi ji warê jimara wan di xêza

helbestê de, û çi ji warê astêhulma hestewerî, dikare helbestvanan ji hevudu cuda bike, pêre jî kêsên hene li hember xêza helbestî û hulma hestewerî teng dibin, û nikarin wan bikine dîla çarçewa sînorikrî. Ev curbecuriya kêsê, ne kês bi xwe, ciwaniya muzîka helbestê diyar dike, û ji bo avakirina helbestê dibe hêmanê giring, eger helbestvan, û rexnevan wê ji bîra bikin, dê riya xwe jî şas bikin.

Da em boçûnên xwe bê mînak û xav nehêlin, em dê bala we ber bi du helbestên O.

Sebrî de bidin. Sernavê her duwan „Newroz“ e, her du jî di dîwana wî (Apo, gotinê xav nepijîn bê tav), ya ku rehme lê Hemreş Reşo berhev kiri bû de ne, (rûpel 4 û 109). Destpêka ya pêşî ev e:

Bi xêr hatî tu newrûz sersala me Kurdan î.

Ya din jî bi vê malika jêrîn dest pê dike:

Newroz çiqas delalî vedikujînî derdan.

Ev her du helbest li gor gavêh hespê sivik, ê Cegerxwîn, hatine ristin.

Ev hesp, wek Cegerxwîn dibêje, du gavan davêje, û her gavek ji 7

movikan pêk tê.

(Biner: Hespêن xweşxwanêن kurdî.Hawar, hejmar 22).

Eger em kêşa evan her du malikan verişênin, dê bibînin ew bi awayê jêrîn hatiye:

Malika yekem:

Gava yekem:

1 - 2 - 3 - 4 - 5 - 6 -
7 Bi - xêr - ha - tî - tu -
new - rûz

Gava duwem:

Ser - sa - la - me - kur - da -
nî

Malika duwem:

1 - 2 - 3 - 4 - 5 - 6 -
7

Gava yekem:

New - roz - çi - qas - de - la -
lî

Ve - di - ku - jî - nî -
der - dan

Dêmek tê xuyakirin, ku her du helbest li gor pêdiviyêن kêşekê hatine ristin, lê tevî vê jî, gava tu wan dixwînî, cudabûna heyama derûnî, ya herduwan, yekser li pêş te sayî numa dibe, a pêşî hestê şîndar, û a paşî hestê şahiyê werdigerîne. Xuya ye, gava ewî helbesta pêşî dinivisand, rewşeke derûnî şîndar, ku ji ber nebûna dewlet û keysên jîyîna şahiyêneteweyî peyda bûye, ew

dorpêç kiri bû, û li derbirina wî destlat bû, lê gava helbesta paşî dinivisand, xuya ye ewî tabluwa cejnê û şahiyêن wê di xeyalê xwe de çêkiri bû, ku hemû kes, jin û mîr, keç û xortêن Kurdan li çolê belav bû bûn, kom bi kom, û cih bi cih govendêن semayê lidar bû bûn, û stiran û lîlî bilind dibûn. Ev yek teqez dike, ku kêş bi xwe, bê wate ye, lê hêmanêن muzîkê ên din, mîna curbecuriya bergeh û dengan, kin û dirêjiya wan, sert û nerîiya wan, nîzm û bilindiya wan, digel hêrsê helbestvan û astêن pêlêن hulma hestewerî vêkra kêşê xwedî wate dikin. Lewre gava helbestvan helbestê dixwîne, û tu jî lê guhdarî dike, tu dibînî çawa rûdawêن xwedî wate li ser rû, di navbera dengê xwendinê re diyar dibin.

Tevî ku hewildanêن gelek helbestvanêن iro li ber deriyê nûkirinê dikulin, lê mirov dibîne hinekên wan, bi zanebûn, bi giringiya evî bingehê muzîkî ya helbestê haydar in. Ew pê hay bûne, ku ev cureyê durvkirinê dikare rasteqîn û hukardartirîn wêneyê wan wergerîne. Lewre berxwe didin, da ji çarçewa durvkirina kevin bi der kefin, û yeke nû, ku dikare pergala wan

ya derûnî û hestewerî wergerîne, baſirînin, da helbest bibe wêneyê muzîkî e tewaw, awazên curbecur tê de hem tev lihev bibin, û hem jî ji hevudu cuda bibin, da helbest li derûnên xweneran hukardar be. Ev wêneyê muzîkî, digel hemû hêmanên wî ên curbecur ji bo xweneran alîkarê bê hempa ye, da karibin hestêن xwe, yên ku belav bûne, li gor sîstema wê muzîkê birêsin.

Bi rastî jî bandûra berhema hunerî, dikare hestan li dû hev raxîne, û wan li gel hevudu, di çarçewa sînorkirî de bibestîne, ev yek sedema serekî ye, ku em ji wê berhemê razî bibin an razî nebin. Eger nerîna me a ciwanî êdyal be, û çêja me jî hissî be, em dê mêldarêن rista kevin bin, lê eger em bi felsefa ciwanî, ku nirxê heyîna (rêal, waqie) derûnî di huner û jiyanê de ji bîra nake, bawer bin, em dê mêldarêن rista nû bin. Bi baweriya me, bandûra evê yekê, ta roja îro jî, li ser çêjna civaka kurdî heye, wê ber bi helbesta kevin de dikşîne, û kend û keleman li pêş birêveçûna helbesta kurdî datîne.

Mebesta durvkirina helbesta nû ew e, ku pergala hestewerî bi awayê muzîkê wêne bike, zimanê kurdî jî

ji bo pêkamîna vê erkê amade ye, çimkê zimanekî awazdar e, durv û kêşen peyvan weke hev in, dengêñ ku bilêv dibin, têñ nivisandin jî, lewre ti dijwaryêñ hunerî li pêş helbestvanêñ nû ji bo durvkirina helbestê nîn in.

Lê mixabin pirêñ helbestvanêñ nû, ku bi vê yekê haydar in, pirsa helbestê geleki biçük dikin, ta radeya, ku wê dixin hundirê berdaxa kêm û zêdekirina bergehêñ xêzêñ helbestê, ji ber vê jî tu dibînî ew zû dikefin ber dava dubarekirina sar, û bê hemd dibine dîlêñ rêzbendêñ, ku pirê caran derbirînê, berî pergala hestewerî tewaw bibe, dibirrin, pêre jî nivîsara wan nikare derbasî hundirê awayê helbesta nû bibe, çimkê ew ji bîra dikin, ku awaza helbestê ji lihevkirina tevger û rawestanêñ, ku di navbera bergehan de hene, û pergala hestewerî ya helbestvan pêk tê. Lê kînga xêza helbestî ya helbesta nû bi dawî dibe?

Bersiva vê pirsê li ba hulma helbestvan, û li gel pêlêñ muzîkî, ku di pergala wî a hestewerî de hiltêñ û datêñ, hevbest e.

Serkeftina helbestvanê nû di vî warî de nîşaneke ji nîşanêñ serkeftina helbestê ye, û pêre jî

destlata rêzbendê li ser wî sivik
dibe, ta radeya, ku dikare jê rizgar
bibe, û bê hemd li pey vebijartina
peyvên, ku bi yek tîpê, an yek
dengî kuta dabin, nebeze.

Hîngê pergala hestewerî û
kişandin û berdana hulmê rola
xwe ji bo kutabûna xêza helbestî
dileyzin.

Çiqas muzîka helbestê li gel
kişandin û berdana hulmê
lihevhatî be, ewqas jî rihetiya
fîzyolojî li ba mirov peyda dike.
Ji hêla derûnî de jî, pirê caran gava
mirov dest bi xwendin,

an guhdarkirina hevokê dike,
yekser texmîn dike, ku dê wê di
demeke sînorkirî de bixwîne an
bibhîse. Rastiya texmînê rihetiya
derûnî bi xwe re tîne, lê tersiya wê
mirov bê neçarî cefayêñ zêde dike,
pirê caran jî cefayêñ zêde û bê
berhem hewesa xwendinê di
derûnan de sar dike. Ji ber vê yekê
hin caran mirov xwendina helbestê
bi dawî nyne, belê destan jê bera
dide.

Sedema sereke ya vê yekê
kulandina muzîka helbestê ye.
Helbest avahiya muzîkî e tewaw e,

durvkirina wê jî karekî dijwar û
pir girêk e, çiqas kin an dirêj be,
wê divê yekîtiya hunerî hebe, hemî
hêmanêñ wê ên curbecur
delametêñ xwe pêk tînin û wê
yekîtiyê ava dikin û diparêzin, wek
çawa hêmanêñ gewdeyê mirov
curbecur in, lê hemî vêkra
gewdeyêñ bi rêk û pêk û lihevhatî
pêk tînin, lewre jî tu dibînî çawa
helbestvan peyvên şayik vedibjêre,
û wan bi zanebûn di cihêñ layiq, di
hevokê û xêza helbestî de datîne, û
pirê caran jî bi pêş û paş hevudu
dixîne.

Mebesta helbestvanê kevin ew bû,
ku malika helbestê bi awayê
hevbest û hêja birêse, lê xem û
qisaweta helbestvanê nû ew e, ku
ji bo avakirina helbestê avakerê
hêja be, da avahiya muzîkî ya
helbestê, û wêneyê wê ê hissî di
guhan re derbasi rehêñ mejîyan
bibin, û biherikin hundirê derûnan.
Mebesta wî ew e, ku ewî tiştê
mirov hest dike, gava helbesteke
biyanî, ku di zimanê wê nagihîne,
dixwîne an guhdar dike, di derûnê
xwener de bilivîne.

Bingeħen Gotinē

Xelake nihê

Kepa Kurd

GÊRKIRIN

Gêrkirin: dirêjkirin. Diya min xwe gêr kiriye; dixwaze raze(xewke). Em dibêjin, lingê xwe dirêjke. Lê em nikarin bêjin lingê xwe gêrke. Tenê gêrkirin ji bo xewê û ji bo paldanê ye.

Dudojan şerê hev kir; yekî ê dî gêr kire ser erdê. Gêrkirin wateya xindirandinê jî dide. Wî şebeşî gêr ke rex min.

GÊRÛŞE

Gêrûşe : Destar.

Ev bêje ji van bêjeyan (gêr+û+Şe) ; bêjeya şe, kevir(kuç) e, bi wateya ku kevireke û zadî gêre dike; li ser zadî digere û genim, ceh... pê dihêrtin.

Jniha min tîpa(û) ku du bêjeyan biheve girêdide, ne dîtiye.

GIDIK

Bi qasî bejna mîrekî û çengê xwe jî pêre bilind bike(gotin ya hêja

Evdileyê Tajdîn e), ev dirêjahîya ku lê dipîvan; wek werîsekî, şivêner dihûnan. Paşê jî çend gidik bi heve girê didan û li gurzên daran, ango li kerxan girê didan. Ev kerxa ha jî, ku çend gidik biheve girê didan û direj dikirin ta ku sed ta dar di nav de dihatin girêdan. û ji vî gurzê daran re kerx digotin.

Hûnandina gidikî jî, çar ta giya didane ber hev û dihûnan.

GIJ

1)Gij: zivir, neşayîk. Seyandina dîwarê te gjî e. Ji karê aşêva erdan destê min gjî bûne.

2)Rûyê xwe li min gjî kir; şer dixwest; lê heme min şer pêre ne kir.

3)Xwe gjigijandine hev, lê me ne hişt ku li hev bidin.

4)Gijika te; pora te a gjî û neşayîk. Bi gjikî hev girtin; li vir gjik, por bi xwe ye.

Pora te gjolî ye: pora te gjî e, li dawiyê gjik jî bi wateya pora gjî

hatiye.

GIHAN

- 1)Mêvan gihan, Hun herin, paşê ezê bigehim we.
- 2)Sêvên me hîn negihan e; kerikên şîn in. Kerik: Ne giha ye, şîn e; nayê xwarin.
- 3)Keça Gulê gihaye; mezin bûye.

GIL

Gil angu ax, xak. Seydayê Cizîrî li(r132) gotiye:

Her gil û seng dibitin zêr bi
tedbîri hekîm

Qabiliyet ku nebit hikmeti
ustadi çi kit

GIL: Ax e. GILMITIK(gil+mitik):
Giloka heriyê ye.

GINDIRANDIN: Xindirandin.
Lingê terembêlê gindirî,
çû...Tişta gurover digindire.
Xar jî digindire, şebeş digindire

GIR

Cihekî bilind e. Li ser erdê
tingalên axê hene. Lê ku ew tingal
mezin bûn, dibine gir.

Gir ji axê çêdibe, ji tingal û ji
komê jî mezintire. Lê di
meznayîya xwe de ne wek çiya ye;
bilindayîyek li ser erda rast e.

Diyar jî dibêjin

GIRR

1-Girr: Girrû. Corek nexweşi ye;
dixwere û li cihê xwerê pirzik
çêdibin edab, av û şij jê der
dikeve.

Girê devehan heye; nexweşiyek
bi devehan dikeve.

2-Girr: Kîn û dilreşî ye. Ev kur bi
girr e, ku xeyidî kes nikare wî aşt
bike.

GIRAN

1)Hesin giran e. Lê pembû sivik e.
2)Me pembûyê xwe giran firot.
Lê me bacanên xwe arzan firotin.
Vê salê baran nehat; ji lewra nîrekî
giranî bi ser xelkê welat de hat;
her tişt giran e.

GIREW

Ji girtin hatiye; binyata lêkera
girtin û paşpirtika(ew); lê ez
nizanim ev paşpirtik ji ku hatiye!?

Girew ew tişt e, ya ku di ber
tiştekî de dignin. Keç di girewa
kuştinê de digirtin, di şer de mîrek
hate kuştin, vêce ji bo aştî bikeve
nav herdu malên ku dijiminayî di
nav wan de heye, keçek ji ya wan
di girewa xwînê de dibirin, û dibû
bûka malê.

Xelo perê Rizgo ne danê, vêce
Rizgo çêleka Xelo di girewa perên

xwe de bir.

GIREWNAME

Kaxeza li ser girewê hatiye nivîsîn. Ji bo mînak: Mirovên pare bi ker(deyn) didin, ji bo dilniya bin ku, perêن wan neyin xwarin; hin zêr di girewa perêن xwe de digirin. Lê ew herdu alî girewnameyekê dinivîsin.

GIRÊBAN

Girêban: gîrfan: kûrik: Berîk. Di baweriya min de, ev navdêr ji van du bêjeyan(girê+ bend) pêk hatiye; li demekê; ji berî ku kûrik bidozin, hûremûrêن xwe di nav Paçekî de û bi benekî girê didan û di paşila xwe de dihilandin. An jî kîsikekî dirûtî û bi benekî di ber pişta xwe re dikirin û baş girê didan. Di peyre kûrik(berîk), ya ku bi rengekî pêşketítir bû çêkirin.

Melayê Cizîrî(r.93)
ji Eliqdelcewherî dibêje:

Bîşkiwêن benda girêbanê ji rengê kewkeban

Berq û tîrojêن ji xorşîdê vedayî rast û çep

GIRIK

Girika hevîr, bi wateya guloka hevîr. Girik ji bo hevîr bi kar tînin.

Girik jî girovek e; lepa xwe ji hevîr tejî û bi regekî girover dîkin.

GIRGIR

Girgir, navê deng e. Girgira vê keçê ye; diçê û tê(dengê piyêن wê). Herweha dibêjin, ci girgira te ye, angu ci qîjqîja dengê te ye. Girgira terembêlê tê; dengê wê tê.

GIRTIN

- 1)Girtin; pêçewanê bêjeya berdan e. Makdera lêkerî ye. Min girt, te girt. Min sêvek bi destê xwe girt.
- 2)Leşkerê dewletê girte ser gund. Di şeva nîvê şevê de girtine ser gundi. Gotina bav û bapîran.”go te girt, ber nede, go te berda, pey ne keve”
- 3) cilekê bigire ser birayê xwe, wî bi nixumîne.
- 4) Deriyê malê bigire; vekirî ne hêle.
- 5) Çavêن xwe bigire; mijgûlan bi ser hev de deyne; çavêن xwe miç ke.

GIVRIK

Givrik: Pilitik; hinekî mezin bûye. Xwarina ku ew dixwe, lê na givire(guvire); ji lew ra tim lawaz dimîne.

GIYABENİŞT

Giyayekî bi pinik e, û bi sipîve ye; meriv dicuwe; li paş demekê ji cûtin û tif kirinê, ew giya dibe wekî benîst.

GIYANAS

Mirovê ku bi giyayî dizane, giyayê baş û nebaş ji hev nas dike.

GIYAXWIN

Giyayekî gelek xurt e; eger mirovêkî xwest weku hemî giyayên dî, hinek ji giyaxwînî biçine; bêguman destê wî xwîn dibe û nikare bi qurêfe, ji ber vê yekê ye, ku giyaxwîn nav lê kirine.

GILOT

Glot, Pizotê agir e; Agirê daran ku baş pêdikeve û dû namîne, paş ku guriya agirî jî divemire, her yek ji wan parçenâ daran dibe gulotek ji agirê sor.

Navdêra glot di zimanê elmanî de jî heye û bi vî rengî tête nivîsin glut û bi vî rengî(glût) tête xwendin.

GO: Gok; tiştekî gurover e dagirtî ye.

1)Goka bi pê dileyîzin.

2)Goka holê ya ku li ber kaşo pê dileyîzin.

3)Gokên zîvînî jî hebûn û iro jî ên

zêrînî hene, ku ji bo xemla jinê ne.

Melayê Cizîrî gotiye:

Mislê goyê bê ser û pa bûme li ber derb û şekan Rûpelê 458

GOL(l) bi qelewî tê xwendin.

1)Gola avê. gol heye û golik ji heye, ew jî biçûkkirin e.

gola Wanê li bakurê Kurdistanê heye. Gola Ormiyê li Kurdistanâ rojhilat e .

2) Ku gok derbasî torê bû, dibêjin golek anî.

GOMIK, gumik, gûmik: nermik Gomika teliyê, serê teliyê, ango nermika teliyê. Celadetî ji vê navdêre re “gûmik” dibêje. Lê di baweriya min de a rast gomik e, an jî gumik û ne gûmik e; ji ber ku navdêra “go” û ya “gu” di gelek gotinan de peyda dibe, wek: gok, gopal, gop, gurover, gulok,..Ev navdêr bi wateya nişîvtin û guroverî tê.

GOPALan jî kopal

Kopal di bingeh de, ji du gotinan pêk hatiye(gop)an jî(go) û (pal) ango ew darê ku ji rexekî ve gop e; ji mirovî re dibe weke berpal. Mirovêkî ku di nav salan de çû be, bêhêz dibe ji lewra gopal(kopal) ji

xwe re dike berpal û bi destê xwe digre.

GOR

Gor û gorin jî dibêjin ; çala mirî tê de diveşérin; bin ax dikan.

Ev gotin di zimanê elmanî de jî Grab jê re dibêjin.

Gor, bi wateya weke; ango çalek e, li gora laşê mirovî ye; gora zarokekê piçûk e û ya mezinekî, mezin e.

GORE

Gorewî, gora pê jî, li gora mirî diçe, ji ber wê jî ev nav lê kirine, ew gora mirî ye, ev jî gora pê ye, lê ji bo ku cêbûnek di nav herduwan de hebe, tîpek dido ku lê zêdekirine; gor bû gore an jî gorewî.

GORNEBAŞ

Ev teba di paşgora mirî de dijî û goştê mirî dixwe. Çala gorê hinekî kûr e, lê di dîwarê wê kortê de paşgorê jî dikolin û mirî di paşgorê de diveşérin; bergor(rexgor) jî ji jêre dibêjin(. Vêce ez dibêjim ku gotina paş bûye baş. bi wateya ku ji wî ajelî re gornepaş gotine û paşê bûye gornebaş.

GOŞE

Goşe: Enîşk; gihadina du

dîwaran, ji rexê mal de kunçik e(kujbin), ji rexê der ve jî goşe ye, çik, an jî enîşk e. Herweha bi wateya rex jî têt.

Melayê Cizîrî li(r198) dibêje:
Dama belayê der kemîn her
goşe dormadari çerx

Di helbesteke dî de jî dibêje :
Tîrek ji keman xedebê da cigerê rîş
Mil dane ber û ser ji du goşan
veweşandin
Rûpelê 477

GOV

Xaniyê ku şevê pez têde mexel
dikeve.

1)GOVA, ev bêje di ferhenga
mamosta Hejarî de bi wateya şahid
hatiye.

GOVA, GOVAH, GOVAN,
guwah, guvah; bi van çend rengan
tê gotin û bi wateya (şahid)
hatine, ya ku ji zimanê erebî tev li
zimanê kurdmancî bûye.

Govan ango gotinvan; ew kesê ku
gotinan dibêje.

GOVANî; karê govan e;
Şehdebün e.

GOVANNAME: karê

nivîsandî ye.

2)GUWAH, guvah: Weke dîtiye
dibêje: Şahid.

Mamosta Celadetî bêjeya guvahî
di Hawarê de bi kar tîne, dema
dibêje:(Ji milê din bi guvahiya
gelek nivîskaran tête zanîn ku
Kurd di tújzîrekiya tebîî, zûbîrbirî
û di...ne kêm in.

H.r384. Lê mamostayî di ferhenga
Hawarê de“guwah“ nivîsiye.

3)Herweha mamosta Elî Sîdo
Goranî jî navdêra“guwah“ di
ferhenga xwe de brengê xwarê
nivîsiye:

Guwahbîn; yê ku dibîne û dibêje.
Guwahî, gotina ku guwah dibêje.
Guwahname: Gotina guwah ku di
nameyekê de tête nivîsin.

Guwahge, guwahgeh: Cihê ku
guwahî tê de tê gotin.

GOVAR

Ev bêje ji van du
gotinan(gov+ar)pêk hatiye; pirtûka
ku nivîsin û agehdarî di nav de
têne nivîsin.

Ji van gotinêñ jor mirov digihe
rastiyeke, ku govar ji
kovarê rastir e.

GOVEND

Di bara vê bêjeyê de ez bîr li du
wateyan dikim:

1)Ev bêje ji van du
bêjeyan(go+vend) drust bûye ; di
zimanê me de, tîpêñ(v,b,w) cihê
hev digirin.Bi wateya ku bi rengê
rêzebendeke gurover destêñ hev
digirin û dîlan dîkin.

2)Ev bêje, ji van du
bêjeyan(gove+bend);tîpa(b) li nav
çûbe.Bi wateya gotin û bendêñ
stranan.

Li bêjeyêñ govan û govanî û yên
dî jî binire!

GUHAN

Guhanêñ çêlekê...Guhan jî ji guh
hatiye,wek
guhikan bi qêla ajelan ve çêbûne.
Serçir(serçira şîr) jî ji wan re
dibêjin.

GOVDE

Govde: Gewde, laş

GUHIK

Guh+ik. Paşpirtika(ik), li vir ji bo
piçûkkirina guh e, guhikêñ têrê,
guhikêñ merşê; çar enîşkêñ wê,
dibine guhik. guhikêñ nivînê,
guhikêñ balgeh...kujî jî ji guhikan
re dibêjin.

GUHAR

Guhar, ev bêje ji navdêra guh û
paşpirtika(ar)pêk hatiye.
Guhar, ew parce zêr an jî kanek dî

ku ji bo xemla jinan di guh de ye.

GUHDAR

Guh û dar; bêjeya (dar), weke paşgirekê diçe ser hin bêjeyan, bêjeyeke nû, bi wateyeke nû dide. Hesenê melê Çirokbêjekî bi kêrhaî bû. Wî çirok digotin û civatê guhdarîya wî dikir. Guhdar, ew e ku guhê xwe dide gotina yekî ku diaxivê. Ezê bipeyivim û tu guh bide min.

Guhdarê birayê xwe be, ew di xew de ye. Bi wateya ku çavê te lê birayê te bin; guhê te li ser dengê wî bê.

GUHER

Guherê pez, cihek li vederî gund e; mexel jî jê re dibêjin. Şirûvekirina min bi vî rengî ye:

- 1) Dibe ku li destpêkê ev guher, bêdestnîşankırı be, iro li vir lê siba li cihekî dî ye, bi wateya guhertin ev nav lê kirine.
- 2) Dibe ku ji van du bêjeyan(guh+ar); angu guhekî erdê(rexek). Dibêjin, em li guhekî firazê rûniştin.

GUHER, şêwl, mesîl; erdeke rast e. Bi wateyeke dî, dema ku mesîleke bê av û bi rengekî berfereh û rast hebe, jêre guher dibêjin û herdemê dibe cihê

guherê pez. Dibe ku ev navdêr jî her ji guherê pez nav lê bûbe; ji ber ku tim di wan mesîl û bestikan de pez dane mexel.

Ev jî jime re dide xuya kirin ku civaka me pezekî zehf xwedîdikir û her malek gerekê guherekî bûye. Ü ew guher jî binavkirî bîne.

GULAN

Gulan; Mehek ji duwazde mehê salê ye, ya ku têde gul dibişkivin; meheke têrgul e.

GULBEROJ

Navê gulekê ye; ji ber ku berê wê tim li rojê ye, gulberoj lê kirine. Gula berberoj jî jê re dibêjin.

GULÎ

1) Gulî; li hin deveran bi wateya kezî, ango pora hûnayî hatiye. Guliyê keça min zérîn in. Lî li hin deverên dî jî bi wateya biskine girêdayî têt; dema pora zarokê, nemaze ya keçikê hîn hûre, bi benekî sipehî girê didin. Ü ez dibêjim ku ev rast e, ji ber ku guliya darê jî ew çiqilên hûr ên şîn e himbiz re dibêjin.

2) gulî; guliya darê; ji wan çiqilên hûr ên heşîn û himbiz re dibêjin guliya darê; angu pora wê.

Di vê stranê de hatiye:

Were, were were, wa gulbiharê te Cemîla,r98
sêva sor e li guliya darê
Celîla, r149

GULPIK

Gulpikên darê. Dema ku dar ter
dibe û ji berî ku pelik bide,
belbûnin di çiqilan de xuya dibil û
ji wan girêkan re gulpik dibêjin.
Ev bêje ji du bêjeyan pêk hatiye;
gul+pik; angu
ew girêk li diwarojê dibil gul û
çiqil.

GUMAN


1)Guman, bîr û bawerî; di gumana
wî de ku riya wî rast e. Gumana
min naçe ser wî ku ew mirovekî
nebaş e.

2)Guman; bîrkirina nerast e.
Bêguman; rast û bê tozik e.
Melayê çizîrî dibêje:
Bêguman xaka riya wê tûtiya û
dane ye Ger di çehvên kor ve ênin
xweş dibil pê dîde yeRûpelê499

Gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê

Dîrok,rêxistin siyaset

Xeleka sêhem



Dr. Ebdi Mecîn Şêxo

Rewşa rêzanî di bin siya destlatdariya
Dr. B. El-esed de

2000-2005

Em dîsan vejerin ser siyaset û helwesta hukumeta Sûriyê, lê vê carê di bin siya destlatadarya kurê Hafiz El-esed, Dr. B. El-esed de,.belkî zor hêja ye,ku em vê mijarê bi gotina feylesofê alman ê navdar, Hîgêl, û ya bi naveroka xwe pir watedar dest pê bikin .
“NE CEMAWER Û NE Jî HUKUMET JI DÎROKÊ TIŞTEKÎ HÎN NE BÛN; AN LI BER RONÎYÊN DÎROKÊ, KARÊN XWE BI RÊVE DIBIN....”^oSerok komarê Sûriyê Hafiz El-esed di 10 Pûşpera 2000 û de koc kir,ewî pir nexwaşiyên giran li şûn xwe hêstin .B. El-esed bi çûveke suhrebazî ya partiya Bees ji pileya serbazê biçûk dibe cênelâr herî bilind li Sûriyê,û biryara temenê çel saliyê ji bo serok dewletê zor bi hêsanî,bê rêzgirtin li destur û yasayêن dadweryî, bê vîna gelên Sûriyê tê guhartin,yekî 34 salî,li şûna 40 salî ji bo xatirê B. El-esed, rewa tê dîtin û bi darê zorê tê pejrandin .

Hukumeta Sûriyê, bi riyên hemî dezgeyên parastinê, û berdevkên xwe,ên xwefiroş miletên xwe neçar kir,ku ewanan B . El-esed ji xwer e wek serok komar helbjêrin.

Bi texmîna min, di vê firka ramyarî de şanoyeke siyasî dîtir li Sûriyê dest pê kir, lê vê carê, qehremanê wê B . El-esed e .Ewî rola xwe, bi peyva xwe a siyasî ji gelên Sûriyê û cîhanê re bi hilmeke rêzanî û dêmokratî dest pê kir, soza hatina buhareke nû ji Şamê daye gelên

Sûriyê û bi serda jî li pêş perlemana Sûriye sund xwar, ku rêtê li nîrînêñ cuda bike.

Birastî jî,dewleta Sûriyê, di destpêkê de 600 girtî ji zîndanê serbest kirin û wek hin çavkanî dînîvisînin, ku deriyê girtîgeha Mezê bi yekcarî hate girtin.

Guhêñ hêzên dêmokrat û mirovperweran li Sûriyê û li cîhanê li axiftin û daxûyanîyêñ serokê nû bûn,li ber roniya sozêñ serokkomarî, siyasetmedar û rewşenbîrêñ Sûriyê, di çarçewa saziyêñ civaka bajarvanî de, dest bi xebatêñ xwe kirin, komel,glupêñ hevdîtin û hevpeyvînan li pênavâñ pêşketina Sûriyê û avakirina civaka bajarvaniyê hatin damezrandin, wek nimûne,

1-Glupa diyaloga niştimanî.

2-Glupa Cemal El-etasî ji bo hevpeyvîna dêmokrat.

3-Glupa çep(Şam).

4-Glupa El-kewakibî(Heleb).

5-Glupa El-hesekeji bo hevpeyvînêñ ronakbîrî.

6-Glupa Bedirxan(Qamişlî).

7-Komela mafêñ mirov li Sûriyê

8-Vejandina komîtên berevaniya mafêñ mirov li Sûriyê

(Ewan komîtan, hîn di sala 1989 an de hatî bûn damezrandin , lê pişti buhara nû!!!! Ewanan xwe vejandin, dîsan karêñ xwe berdewam kirin.9-Komîtên vejîna civaka bajarvaniyê.

10-Glupa Himsê ji bo diyalogê. U. w. d.

çîma ev dezgeyêñ bajarvanî pêwîst in?

Wek tê zanîn, ku dezgeyêñ civaka bajarvaniyê ji her civakekê re egereke objektîv e, ji ber ku, kardayeke wan erêñî di civakê de heye, û rola wan di pêşveçûna civakê û her heyamekê de jîndar e.

Ev dezgeh kanîn civakê berse bajarvaniyê û pêşxistinêñ erêñî bibin,û bi xwezayêñ xwe ên şarastanî û pêşverû, bi alavêñ dêmokrat dikanin hemî şop û bermayêñ şundamayina civakî, siyasî ji holê rakin, civakê ji hemû rûdawêñ şunketinê û kevneperestiyê rizgar bikin.

Di civaka Sûriyê de saziyêñ bajarvaniyê pir kêmhejmar bûn, ewanan di bin destalatdariya dezgehêñ ewlekariyê de dinalîn, çalakiyêñ azad ji wan re ne gengaz bûn. Lewra jî, rolêñ wan di pêşketina civakê de pûç

bûn, û ewan nikanîn kêrhatiyên gelên Sûriyê biparastana., Lewra jî, ewanan hêdî, hêdî bûn beşek ji partiyên Bees, pirên wan jî bûne noker û berdevkên saziyên parastina sudêñ dewletê, ji bervan sedaman jî, civaka me li Sûriyê bi demê re, ji gelek aliyan ve nexwaş bû.

Lê piştî _buhara nû_ sazî û komelên, ku me li jor bi navkirine, dest bi çalakiyên xwe kirin, komcivîn girêdan, nirîn û rexnên xwe bi awakî şarastanî anîn zimên, destêñ xwe danîne ser pir nexweasiyên civaka Sûriyê, û ewanan di roja rojê de nasnamêñ xwe ên siyasi, bajarvanî zor bi zelalî ji hukumetê re da bûne xûyanîkirin, û goti bûn; em ne berdêla hukumeta Sûriyê ne, em naxwazin dewsâ wê bigrin .

Di rastiyê de jî, hemî sazî û komele bi riyên rîformêñ siyasi daxwaza çareserkirina asteng û alozêñ hûndirî kirin .

Lê mixabin hukumeta Bees dîsan ji çalakî û xebatêñ wan pir çavteng bû, ji ber vê jî, B. El -esed di 8 şibata 2002 an, di hevpeyvînekê, bi rojnama “Rojhilatanavîn”de goti bû; “ pêwîst e pêşxistina saziyên bajarvanî li Sûriyê ne niha be, ango, bila ewanan paşê xebatêñ xwe rîve bibin, û hebûna wan ne ji erkêñ me ên pêşn in” Di vir de baş diyar dibe, destlata Sûriyê pir ji xwe tirsîya lewre jî, ewê zû,zû dest bi girtinê çalakvanêñ van saziyên civaka bajarvanîyê di 1.09.2001 ê de kir, deriyêñ baregehêñ van saziyan bi mûmêñ sor girtin.

Em bashtir dibînin,ku em navêñ chend nasdarêñ van saziyan li vir bibelgînin,Dr.Kemal El bunnî (pijîşk),endamê encumena komîten berevaniya mafîn mirovan li Sûriyê.

2_Riyad El turk serokê giştî yê partiya komunîsta El surî (baskê polît bîro),ew jî ji sala 1980-1998 an de di zîndanê de bû, û ew dîsan di 1.09.2001ê de hat girtin, û di pişt re dîsan û vê carê zû hat berdan..

3-Dr.Arêf Delile,pisporê zanistiya aborî, damezrênerê komîta Vejîna civaka bajarvaniyê,ew jî ta niha ji girtiyêñ -buhara nû -ye.

4-Bervedêr Hebîb Îsa peyvdarê fermî, ya glupa Cemal El-etasî ji bo hevpeyvînen dêmokrat,û ew di di 11.09.2001ê de hate zîndan kirin.

5-Riyad Seyf, endamê encumena gel û yek ji berpirsiyarê “glupa hevpeyvîna niştimanî ye, ew jî di 6.06.2001ê de hate girtin.

6-Fewzî Têlo, çalakvan di glupa hevpeyvîna niştimanî de ye, û ew jî hate zîndan kirin.

Li sebaret gelê Kurd jî, tevgera me jî berxwedaye, ku sudê ji _buhara nû - bigre, ew jî bi hin çalakiyan rabûye, wek mînak, di 10.12.2002 an de, bi bûneya roja navnetewî ya mafêñ mirovan bi sedan Kurd bi aştiyane li pêş avahiya perlemana Sûriyê civiyan û daxwaza pênasîna mafêñ netewî û nehiştina zordestiyê li ser gelê kurd kirin, lê, piştî kurtedemekê du endamên polîtbîroya partiya yekitîl-Hesen Salih(niha sekretêrê partiyê ye)û Merwan Osman ji aliyê dezgehêñ parastinê de hatin zindan kirin, piştî maweyekê herdu têkoşer serbest bûn.

Di meha 6ê, sala 2003 an de bi alîkariya çend partiyên bizava Kurdî, zarokêñ Kurd gurzêñ gulân dibirin ji bîroya rêxistina cîhanî YONISEF li Şamê, bi ser da jî, ewanan dixwastin bîrnameyekê bidin vê rêxistina navnetewî, di nama wan de, wisa hat bû nivîsin”....Em zarokêñ Kurd jî dixwazin bi zimanê dayikê bixûnin, bextewar û serbest bijîn.....”

Lê weke her carê, leşger û mirovên dezgehêñ ewlekariyê nehêştin ku zarokêñ Kurd bîghînin baregeha YONISEFê û bi zor û tirsê ji hev belav kirin, li dawiyê jî 7 bav û merovên minalan yekser û di cîh de girtin.

Bê guman, bi vê şêwaza ne rewa, hukumeta Sûriyê ne tenê li dijî Kurd û zimanê kurdî radiweste, lê ewa hîn li dijî yasayê navnetewî û dêkleretsiyona, sala 1924 an de disechine û xwe rûreş derdixîne.

Di vir de, hêjayî bîranînê ye, ku em helwestêñ hin bervedêrên welatparêz di derbara vê bûyerê de destnîşan bikin, di 1.07.2003 an de bervedêrên Kurd nameyek ji bo piştvanîya girtiyêñ Kurd ji şalyarê hundir re şandin û di wir de daxwaza azadiya wan ji şalyar kirin, her weha jî, ewanan gelek bi wêrekî baweriyyêñ xwe li ser daxwazêñ xwepêşandanen bi erêñî derbirîn, ewanan di nameyê xwe de weha nivîsi bûn, ”Daxwazêñ van hemwelatiyan ji rêxistina YONISEF, mafêñ dadmend in, û xwestekêñ wan mîna berevaniyekê, ji dozeke rewa re ye, çimkî, ew doza, berê ji aliyê hevpeyman û belgeyêñ navnetewî hatiye mor kirin.....”

Wek tê zanîn, ji ber hoyêñ siyasî, aborî, setemkariyêñ hukumeta Sûriyê li dijî gelê Kurd jî, bi deh hezaran Kurd ji Rojavayê Kurdistanê hîn, di destpêka salêñ 40î, sedsalâ 20 ê de, panaberî dervayê welêt bûn, û bi piranî li welatêñ ewropî cîwar bûne, wek,

Almaniya,Holenda,Firensa,Nemsa, Êngilistan, Siwêdê, û. h. d.

Di destpêkê de niştimanperwerên Rojavayê Kurdistanê, xebatêñ xwe, yên rêzanî bi piranî di nav komelêñ xwendekarî li Ewropa dikirin,pişt re, hêdî, hêdî liq û şaxêñ partiyêñ bizava kurdî li Ewropa jî ava bûn, û têkoşinêñ serbixwe domandin.

Rêexistinêñ tevgera Kurd li dervayî welêt bi alîkariya hemî welatparêzêñ Kurd, bi riyêñ civînêñ navxweyî sêmînarêñ vekirî, daxûyanî û weşanêñ xwe, xebatêñ rêzanî dikirin, çiqas bizava wan li vir serkewtî bû an lawaz bû? Em bi kurtî dibêjin, gavavêtinêñ wê zor kurt û şermok bûn.

Di van deh salêñ dawî de, em kanin bêjin, rêexistinêñ tevgera Kurd û gelparêzêñ Kurd ji ber hin sedemêñ berçavkirî gavêñ xwe, li gor yên berê, dirêjtir davêjin, ewanan dengêñ xwe di nav civakêñ ewropî de bilind dikan, jan û derdêñ gelê xwe bi riyêñ xwepêşandan û meşan, bi gel û hukmetêñ ewropî didin nasîn û zordestiyêñ nijadperestêñ Sûriyê li pêş balyozxanêñ dewleta Sûriyê, protêst dikan Wek nimûne,rêexistinêñ tevgera me,bi bûneya bîranîna roja destpêka hejmara awerte di 5.10.1962 an de,her sal xwepêşandan li pêş balyozxanêñ dewleta Sûriyê û nemaze li Almaniya rôdixin.

çalakiyêñ tevgera me ne tenê li pêş balyozxanêñ Sûriyê çê dibin,lê bizava Kurd hin caran li pêş balyozxanêñ dewletêñ ewropî jî, ji bo pêkanîna mafêñ Kurdan,dengê xwe li dijî kevnisperestêñ Sûriyê radike.

Dîsan tenê wek nimûne, di 8.08.2003 ê de,

1-Hevbendiya dêmokrata Kurd, di wê demê de 5 parti bûn,û niha 4 in

2_Partiya yekitî li Sûriyê.

3_Partiya hevgirtina gel li Sûriyê, (di wê demê de),,bi piştvanîya “Hevkarî “(rêexistin û partiyêñ 4

beşen Kurdistanê li Almaniya di vir de henin .),komîta berevaniya mafêñ mirovan li Sûriyê,û bîroya başura Rojavayê Kurdistanê di kongira gel de „ xwe pêşandanek li pêş balyozxna îtalî li Berlînê pêk anîn, lê chima li vir? Ji ber ku, di wê demê de,Îtaliya serokatiy yekitiya dewletêñ ewropî(YDE) dikir.

Pishtî xwepêşandanê, hin nûnerên vê hevkariya tevayî bîrnâmeke berfereh bi riyê sekretêre balyozxanê ji (YDE) re şandin.

Ewanan di bîrnamê de wisa dinivîsinin”..Em dixwazin balêñ we ber

rewsha gelê Kurd ya bêzar li Sûriyê bikşînin, ku chawa gelê Kurd di bin zor û bindestiyekê şoven de dinale, û chawa rêtîma Sûriyê projêtîn awerte li dijî gelê me bi kar anîne,.herwisa jî destlata Sûriyê guhêن xwe ji hevpeymanêن navnetewî,yêن ku, di derbarê mafêن mirovan, gelan, û kêmnetewan de hatine terxandin, girtine.

Ewan ji wan re hîn dibêjin, em lavayê ji we dikin, ku win xwe xerîkî vê pirsê bikin û çareseriye desturî jê re bibînin.....û em ji we dixwazin ku win têkariyên xwe li ser rêtîma “Bees” bikin, ta ku ewa jî,ershîfa Kurdan vekin, ...û wê li nik dezgâyê ewlekariyê nehêlin, û bila hemî girtiyên siyasi serbest berdin..”

Lê mixabin, wek ji me hemuyan re diyar e, ku (YDE) hîn naxwaze serê xwe bi kêşa Kurd re li Sûriyê bêşîne, yanê ewa jî dixwaze sud û kelkên xwe li Rojhilata navîn biparêze, lewra jî ewa hîn bi tirs û shermî berve pirsa gelê Kurd diçe.

Di encamên van çalakî û pirêن din de, bizava me li dervayî welêt hîn bandorêن pelandî li raya giştî nekiriye, û ne jî rêtîma Sûriyê amedeye li ser asteng û aloziyêن civaka Sûriyê bi giştî û yên gelê Kurd nemaze raweste.

Partiya Bees piştî rûxandina rêtîma Sedamê diktetur Di 9 nîsanê 2000 û de Bexda ji bin nîrê Sedamê diktetur bi alîkariya Emêrîka û hêzên hevpeyaman rizgar bû, Sedam û nokerêن xwe ve reviyan û hin ji wan li Îraqê, û hin din li welatêن dirawsê wek Sûriyê, Urdonê û hin din xwe veşartin.

Bê guman bi têkçûna destlata Bees li Bexdê, tirseke mezin di dilên serdarêن diktetur û dewletêن ne dêmokrat li Rojhilatanavîn de bi giştî û li van welatan,Turkiyê, Iranê, Sûriyê bi taybetî hate çandin, loma jî rêvebirêن van welatan bi leztirîn dem têkelî li gel hev chê kirin û bi hev re pîlanêن gemarî li dijî Îraqa nû, bi gelempêrî û nemaze li dijî pêşketina asoyêن pêşeroj ya azadiya kurdistanê hûnan..,wek mînak, serokê Sûriyê B. El-esed bi mebesta hevpeymanên shoven, di 6.01.2004 an de seredana Turkiyê kir.Iranê jî, bi pêwendiyêن xwe olî (Shêî) destdirêjiyan dike, û li ser chend benan û werîsan yariya siyasi dike, lê ewa nikane armancêن xwebi sanahî bipecine.

Lê, li vê dawiyê, ewê hinekî xwe ji destlata Îraqa nû re sist kiriye, diyar

e, ku ewa niha naxwaze dijwariyên mezin li pêhs hukumeta duhnem, ya Îbrahîm El-ceferî re (şêî) biafirîne, sersedemên vê jî,belkî ev bin: 1-Rewşa hindir li Îranê, ne pir li heve û alîkar e.

2- Faktorêñ dervayî. Em texmîn dikin, wê di pêşeroj de, pirsgirêkên niha veşartî û bin cil, dê werin zelal kirin, û destlata Îranê, dê helwestêñ xwe bi taybetî li dijî herêma Kurdistanâ İraqê hiştir bike .Turkiyê jî, gefgurêñ leşgerî arastî pêşengêñ Kurdistanê dikir û digote wan; chê nabe win dewleteke serbixwe ava bikin, û divê win destêñ xwe dirêjî Kerkükê nekin, ew bajarê, ku nemir M .M..Berzanî jê ra digot:” dilê Kurdistanê Serokşaliyarê Turkiyê Recep Ordegan di meha yêkê ji sala 2004an de, di rojnama ”Bûyerên erebî”de ya li Bêrutê derdikeve, weha goti bû:“Eger li Arjantînê jî dewleteke Kurdish bête damezrandin, emê li dijî wê sher bikin..”

Di vir de,peyv û nirîma serokê pakrewan . M.M.Berzanî hêcayî bîranînê ye, ewî hîn di sala 1948 an de, li Bako (paytexta Ezîrbêcanê) goti bû: “Dijminêñ ku Kurdistan bindestkirine, dijmantiya xwe ji hev re ji bîr dikin, û li ser Kurdish dîghênin hev“.

Di rastiyê de Sûriyê dijmantiyêñ xwe bi rîcîma İraqê re ji bîr kir, û ewê bi qaserî⁵⁵ kesean ji serdarêñ rîcîma xûnvexwar li İraqê û di nav wan de jî, birayê serokê bazdayî, Îbrahîm El-sebawî, hembêz kirin,û bi ser vê de jî, hin chavkaniyêñ fermî û ne fermî dibêjin, ku Sûriyê çekêñ atomî yêñ İraqê li nik xwe veshartine, ta ku herdu rîcîmêñ beesî, Emîrika û hin gelek rîextinêñ dêmokrat li İraqê li rûyê cîhanê û raya giştî derewchîn derxînin, û bêjin, va ye İraq bê çekêñ atomî ye.

Baweriya mirov bi van helwest û lîstikan pirtir dibe; eger ew ji hin çavkaniyan dibhîse; ku B. El-esed,di 2003 an de tawanbarê gewre Elî Hesen El-mecîd, lehengê tevkuiyêñ enfala bêzar û tiragîdiya Helebce li Şamê pêşwazî kiriye.

Destlata Sûriyê ne tenê van cersiyan dike, lê wek hin ragiyandinêñ rojane, makdarêñ fermî li İraqê diçespînin, ku bi hezaran têrorist ji pir welatêñ cuda dikevin Sûriyê û li wir di bin serpereshtiya karbidestêñ Sûriyê de fêrî karêñ têrorê û serjékirinêñ mirovan dibin,û di pisht re, ewanan bi alîkariya dewleta Sûriyê derbazî bajarêñ İraqê dibin, li wir karêñ hovane li dijî bê gunehkaran û destlata İraqê dikin, û gulan bi ser

têkoşerên azadiyê de dîbarînin..

Em dîsan vegezin ser helwesta Sûriyê li hundir Sûriyê çawa didome?

Wek em zanin, hukumeta katî li Îraqê bi serokatiya Dr. ïyad El- elawî, û serok komar, Şêx Xazî Al-yawer hate dest nîşan kirin, destura Îraqa nû jî hatin terxandin û di vê destura nû de, biryara pêkanîna fêdraliyê li Îraqê hate çespandin.

Ev biryara rewa dermafê gelê Kurd de, çavên karbidestê Sûriyê her pirtir sor û sermest kirin, lewre jî, hikûmeta Sûriyê bê şermî, helwesta xwe a neyêni û regezperestî derbarê fêderaliyê derbirî û eşkere gote Kurdan û cîhanê, “Fêderali ji me re xêza sor e “.

Bi ser vê de jî, bi fermana destlatdara Sûriyê, dezgâyê ewlekariyê dest bi hurhitandinê netewayetî kirin, û bi riyêni nijadperestê Ereb, di 12 avdara 2004 an de, hêrişek dirinde û ne mirovane li dijî lîstikvan û temâsevanê topê (Topa lingan) li gorepana yarî li Qamuşlo, pêk anîn .Di encamê de bi dehan birîndar bûn û gelek hatin şehîd kirin.

Lê gelê Kurd li hemî navçeyen Kurd, Efrînê, Kobaniyê û bajaren Sûriyê wek, Şamê, Heleb li hember hêrişen şovînistan bêdeng ne man, bi hezaran kurd li van hêmî deveran, piştvanîyen xwe bi aştiyane ji gelê xwe re xûya kirin, lê mixabin, peyayêñ karbidestê Sûriyê li van bajaran jî bi gule û qurşînan li hember Kurdan rawestiyan.

Li dawiya van berxwedanêñ rewa, li gor çavkaniyêñ partiyêñ tevgera kurdî li Sûriyê 28 kurd pakrewan bûn, di nav wan de, 7 kurd bi eşkencê şehîd bûn, û nizflî du hezar Kurd hatin zîndan kirin .lê piştî maweyekê hemî girtî ji bilî 200 î, hatin serbest kirin.

Lê partiya Bees dixwaze xwe ji van bûyer û destêwerdanêñ cehirkirî bê guneh derxîne, hemî berpirsiyârên ewlekariyê, yên destêñ xwe, raste rast di van pîlanêñ şovêñ de hebûn, ji aliyê dewletê de, nehatin tawan kirin.

Tevgera gelê Kurd ji astengêñ weha re ne amede bû, lew re jî, ewê nikanî, wek ji wê dihat xwestin, bersiva dewletê bida.

Em kanin bêjin, bizava kurdî ta radeyekê ne hêşt ango rê neda, ku raperîna gelê kurd berdewam be.

Nûnerêñ dewletê bi gelek berpirsiyârên tevgera kurdî re civîn çê kirin, û ji wan yekser xwastin, ku ewanan lehiya serhildanê rawestînin, lew re jî,

wê pir berdewam ne kir.

li vir pir pirsên giring û balkêş xwe derdixin holê, çima pir pêşengêñ bizava kurdî bi nûnerêñ dewletê re rûniştin ?Kê di van rûniştinan de, an di van bazarêñ siyasî de ,pirtir sud ji xwe re wergiert?

Tevgera Kurd di vê bazara siyasî de ci qezenc kir?

Di nirîna me de, tevgera kurd xwe di van helwestan de
şâş kir, ewê bejn û kanînêñ xwe, yên jar û lawaz ji

gelê xwe û ji dewleta kevneperek re pir bi zelaî da xûya kirin.

Piştî van hemî hevdîtinan, dewletê baş giraniya tevgera kurdî têgihîş, lew re jî, ewê bang li Kurdan kir, û gote wan; me ta niha çavêñ xwe li we digirtin, lê divê hun xebatêñ xwe ên partîñ rawestînin...

Dengvedana vê fermaña ne dêmokrat li Rojavayê Kurdistanê bi neyiniyeke bilind hate nirxandin, gelê Kurd niha xwe gelek bextewar dibîne, ku tevgera Kurd ev daxwaza hukumetê pêk ne anî!!!!!!!.

Wek mînak, serokê partiya yekitiya dêmokrata Kurd li Sûriyê, birêz Îsmail Omer bersiva dewleta Esedê duhem weha daye”...Me ji rîcîmê destur nestandiye, ku em bi biryara wê jî, xebatêñ xwe rawestînin....divê hêzên ewlekariyê destêñ xwe ji hemî movikêñ jiyana hemwelatiyêñ Sûriyê vekşînin” Partî, çapemenî, serbixweyêñ niştimanperwer li hundir û li dervayê welêt bi kîmasî, tawanêñ rîcîma Bees li dijî Kurd û dêmokratêñ Sûriyê şermezar kirin.

.....

Serokê dewleta Sûriyê ji ber hin sersedemêñ siyasî, tektîkî ên giring,di 1. Gulana 2004 an de, di kanala El-cezîrê de, hebûna gelê kurd li Sûriyê da nas kir û ragiyand;” Netewa Kurd beşek ji civaka Sûriyê a bingehîn e..” Dîsan tevgera Kurd, hemî welatparêzêñ Kurd bi vê daxûyana serok komarî dilshad bûn, bi çavêñ bilind û nirxbuha li helwesta El-esedê duhem temaşe kirin, pir partî û kesayetiyan bawer kirin, ku serokê Sûriyê dixwaze hêdî, hêdî, hebûna miletê Kurd wek neteweke serbixwe bipejrîne.. Ji ber vê jî, me dît hemû partiyêñ Kurd, gotinêñ serokê Sûriyê di rojnamêñ xwe de dubare kirin û dilxweşiyêñ xwe ji nirîna El-esed re diyar kirin .

Lê, wek Ereb bi xwe dibêjin:“Benê(werîsê) derewînan kurt e“, roj derbas

nebûn, pir siyasetmedarên Kurd û Ereb baş dîtin, ku çawa serokê Sûriyê peyvên xwe erzan berdaye holê, an sozên wî, bêbinax û damar in, çimkî ewî di alîyekî de, li pêş raya giştî, sozên xweguhartinê siyasî li hundir Sûriyê dide cîhanê û gelên Sûriyê, û li aliyê din jî, siyasetmedar, gelparêzên Kurd û Ereb digre û dixe zîndanan. Bi kurtebirî, ev dijberiyêñ zor ronak, nîşanên ne pêbaweriyê peyv û sozên El-esed in .Wek me berê jî nivîsî bû, hukmeta Sûriyê ji destkewtên Îraqê û Kurdistanê pir bêzar bû ye, ewa bi hemu awayan, helwestên xwe, ên şoven li dijî gelê Kurd bigîstî derbirî.

Tê zanîn, hukumeta Îraqa nû, ya katî biryara hilbijartînê deranî, û ewê hevpeyman bi “komîta netewên yekbûyî re “û bi hemu dewletên, ku di nav wan de, hemwalatiyêñ Îraqê dijîn, çê kirin.

Li gor van hevpeymanan, pêwîst bû, ku evan dewletan birêveçûna hilbijartînê, di hundir welatên xwe de hêsanîr bikin û ti dijwariyan li pêş wan hemwelatiyêñ Îraqî durust nekin. Lî van hemî dewletan ji bilî Sûriyê, hevpeyman bi cih anîn û wek hin çavkaniyêñ Îraqê rageyandin, ku nîzîkî 250 hezar hemwelatiyêñ Îraqê li Sûriyê dijîn, û piraniyêñ wan jî Kurd in.

Karbîdestêñ Sûriy rê nedan kurdêñ Îraqê, ku ewanan zimanê kurdî di hilbijartînê de, bi kar bînin, bi ser da jî biryara xwe, a ne rewa li ser rîexistina penaberêñ navnetewî ferz kirin û di encamê de, kurdêñ Îraqê nikanî bûn fitik û belavokêñ xwe bi zimanê kurdî binivîsînin û wan belav bikin.

Di baweriya me de, hukumeta Sûriyê ji ber du sedemên sereke nehişt, ku Kurd zimanê xwe bi kar hînin.

1-Ewê dixwast hebûna zimanê kurdî wek zimanekî serbixwe bi gelê Ereb li Sûriyê nede nasîn, ta ku, derewên wê di tunekirina zimanê kurdî de, wek zimanekî serbixwe li pêş Erebêñ Sûriyê eşkere nebin.

2-Ta ku Kurdêñ Îraqê di warê derûnî de birîn bibin, wireyêñ wan nizim bibin, paşê, ewanan nikanibin Kurdan hilbijêrin û dengêñ xwe bidin “ Hevpeymana dêmokrata Kurdistanê”, ji ber ku, tirsa wan ew bû jî, ku hejmara perlemîntarêñ Kurd di encumena Îraqê de pir bin, û di avakirina Îraqa fêderal de rolêñ bala bilîzin.

Dêmek em dibînin çawa partiya Bees li Sûriyê û di bin sîbera B.El-esed jî şovînîstiya xwe berdewam dike, û ew ne tenê şerê bizava me li Sûriyê dike, lê belê hîn bi serda jî, li dijî tevgera kurdî a azadîxwaz li besên din dike, û ewa neyartiya xwe li dijî tevgera dêmokratiyê pir bi zelalî sercil dike. Li hember van helwestên Sûriyê, Emêrîka, yekitiya ewropî, hêzên dêmokrat û azadîxwaz, û rôexistinê mafêñ mirovan bê deng namînin, tevî ku dengêñ hemûyan ne bi qaserî hev bilind dibin, lê yê herî bilind, dengê Emêrîka ye, ewa vekirî gefgurên xwe arastî Sûriyê dike, û bi hin hêzên opozîtiyon re li Emêrîka û li Ewropa dicive û ewanan dixwazin bi hev re hukumeta Bees birûxînin .

Li aliyê din, dezgehêñ civaka bajarvaniyê û hêzên tevgera kurdî, kesayetyîn dêmokratêñ Ereb, bi riyêñ ragiyandinêñ xwe, bi riyêñ xwepêşandinêñ xwe, li Şamê kêm an zêde têdikoşin.

Li hêla sêhem, endamên yekitiya welatêñ ewropî jî bi dengêñ pir nizim bala hukumeta Sûriyê dikşînin ser rewşa hundir û pirsa dêmokratiyê li Sûriyê, û ji ber ku, helwesta Sûriyê li beramberî dêmokratiyê neyinî ye, ew naxwazin bi Sûriyê re pir bazarganiya aborî bikin.

Piştî xwendina me bi hurgilî ji rewşa Sûriyê a hindir û siyaseta wê a dervayî re, em digînin vê baweriyyê, ku destlata Sûriyê hesabê hêzên dêmokrat û gelê Kurd pir nake. Bizava dêmokrat û azadîxwaz heye, lê ew berxwedaneke jar û pir bi tirs dike. Tirsa destlata Sûriyê a herî mezin ji Emêrîka ye wek nimûne, Emêrîka ji hukumeta Sûriyê xwest, ku ew leşgerên xwe ji Lubnanê bi zutirîn kat vekşîne, ewê bi rastî bê dilê xwe, piştî ku derdora 25 an di hundirê Libnanê de cihwar bû bûn, leşgerên xwe ji Lubnanê di meha gulana, 2005 an de vekşandin.

Li alîyekî din jî, hukumeta Sûriyê sozek daye gelê kurd, ku ew dê nasnamên Sûriyê li hemwelatiyaen Kurd, ên bênasname vegerîne lê ta niha jî, ti agadarî li ser pêkanîna vê sozê jî, tunenin..

Di rastiyê de, lingêñ serdarêñ partiya Bees pir li ber hev ketine, ew nizanîn dê çi bikin! Lewra jî, siyaseta wan niha pir tewşankî ye, wan ji cîhanê re, li dahol û zurnê xistin û gotin; emê kongira xwe a dehan girêdin, û emê di wir de pir guhertinan çê kin û biryarêñ nû derxînin..

Di dema ku, gelên Sûriyê çaweriya gavavêtinêñ erêni ji partiya Bees bi serokatiya Dr. Beşar El-esed dikrin, hukumetê şêweyekî nû bo

dijmanhiya gelê kurd afrand, ewê dest bi revandina kesayetiyên welatparêz û nasdar kir.

Di 10ê gulanê, 2005 an de, hukumetê bi alîkariyadestê hin tawanbar û têrorîst Dr. Şêx Muhemed Meşoq Elxiznewî revand, ew bi lêdan û îşkence kuştin, û di 1.6.2005an de destlata El-esed kuştina wî ragiyand. Gelê Kurd pir bi xemgînî termê Şêxê dêmokrat, oldarê pêşverû, û welatparêz pêşwazî kir, nîzîkî sed Hezar Kurd bi termê pakrewanê peyva dadmendiyê re rêketin, û helwesta xwe li dijî vî karê têrorî derbirîn û daxwaza çareserkirina kêşa miletê Kurd li Sûriyê kirin.

Di 4.hizêranê, sala 2005 an de, partiya Bees kongira xwe a dehan li Şamê bi serdariya B. Elesed dest pê kir, bi vê bûneyê, partiya azadiya Kurd bi seroketiya Xêr-eldîn Murad û partiya yekitiya Kurd li Sûriyê bi serokatiya Hesen Salih di roja 5.6.2005 an de, xwepêşandanekê mezin li Qamuşliyê rêxistin, dîsan bi deh hezaran Kurd tevli vê xwepêşandanê jî bûn, ewan karên têrorîstiyê li dijî Kurdan û dêmokratîwazan tawan bar kirin, û daxwaza bi cihanîna mafêن netewî yêن gelê kurd ji kongira Bees kirin. Serokê partiya azadiya kurd li Sûriyê Xêr eldîn Murad, derbare sedema vê xwepêşandnê de nivîsiye: "Armanca me ji vêxwepêşandinê ev e, ku em nameyekê ji kongira partiya Bees re bişînin, ta ku ew jî rewşa gelê Kurd li Sûriyê serrast bikin, êş û azerên gelê kurd bi dawî bînin.

Lê, mixabin dewleta Sûriyê hîn rojekê berî xwepêşandanê, ango di 4.06.2005 an de bi sedan Ereb û serok êlên Ereban di bin navê "kongira hevpeyvînêni niştimanî" "de civandin û xwe li dijî xwepêşandana Kurdan amede kirin.

Di rastiyê de, di roja xwepêşandanê de dezgehêne ewlekariyê ji aliyekî ve 60 xwendevan û hemwelatiyêni Kurd girtin û pir kes ji xwepêşandanen birîndarkirin.

Li aliyekî din jî, bi rêdana hukumetê, Erebêni "kongira hevpeymanêni niştimanî" "dîkanêni Kurdan li bazarê talan kirin, bi melyonan pere ji wir dizin û zîyan gihadîn runiştvanêni Kurdan li Qamuşloyê.

Lê pêwîst e em vê rastiyê jî ji bîr nekin û helwesta beşê mezin ji tevgera Kurd "Hevbenda dêmokrata Kurd", û "Eniya dêmokrata Kurd" ji vê berxwedana Kurd bidin diyar kirin, ewan piştvaniya xwepêşandana 5 ê hizêranê li Qamuşliyê ne kirin, wan sedemên helwesten xwe bi vî

rengî di daxûyaniyekê de ronî kirin, û nivisîn: "...Xwepêşandanê parolên ne berpirsiyarane hilda bûn, ew şaş bûn û ziyanê digînîn berjewendiyên gelê Kurd û yekitiya niştimanî..." lê partiya yekitiya dêmkrata Kurd di rapora xwe a siyasî de weha nivisiye: "Xwepêşandanê nirx ne daye rewşa vê demê, ewê ji hukumetê re sedem çê kirin, ku ew bi xeraptirîn û hovtirîn şewe hêrişî Kurdan bike....û pir mixabin piştî vê xwepêşandanê hin rêxistinên opozîtisiyon û komîten mafêni mirovan jî helwesten xwe derbarê gelê Kurd bi neyinî derbirîn.

Ev tê vê wateyê, ku tevgera me hîn li ser xwepêşandanen jî nabin yek, û ewanan nikanin bi hev re dengen xwe li dijî şovînistên Sûriyê bilind bikin..

Lê bi ya me be, evê xwepêşandanê di nav gel û azadîxwazan de, baş deng veda, bi hezaran Kurd li hundir welêt û li dervayê welêt rezamendiyên xwe ji vê berxwedanê re dan xûya kirin û gelek ji wan bi dengen bilind dipirsin, ma kînga "Hevbendî" û "Eniya dêmokrat" "dixwazin xwepêşandanen li bajarên Kurdan bikin ?

Ü kînga li gor pîvanen wan, rewş li Sûriyê lêhatî û alîkar dibe ?

Lê em jî, di vê baweriye de ne, ku niha rewş ji berê alîkartir e, pêwîste hemî hêzên Kurd û Ereb jî, vê rewşê biçespînin, û bi aştiyane têbikoşin. Erê hemê dêmokratîxwaz û azadîxwaz zanin, ku berdêla azadiyê, dêmokrîtye qurban û pakrewan in jî, ewanan tevgera xwe dixemilînin, û riya azadiyê kintir dikin û rûpelên dîrokê ji van nimûnen kêrhatî tijî û dagirtî ne .

Kongira Bees herdu guhêni xwe li bang û nama gelê Kurd girtin, çimkî ewê, wek me li jor anî zimên, pêşda bersivên xwe, bi riya dezgehêni ewlekariyê li navçeyê amede kirî ye ..

Kongira Bees ya dehan di 9.06.2005 an de bi hilbijartina komîteke navbendî e nû, kuta bû, ewê hin berpirsiyrênil bilind ji destlatê bi formal, bi dûrxistin, lê kongirê nikanî bû pirsên bingehîn û gring di bernamê de biguhartana, wek nimûne, kongira "Bees" li ser xala 8 an di desturê de ranewestiya ye û ew weke berê di cihê xwe de ma, partiya Bees hîn dibêje ;Partiya Bees pêşenga dewletê û civakê ye .

Herweha jî, kongirê nexwast yasaya awerte ji desturê rake 3-kongirê li ser rîdana xebatên partiyen Sûriyê rawestiya, lê dîsan


biryara wan ,partiyê kurdî an partiyê olî naçerciwîne.

4-kongirê hebûna gelê Kurd,wek neteweke serbixwe li Sûriyê nepejrand .Bi kurtî, kongirê tishtekî nû ne anije zimên,guhartinê kesayetyîn berpirsiyar ne giring û nirxbuha ne, ya ji van pir giringtir û balkêştir, guhartinê siyasî,aborî, doza dêmokratiyê û azadiyê ne.

Em dixwazin axiftinê xwe li ser kongotina serokê rêexistinê Ereban, yên mafêni mirovan Dr. Heysem Menah dawî bînin, ewî di kenala Dubay de goti bû"DI DEMA BALAFIRAN DE KONGIRA BEES LI KERÊSÎWAR DIBE.."Em jî li vir mafê didin xwe, ku vepirsînê vekirî arastî bizava dêmokratîxwaza Sûriyê û tevgera azadîxwaza Kurd bikin, **KANÎ EW DI DEMA BALAFIRAN DE LI ÇI SIWAR BÛNE???**

Dumahîk heye

23.06.2005



1915

Pir RUSTEM
pirustem@scs-net.org

1915-Du caran yek. Her carekê bi navê Yezdanê dilovan.

Sê caran susê, carekê bi hersê pirtûkan, cara din bi hersê pêximberan û cara paşin bi navê hersê miletan. Lê di dawiyê de pênc in. Qalûç e di destê xwedê de, li ber zeviyê zer sekinî ye, bi her avêtinekê re pêncî serî difirin û careke din xak di xwînê de tê gevizandin.

1915 – Dîrokeke reş e, mîna riwê Xweda. Sala şermiyê ye di eniya babilîska bîstan de, ji sala 1988-an re xwîşka mezin e.

Li evê derê em du caran, di navbera heft û nehan de, di bin sîka hersê sêyan û yekî din de, hatine şewtandin.

Di roja ku bi nav gund ket, di ro- nîvro de, seg nêwîn. “Ev yeka ji nîşanên roja heser-meşerê ne”, kalemêran holê gotin. Piştî ku çend malên pêşî birî bûn, di gedûka mala me de ket. Şeş roj û heft şevan ji xewa giran şiyar ne bû. Di sê rojên pêşî de kes ji gundiyêne me ne ma bû,

ku tiliya xwe di meselê ve nekiri bû, lê bê sûd e. Ew ji xew-xewa tirs û kuştinê şiyar ne dibû. Di dawiyê de, pîrka gund fermaña jêgera wî da û got: “Eger ev heft çilpikên xwînê yên di sipîka çavêñ wî de ziwa nebin, ewê ji xewa mirinê şiyar nebe.”

Heft – heft pirtûk, heft qatêñ ezmêñ, heft pirtûkêñ quranê, tev şeşen şewitandî. Osmêñ fermaña kuştina wan da bû. Heft rojêñ heftiyê, û heftiya mirinê. “Bi heftê û heft xweda û bi pisîka bi heft cana eger ev heft çilpikên xwînê ziwa nebin, ewê şiyar nebe”. Ev e gotina pîrka gund, û tev dizanin ku gotinêñ wê ji yên Xwedê ne; cihê pîroziyê ne.

Piştî “şes rojan û heft şevan” ew şiyar dibe. Xwe di nav komeke jin û mîr de dibîne. “Rih bûye bost lê dijminê nebe dost”. Li derdora xwe dizivire. Heft çilpikên xwînê di nîvê odê de ji çavan diweşin, û heft termêñ zarokêñ serjêkirî şîn dibin.

Di wê şevê de civakeke fereh li odê digere, heyâ dengê mele û dîkan jî nikarin ewê civakê ji hev bêxin. Rê û rêçik pir bûn, dîroka herêmê tev hate hilweşandin û tevdan. Lê mêvanê me bê deng dima. Kesêñ rûniştî çend caran xwestin wî ber xwe ve bikşînin, lê destvala vedigerîn. Gava wan bawer kir ku rûniştina wan bê kîr borî bû, ref bi ref belav bûn. Min jî xwe di kunceke odê de lûs kiri bû; ez bi çavêñ mêvanê me diramîm ku çawa yek kare çavêñ xwe kesk bike, cara din şîn û carina jî reş, û di navbera her çendekê de kevokekê jê bifirîne.

Dema nîvro ji xew şiyar bûm, min mêvanê xewar li mal ne dît. Çend caran ji diya xwe pîrsîm, lê wê bi kurtî li min vedigerand: “Mêvanek bû û çû gundê xwe”. Evê bersivê ez têr ne dikirim. Mêvanek şes rojan raze, û di roja heftan de winda bibe!

Bîst û yek sal di ser hatin û çûyîna mêvanê me ê xewar re diçin; ew ji bîr dibe, lê carina mîna çîroka Erebê tirkirî gundiyan ew mêvan û xewa wî dianîn zimên, nemaze di demêñ ku yek daketa kaniya jêrî gund û xeleka wan heft darêñ ku bi destê wî hati bûn çandin bidita. “Sed rihme li tirba Agob be, ev bû çend bav û bav li vî gundi çûn û hatin, lê kesî ji me bîr ne dibir ku rojekê şiqinekî(???) bîne û li vir biçîne. Em miletekî ziwa ne”, gundiyan lome ji hev dikirin, xasma di demêñ ku li ser kaniyê, di nav sîka heft darêñ Çinarê de, yên ku kesî nizanî bû Agob ji ku anîn û

li vir çandin, rûdiniştin.

Di dû van salên dûdirêj de, ezê pir tiştan ji zarokiya xwe winda bikim. Yek jê çiroka Agob, lê di rojeke sar de, ku heft şurik bûne yek, emê li hev rast bêñ. Hingê min xwendina rojnemevaniyê kuta kiri bû û li Cinêvê bi cih bû bûm. Di sibeyeke Zivistanê de, berî ku ji mal derkevin, zengilê telefonê lê da. Gava min xist ber guhê xwe, li aliyê din dengê hevala min a rojnamê hat. Bi kurtî û bi dengekî tijî hêşir got ku hevalekî me yê rojnamê bi destê Mîtê Tirkan hate kuştin.

Bi destekî sar û dilekî kizirî min telêfon girt û bêyî ku qehwa sibê vexwim, min cixareyek xitse nav lêvan û derketim goristana ku ji min re bi nav kiri bû. Bi rê ve pir wêne û bîranîn di ber çavêن min re borîn, nemaze karêñ ku wî di ber Kurdan de dikir, û tazîkirina wî ji hovîtiya ceneralên Tirkan re. Pişti ku ez gîhîstîm ber deriyê goristanê, min bîr bir ku min soza veşartin û amedeya ser gorê ne birî û rê nema bû ku careke din telefonê jê re vekim û zani bim ewê ji kîjan kenişte bi derkevin, ji lewre divya bû li benda wan bimînim.

Di kêliya ku min xwest ez herim di teksiyê de rûnim, çavêن min bi wî ketin – kalemerekî heftê salî li ber her gorekê disekine û gulên wê av dide. Tîpê mirovê rojhilat xûya ye. Dema wî li min nîhirî du çemên xwînê herikîn, hêşt ku destê xwe jê re hilînim, ew berkenî bû, ber bi min ve hat û deriyê goristanê li ber min vekir.

– “Mîrin tehl e, lê divê yek wê nas bike, da ku zani be jiyan çiqasî jehr e”, Ji kûraniyeke bêbinî gotinê wî der diketin. “Tu karî qurnefilekê ji wê derê jêki”, gava dît ku ez dest vala hatime tiliya xwe ber bi hevzoyê qurnefilan ve dirêj kir û gote min.

– “Te sipas dikim, derketina bi lez û ev nûçeya ji nişkêve hêşt ku ez xwe ji bîr bikim”, min xwest ez hatina xwe a bê gurzê gulan ji xwe û wî re bincil bikim.

– Şîna dawî be, lawê min

– Ne bawer im.

– “Ka em herin hundir”. Kuştina mirovekî di bajarekî Ewropa de hêşti bû yek bibehte.

– “Tu bi tena xwe dijî”. Ev tiştekî pir normal bû, lê min xwest ku ez ji nuh ve deziyê axaftinê bikşînim. Pirsa min refek hecîleklekan ji çavên wî firandin, nemaze pişti ku nas kir hatina min a vê derê ji bo ci ye.

– “Ev bû bîst û yek sal û heft meh kêm sê roj ku ez bi tena xwe dîjmîm.” Vê dîroka hûr bi min da nas kirin ku çirokeke dûdirêj li pey wî heye.

– Xûya ye ku tu ne Siwêsrî yî.

– Tu jî wekî min î. Nayê veşartin, em çiqas jî kurkên wan li xwe bipêçin, nirîneke hûr li çavên yekî ji me, tu yê nas bikî ka tîna rojhilat di dilê wî de dikele lê na. Berî ew rûne ber bi kunceke odê ve çû, du piyalên meyvexwarinê anîn. “Di rojeke mîna îro de du tişt bi kêrî mirov tênen: pîrek û enbît”, bi gotinê re wî piyalek danî ber min.

– “Hejmartina rojan jiyanek tehl e”. Qurta enbîtê gewriya min kizirand.

“Eger mirov lawê miletekî be, ku melyon û nîvekî di navbera roj û şevezekê de winda bike, ewê li benda rojekê be û teneyên tizbiya dîrokê bijmîre. Lê mixabin xûya ye temenekî bi tenê ne besî yekî ye, ku bigihe wê rojê”. Piyala enbîtê ji ser lêvan vala vedigere. “Mirovê Ermêni ji bo tiştakî tenê dijî: ji bo ku bîraniya wî neyê ziwa kirin”.

Piştî demekê ji bêdengiyê û çend piyalên enbîtê, wî dest avête hundirê sandoqekê û soleke zarokan danî ber min. “Salêñ wê di salêñ koçkirina miletekî de ye. Tu dizanî ku êşa miletekî nîşan dide? Ev teka sola zarê min ê herî biçûk e, ew mîrasê min ê bi tenê ye, ku li şûna malbata min ma ye. Ji berî ku meleyên wan bang bikin ew keti bûn gund û xwestin ji berî ku ronahî belav dibe em ji gund der kevin. Kesî ne dizanî ewê berê me bidine ku derê. Heft zarêñ min hebûn, lê îro solek! Me gote wan ku sultan bavê me ye û stûyê me jê re koprî ye, lê gotina me bê kêr bû. Bi rê ve çend siwar rastî me hatin û pîreka min birin; ez û heft zarokan sêwî hêştin, lê piştî çend gavan û giriyê pîrekê vegerîn û zarê ku sola xwe ji min re hêştiye birin. Wilo çêtir bû, wan ne xwest ku ez barê xwîn û kuştina wan jî hilgirim; hinekî xaçê min sivik kirin. Bi rê ve zikê şes zarêñ min ên ma bûn qelaştin, lê zêr di zikêñ wan de ne diditîn. Her ku min digote wan zêr di zikê min de hene, ew dikenîyan û digotin hûn Ermêni pêlewan in, tu wilo nakî. Eger zêr hebin wê di zikê van zaroyan de bin, û kêrêñ xwe dişandin nav rovikêñ wan. Min heyâ bi demekê fêm ne kir çîma ez ne kuştîm, lê gava ez bi xwe re birim (Van)-ê û destêñ min xistin xelekêñ zincîrê, ya ku heyâ bi (Bon)-ê diçe, min nuh fêm kir ku em


êzingên dojeha wan in. Bîst û yek sal û heft zaro kêm sê milet kî dizane ew çî ye? "Belê... dîroka solekê ye". Gotina wî bi girî û lerzîna laş diçe serî.

Minêbihêsta ku ew devê kanî û şikeftan, yên ku bi çemento girtine, hilweşîne û mar-dûpişkan ji sîngê xwe birevîne. Lê dîtina wan çilpikan, yên ku yeko-yeko ji sola di nav tiliyan de dadirivîn ser sînga wî, hêşt ku ez ber bi wî ve herim... û herim, bêyî ku kari bim gava di nav me de bibirim û bigihêm wî.

Ez ji odê derketim. Sibeyeke sar e.

Di welatekî bê xem û solêñ birîndar de ka mirovekî kuştî, mirovekî tazî û xewnwindakirî dê çi bike, ji bilî ku li benda rojekê bimîne. Bîst û yek sal, ji berî vê dîrokê ez hîne zarok bûm; di şeveke sar de, mîna îro, ez di kunceke puxarê de rûnişti bûm û min li çavêñ mîvanê me dinihirî. Belkî ev bû!





Dilê te bideman bû, hatibûyî ku ji pismamê dilê xwe xatir bixwazî. Tu nû pê hesiyabûyî ku dê mîvan here. Lewma te agirê çemberê pêxisti bû û bi bayê bazdanê derketibûyî ji bo pêşwazîkirina wî, li sehaya futbolê, bi navê dîtina dawî, di navbera nîv demjimêrî de-hê porê te şil bûn, di bin ronahiya hîvê de çavêن te diçirisîyan-tu bi xwe jî tê nedigihîştî ka çima ewqas dilşa û rûgeş bûyî (çûyîn hebû û dilê te biçoş, rûyê te biken bû)

Ev dîtina ku di bin tavehîvê de bi we her du kesan, li wê qada tenışta xwaringehê, piştî wê rûdana bajarê jor ê nav gelî bi çar demjimêran û li bendêmayîna ber darsobeya kêlek avahiya nîvco pêk dihat, ji bo te him duriyan û him jî çatariya jiyanê bû: Ew lerza ku hestiyên te ber bi qefilandinê ve dibir, ji ber vê egerê bû.

Dengê te bilerz bû, çokêن te bilerz bûn, gavêن ku di nav peroşmendiya bêrave de diavêtin jî, bilerz bûn. Lewma te kulmên xwe dışidandin, diranên xwe bi ser hev de dikepisandin û gotinên xwe li kurtebiriyyê dixistin.

Hate bîra te, beriya çend xulekan bi çavêن te ketibû, agirê ku te pêxistibû jî wisa bilerz bû. Ji kû derê rû dabû te jî nedizanî-tenê li xwe heyf dianî-heçku çokên te nelerze, dê ew agir jî nelerize. Ew pêwendî ji kû derê bi te rê çêbi bû, te bi xwe jî nizani bû.

Tenê tiştek bi te dihate zanîn, ew jî hesta tewanbariyê bû; ji serê lingan heya serê müyên porêن xwe bi vê hestê dierçiqiyayî.

Di hundir de, di hundirê mala ji te bi sed gavan dûr de, pêtên agir dileriziyan: Te di livandin, tevgerîn û libatêن xwe de bergiriyêن xwe digirtin!

Ew diaxiviya û çi di tûrikê wî de hebû, bi hewldana valakirinê berpêşê te dikir, li ber çavêن te ên kûr û çalekortî. Wek çavêن te her derêن te dileriziyan ji sermayê. (ji sermayê?)

“Ma li te pir sar e?”

Bi şermînî bersîva te ji nav wan lêvên te ên zîvalî derketi bûn:

“Sar e, lê nabe pirsgirêk!”

Te li xwe mukir nedianî, ema hesta vê sarbûnê te ji berê de dizani bû, ji wan salêن zarokiyê, ew raboriya dûr, ya ku bi giraniya xwe namilan ditewînin, patikan kûrmî dikin, ya ku di her bîranînê de hemû laşê te bi ser hev û dî ve dierçiqand, diperçiqand û diguvaşt.

Te dizanî, sarbûn tenêti bû, tenêtiya di nav hezaran kesan de bû, ya nayê rakirin û hilgirtin, ya ku birîndarker bû.

Û her ku tu bi tenê dimayî, bi erçiqandin û perçiqandina bêpênase ve li kêlek hev dimayîn, tu ewqas birîndar û parce dibûyî. Laşê te qul û qul, kun û kun dibû; weke moxil û bêjingan.

Bi tenê mayîn parçebûn bû, tu her roj bi tenê dimayî.

Êdî tu hati bûyî rewşeke wisa ku te di rojaneya xwe de, ji bo tenêtiya xwe dinivîsand û digot, “Yekane ye, hevala min, ya ku li min xiyanetê nake” Ewqas ku tu dilsozê tenêtiya xwe bûyî. Te jê hez dikir. Ya jî te wisa hîzir dikir ku tu jê hez dikî. Hebûn û nebûna te ew bû. kesî tiştek nedabû te, lê di dawiyê de te ji xwe re hevaled peyda kiri bû.

Dayika te ji te dûr di nav mij û morana cîhaneke din de, di hundirê westandineka ku bi te çi wate pê nedihate dayîn de, bi dirûveke çilmisi, bi derbirîneke wek her dem û bi çavêن zenûn di hundirê kêrsimandina hiş de peyda dibû û wisa bi te dihat ku hetanî ciyayê Qaf ji te dûr e. Te jî dizanî hezkirineke karibe bide te pê re tune bû. Ger hebaya jî mecal û

derfetên wê yên dayînê tune bûn. Ji te re tenê û tenê ew para vegetandî, ya hatî terxandin a çarenûsa diyar dima. Beş û pişka te ev bû: Jê nehatî hezkirin!

(Wê demê haya te jê tunebû, lê pişt re dê tu pê bihesiyayî ku büye hesta te ya mayînde)

Bi vê jî nediqediya, di ser de jî gava ku ew dîmen û xwiyangên li ber çavêن te cardin cardin xwe vedijinandin, hemû raçavkên laş û bedena te ya nazenîn bi ser hev de dihate kişandin û bi te qasên dojehî didane jiyandin, li ser navê bêeleqedariyê û jixwe kesekî/e bi te nîşan bide tune bû, ji bili xwîşka te a mezin, ya ku di hewla ezmûneyên curbecur hetikandinê de baş niqokar bû.

Di her carê de te lê dinêrî û bi wan çavêن te ên kortikî dihate dîtin ku ciyek vala, kêm û noksan dimîne û bi tu cureyî şûna pêşîr û paşila dayikê nagire.

Jiyana te ya pêmenê gelek tiştan dihişt ku tu zûtirîn bi rastînê sext û tund yên jiyanê û yên xwe re nasdar bibî û bi tûjbûn û dijwariya wan re rû bi rû bimînî.

(Ew agirê ku te pêxisti bû, car carna weke beledan di ber çavêن te de zindî dibû û hebûnê bi te dida hesandin, ema ev yek çend xulek derbas nedikir.)

Ü her ku tu bi wan rastiyân nasdar dibûyî, te didît û pê derdixist ku di hundir de bi wê zarokiya xwe ya ku bêderfet maye parça parça dibûyî, di cî de dihatî rewşa moxil û bêjingê, li derive jî ew kesaniya ku ji jiyê te mezintir bû, bedena te a lewaz, qels û nazenîn a ne zêde bejinkurtik, di bin giraniya xwe de bi erdê ve ditepişand û êş û jana nayê hedarkirin pê dida kişandin.

Rengê serbazekî ku ji sê şeran bi binketin derketiye li te diket.

Lewma te jiyan tim wekî berbereki ku divê şer li hember bê vedan didît. (berberiya ku tim tu bi bin dixisti) Civak jî jixwe tim û tim asteng datanîne pêş te. Heta astengkarê pêşketina te bû û-bi gora hizra tene dihişt ku tu nefes bistînî û bidî.

Baş e kê asteng datanîne pêş te? (te bi xwe jî nizani bû) Lê bi ya te her kes astengkar bû ji bo te. Lewma te dikir û nedikir li ba te hezkirina mirovan pêk nedihat. Ji ber vê yekê dijmin û neyarêن te bûn, ji ber vê yekê berber û rikeberêن te bûn, raqîb û dijberêن te bûn.

Ew şerênu di nav bêdengiya kûr de te li dar dixistin li hember wan kesên dexesdarêne te, di jiyêne te ên piçûk de rû dabûn û her ku te jiyeck diavêt ser wê rêza temenê xwe, ew şer jî ast û radeya xwe a dijwariyê girtirîn dikirin.

Toq li serê hevalêne te nemabûn, tev bi destêne te-bidizîka-hati bûn şikênanîn. Hinekan bi ser xwe de ji nişka ve ava kelandî peyda dikirin, hinekan jî kezî û guliyêne xwe ên hatine birîn didîtin li ber çôkêne xwe û di nava qajewajan de beref diya xwe direviyan. Di her neqlê de li ciyêku te xwe veşarti bû ew çavêne te ên çalekortî bi xiniziyeke bêpênase û rave hawîrdorêne xwe dişopandin.

Tu tenê û bi tena xwe bûyî. Li hember te cîhanek hebû; hemû cîhanê berberiya te dikir.

Loma tu, bi gora xwe mezin bûyî (kesekî ku te ji xwe re model bigirta tunebû û peyda nedibû li ser rûyê erdê) lê bigorxweyiya te ji sînor û çembera ramanêneyî weke ku dernediket, ji ber ku li pêşberî xwe û di asoyê xwe de tu model nedidît, nikari bû hêza xwe berhev bike û xwe bike modeleke nû. Da ku tu bijî, diviyabû ku tu şer vedî. Şer vedan jî belavkirina hêzê bû. Komkirin û berhevkirina hêzêne agirbes bû. Tu, qasî ku bi berberiyêne xwe re karibî agirbesekî li dar bixî ne xwedî şîyanê bûyî. Ji ber wê yekê di temenê te de rawestgehêne agirbesê tunebûn. Te li kû dera xwe dinêrî, ya kozikêne parastinê bûn, ya jî sengerên êrîşê bûn. Bi te ne paşsînor ne jî piştceper peyda bûn.

Di bingeh de jiyana te raz û nepeniyek bû. Te bi xwe jî raboriya xwe nîzanibû ango weke taktîkekî şerê te ê bêdeng ji hêla te ve hati bû jibîrkirin. Tişten ku mabûn jî bibûn ber û kevirên tirsa te:

Di her qasa bibîrxistinê de tu direvandin û ji hêza dahûrî, têkilî û pêvendiyêne malbata ku tu jê hatibûyî dûr dixistin.

Raboriya te ne gencia te a veşarî, bibû tirsa te ya fişarî. Te, yek; ji însanan hez nedikir û dido; ji raboriya xwe!

Mamosteyêne te bi te re hetikî bûn, hevalêne te ên dibistanê jî, ji pey wergirtina êrîşen te ên hûrik xeriqîbûn. Piştî her êrîşa xwe bi heman derbirîna wan çavan dema tu derdiketî pêşberî malîyêne xwe, te, çav li wan dixistin peqpeqonk.

Tu tenê bûyî, bi tena serê xwe bûyî. Ji bo parvekirina tenêtiya te hebû û tunebû tenêtiya te bû. Weke di nav çoltariyê de dareke bi serê xwe, fiq

û tenê bûyî. Her şev û roj di paşila tenêtiyê de her ku tu dihatî parçekirin, tu bi xwe dihesiyayî ku di nav yê hatibû civanê te û bi te re dicû wî serê sehayê û dihat vî serê sehayê, qala hinek tiştan dikir. Lê guhên te ne lê bûn. Ema weke guhdarekê xwe raberkirinê de di ser te de kes tunebû.

Di nav meşê de, di bin elenda tavahîvê de her aliyê wî mêvanî hati bû venêrankirin ji layê te ve. Aliyên wî ên herî tarî û zelamat, bi te weke deverên xweşnas dihatin dîtinê. Mirov digot qey çavên kêtroşkan li ser te ne. Her ku te venêran dikir, di voltayê de hisek bi te re dihate çêkirin ku di şûnewar de nêzîk dibî: Ev li xweşiya te çûbû. Yek jî dîtina wî, bi te re volta avêtina wî... Ax kêfa herî xweş bû...

Dem û qasên herî zewqdar bûn, ku tu di nav ewqas mirovan de bi wî re, di rewşa voltayê de bûyî. Devê te ji kêf û eşqê digihîst ber guhên te.

Te tim bêriya wan rojan kiri bû. Xwesteka te a herî mezin ew bû; niha pêk hatibû.(Ma pêk hatibû?) Tiştekî kêm hebû, pirsên te kujoker û birîndarker bûn:

Ew kî bû ku ewqas sêkûçan li ser rûdêna te diqewimand?

Demjimêr ber bi derengiyê ve dawa xwe hildida. Axavtinên wî di guhên te de mîna rêzmoriyan bûn, te mest kiri bûn, nerm kiri bûn û ji halê berê derxisti bûn. Niha her tişt wekî awêneyekê bû; te lê dinêrî û her tiştên hundirê xwe bêkemâsi û xûmamî didît. Bi vî halê xwe ê niha Heyirî û şâşwaz mabûyî, ku di berê de mîna rûviya bêhna nêçîrê kiri, bûyî, ji dûr ve bêhn disitand, pê dihesiya û ji nişka ve xwe bi ser betlê nêçîra xwe ve ditepişand. Lê niha fena kêtroşka bêguneh melisankî, di bin perê xwediyê axaftinan de mabûyî. Te qet nedixwest ku ev qas biqed, ewqas ku bi te xweş dihat. Bi wê radeyê ku di ser te de kes peyda nedibû di karê lihevanîna axaftinê de, lê, dîsa jî nexwesteka herî dawî ya bi ser dilê te ve diniqutiya ew bi xwe bû.

Dem, weke ku naqede bi te dihat. Lê belê te weke navê xwe dizanî ku wê demeke kurt şunde ev fersenda mînanî genciniyekê bi te xuya dikir, di rengê civîkekî de ji nav destêne te derkeve û bifire here. Ma jixwe tim û tim wisa nedibû?

Di vê cîhana ku em jiyana xwe jê re parce dikin, lê ew pê nahese de tu kes tunebû ku qasî te zêde nêzîkê fersandan bibe û ewqas jî zêde fersandan ji dest birevîne. (Te berdida yan nedigihîstin ber destêne te?) Temenê te yekûna fersendêne jidestrevî bû.

Dema mirovan li te dinihêrtin, hema di cî de tê digihîsttin ku ci fersend hene li ser rûyêerdê ku xwe bi xwînê xwedî dike, tev ji nav kefa destêr te filitîne, çûne. Çarenûsa te çarenûsa jina wenda bû: Her fersendêr ku te wenda dikir, dibû vebalê hemûyan bi xwe.

Ev taybetmendiya ku te xelat girtibû ji rojêr raboriyê, tenê û tenê bi te dida nasîn ka çiqas êş û azar bi canê te daye û dide kişandin. Qasî deyza şewitandina Brahîm bilind û qasî heft barêr hestirêr kihêl giran bûn.

-li ser navê destpêkê wê roja giran û sext dihate bîra te-

çend car bi rik û kerb çuyîn û hatina te pêk hati bû, di ber wê mala biyanî ya ku rengê deriyê wê yê hewşê xwe arasteyî serweriya wan qabileyên babistîn ên çola dûr û bi tenê û xwe şewitandinê dikir? Di her neqlê de ew lawikê netepitî û xêza jênaçe avêti bû jînameya te û her dixwest xwîna li serê zindî bihêle, li ber derî, te digot qey lêviya te bû, bi çavêr xemnexwer û guhnedêrê hêza te çûyîn û hatin dişopand.

Di her neqlê de, ku te hewl dida bi bayê bazdanê bêeliqandin ji wê xala dojehî birevî û derbas bibî. Lê belê di her carê de wêrekî û lezginiya wê zarokê dihat û li ser navê şimaqake şidiyyayı dipekiya û di hinarakê rûyê te de dişiriqiya. Her derbasbûna te bi germahî û tevza wê şimaqê ezab û êşa dojehî bi te dida kişandin. Lê bêyî tiştek ji wan destêr te ên lewaz û qels were kor poşman, di nav bêtîrûşıya heyf û mixabinê de û sertewandî vedigeriyayı malê. Vê neqlê jî demjimêrên ku li malê bi ser te de diboriyan wî laşê te, yê ku ji ber tiştek ji dest nayê radihejiya vedigerandin hewşenga birîndarkirinê.

Te li xwe mukir nedianî, lê ev qasên malê yên di bin bandora wan demjimêran de diboriyan mînanî vehesandina serûmê li te dihatin. Ji serî heya binî wek şekirê qulqulî li te diqewimiya: Hem qulqulî dibûyî, hem jî diheliyayı.

Maliyan serên xwe diteqandin, lê nikari bûn wateyekê bidin vê rewşa te. Di nav heyîrin û şâşwaziyê de-hinek jî bêçare-li te dinihêrtin û li ber xwe diketin. Di ser de jî tênedighîsttin ka çima her ku diçe tu lewaz û qels dikevî. Şev û rojêr te bi dêrana birîndarkirinê derbas dibûn.

(Mêvan di rewşa pêgermokê de digote te; tu wêrek î, zîrek î, hêza te heye da ku dawî li vê rewşê bînî-qurpêni bi dilê te diket, lê ew pê nedihesiya)

Rojêñ xopan û dêrana birîndarkirinê li ser navê bez û goşt tiştek bi laşê te ve nehiştî bûn. Kê dikir ku li te binihêre, digot qey li ser wê siluetê çend hestiyên hişk û req mane,. Ema nizanibûn ku ji bêçaretiyê helandina te pêk hati bû. Li ba wan tiştekî din jî hebû, lê belê ka te ditirsîne yan jî dilê te digeşinê ne diyar bû.

çawa ku mirov çiqas bi tenê dimîne ewqas parce, wesle û birîndar dibe; tu hem tenê dimayî û hem jî parce, wesle û birîndar dibûyî. Ev ne ji wê azînê bû ku te bi dilê xwe bijarti bû: Hati bû û li ser daxa eniya te-ya ku berîdana wê di destê mirov bi xwe de ye-xwe dabû rûniştandin, bi alîkariya çend aliyên te yên nebes. Rewşa ku dihate jiyandin te anî bû xaleke wisa ku te li xwe mukir nedianî, ema her êvar bi xwestekeke mezin te xwe diavêt nav vê gola parçebûnê. Hêzek ji hundirîn her roj bi destê te digirt û ber bi wê kolanê ve dibir. Gava ku tu beref wê kolanê ve diçûyî, te tu caran li paş mîze nedikir. Hestêñ te, yên ku bi te dihatine jiyandin, di wê qasê de ewqas tevlîhev û li gor xwesteka dilê te bûn ku, ev taybetmendî li ber çavêñ te ên kortikî nediket.

Lawikê netepitî bi bendêmayîneke çarçavî çav li riya te bû. Ling û rûdêna te pîkolî dikirin, lê ew hêz-ku te bi xwe jî çi wate nedidayê û danasîna wî bi te peyda nedibû-te dida kişandin û li ber tevz û germahiya wê şimaqa ji pizotê agir dida sekinandin.

Dengê girîn û qîrînê bi ser bazdana te ya ber bi malê ve diket, incax di hundir de jî ew hêza ku danasîna wê li ba te peyda nedibû qîr û dirûşmeyên dilgeşiyê bi ser hilma xwêdana te ve dikirin.

Tu bi xwe-di nava şâşwaziyê de-dihesiyayî ku hin tiş bi te rû didin. Edî tu dihatî rewşike wisa ku roja piyêñ te li wir neketibaya û germahiya wê şimaqê di hinaroka rûyê te ê piçûcik de hilnegirtbaya, pişt re jî di nav qîr û dirûşmeyan de xwe negihandibaya odeya xwe a tenetiye sebr û hedana te nedihat.

Hema ji ber xwe ve ew pîlan û senaryoyêñ ku mebest li xwe anî bûn, bi alîkariya hinekan di nava bîryarmendiyê de herin û rûdêna wî lawikê netepitî bidin guhertin, ji hişpaka te derketi bû û çû bû.

Tu bi xwe dihesiyayî û baş tê digihîştî ku hebûna te li ser parçebûna xwe çedibû. Ev azîna xweçêkirina te-ku xwedayêñ mezin nekin nesîbê çi xwedîviyanê-bû. Lewma çend ezmûneyêñ li ser hev ku tu tê de peyda dibûyî, li ser te qasî vê azînê bandordar nebibûn. Ji te re nebibûn têkberê

nîşandana ci hebûniyê. Ji ber vê yekê te xwe bi paşil û pêşîr û hembêz bi wê azinê ve aland; da ku ji destên te neçe û nefilitê, her dem û qas dên û bala te li ser bû.

Hemû berevanî û bergiriya te hetanî wê rojê, ew roja ku stêrka gerok dikete dûpişkê û sêkûçeka neyinî bi stêrka neptûnê re çêdikir.

Dengê te bilerz bû, çökên te bilerz bûn, gavênu ku di nav peroşmendiya bêrave de diavêtin bilerz bûn. Hêdî û bidizika te xwe digihande wê kolanê, zamboq vala bû, te hewl dida ku tu herî ber deriyê wê malê, kes tunebû, her der vala û ker bû, lawik ne li ciyê xwe bû, mala xwe bar kiri bûn û çû bûne paş çiya û deştên nayêñ gihadin. Giyan di çökên te de nema û cihan tev de li ber çavêñ te reş bû.

Tu vipîvala mabûyî, îcilaftazî bûyî, bi tena serê xwe (jixwe tu bi tenê bûyî) û bêkes mabûyî.

Direcifiyayî, dileriziyayî, her aliyêñ te dihate hilanîn; her tişt li te sar û qesayî dihatin. Bi tenê û bêkes mayîn wek qesa û qufilandinê bû. Te xwe weke di nava hendefa bêbinî de hîs dikir; hesta ketinê laşê te di hundirê haritiyeke mezin de dierçiqand. Wisa li te dihat ku tu ji rakêşana erdê qut bûyî û mînanî berkareke ku hatiye avêtin nav valatiya gerdûnê bûyî.

Salêñ ciwanî û keçikaniya te di nav vê hesta valatiyê de derbas bûn û çûn. Hesta valatiyê û hesta qutbûna ji şûnewar weke aşûtêñ fetisok û xeniqok bi ser te de hatibûn û wê bedena te ya ku dişibiya darikê niftikê girti bûn nav dijwariya xwê û qasî 7 sal û 84 mehan di nav şidandina lepêñ xwe de bi xedarî gîvaştibûn. Dema ku tu bi ser hişê xwe ve hañî, te dît ku gihiştiyî 21 saliya xwe. Weke ku te sedsalekî derbas kiribe bi te dihat û tu tê digihîştî ka çîma dîroka jinê nehatiye nivîsandin. Qutbûna ji şûnewar ya te sedsalek bû, ya wan çend hezar sal: We heman çarenûs di eniya xwe de hildigirt. Hestêñ we mînanî hev bûn; bêpênas û nehatî nivîsandin.(ya jî qasî neyê nivîsandin bêrave)

Çarenûsa we weke hev bû, wê gavê dê heman rê ji hêla we ve hatibana şopandin.

Lê bi te mecal û hêz nemabûn ku karibî careke din bûyerék fena wê bûyera valatî û qutbûna 7 saliyê bijî. lewma te nedixwest careke din jîn û jiyanê li xwe biherimînî û xwe serserîkî biavêjî nav bûyerên paşnediyar. Te gavêñ xwe bi hendazetiyê diavêtin. Beriya ku tu bigihêjî biryarekê te

hemû vebijark venêran kir. Di dawiya dawî de tu gihîstî wê encamê ku herî û dûr bikevî ji welatê ku her roj tenêtiya te gurtir dikir.

Axaftinên wî bi ser hev de dihatin, bi dengekî nerm û dilovan ev rêzik li ser hev dikirin:

“Ew tolwergirtinên te ên zewqdar lê piçûcik, ji ber di xwe de nepeydakirina nîşandana hêza mezin in...”

Û te jî di nav hêrsa xwe ya di nav diranan (nediyar) de bi rengê sermayê wiha lê vedigerand:

“Tê bîra min, di zarokiya min de, mezinan li min dixistin. Ez tim bêçare û bêhêz dimam!”

Di wê xopan û wêrana zarokiyê de her ku lêdan li te diket, tolwergirtinên te jî zêderî digirtin ser xwe û yeko yeko toqên poran, berçavkên pîr û kalan, pênuşenê maliyan û solên mîvanan şikêndin di xwe de peyda dikirin.

Lê belê ev tenê nedigirt egerê xwe ji bêçareti û bêhêziyê, ew hezkirina ku kêmasî tê de dihate raberkirin, bi şikêndinâ tiştên piçûcik û hûrik li wan vedigeriya li ser navê heyf hilanînê. Û di aliyê din de jî wê parçebûna te jî li gor teşeyê lêkirinê kamil dikir.

Çawa ku parçebûn û birîndarbûn li xweşê te dihatin, parçekirin û birîndarkirin jî ewqas li xweşê te diçûn. Lewma dema ku te dilê mirovan dişikênd (ya jî dihiş) ji te re nedibû derd, de ka tu dilê hinekan dişikêni. Tenê xema te ew bû ku xelxela berjewendiyên te-ev teşeyê xweçêkirina te bû-dê bişikê; çokên te dileriziyan û hişê te tevlîhev dibû. Hingê hezarûyek rêk û azîn dihatin ber çavêن te, da ku wê şerîta xweçêkirinê bibî serî. Lê tiştên dibûn ne li gor xwesteka te bûn. Te digot qey di ciyekî de kêmasî hebû. Her çende ku bi parçebûn û birîndarkirinê xweçêkirina te-jî bo çend xulekan çêdibû jî-jî bo têrbûyînê qîm nedikir. Ew hesta tenêtiyê dev ji te bernedida û axîn û vaxîn ji te dianî.

Tu diçûyî kû derê weke siya te bi te re bû. Jixwe hevalê te, yê ku qet li te xiyanet nake ew bû. Te terîqet li ser terîqetan guhert, bajar li ser bajaran, welat li ser welatan, lê dîsa jî tiştek ji tenêtiya te kêm nedibû.

Zewac? Gengaz nîn bû ku tu wêrekî bi xwe re bibînî da ku wî sînorê nenas derbas bikî. Li ser vî rûyê erdê cîhanê çiqas kar û barêن girseyî peyda bûn, bi serlêdana te ve rû bi rû mabûn, ema yek ji wan jî nebibûn xwedîsiyana kêmkirina tenêtiya te.

Çima ewqas êşa tenêtiyê?

Ger ev pirs ji te hatibaya kirin, bersîveke ku te kariba bidaya tune bû. carna tu bi xwe ji li xwe heyirî û şâş dimayî.

Wê rojê hetanî ser devê xwe bi xembariyê ve dagirtî û tijî bûyî. Li ser bankê rûniştî bûyî. Lêviya trênen bûyî. Hizir û ramana te di wê kêliyê de erjeng hilû û şayîk bibûn, wek zayîna kêvroşkan li dor hev bilav dibûn. Zêde na, qaseke din dê ew trêna xeyalên tebihata, te li xwe siwar kiriba û biribana wan welat û şaristanên nenas. Tu bi her tiştên xwe ve hazir û amade bûyî. Lê ji kû derê derketi bû te bi xwe ji nizanibû, ew zaroka netepitî ya ku bi alîkariya destêن bavê xwe di nava jiyanê de bi rê ve diçû û gav diavêtin, hati bû kêlek te, hema ji nişka ve sekînî bû, bê sedem tif kiri bû porêñ te û çû bû.

Wî tu kuştibaya ji te re çêtir bû, erd qelişibû û tu heft qet binê erdê ve çû bûyî. Çû bû, te nikari bû ew bigirta, weke her car ku bi te diqewimiya, li ser navê fersenda dawî tiştek tune bû di destê te de. Ew kêliya ku tu li bendê bûyî trêna xeyalên te were û te li xwe siwar bike, bibe ber bi asoya hêviyên te ên mezin ve, ji kû derê hati bû nedîyar zarokekê netepitî- ku bi serê xwe nikari bû di nava jiyanê de gav biavêje, keti bû navbera te û wê asoyê û-her tişt li te herimandi bû.

Laşê te weke pertikên ber bayê dileriziya. Hesta fedîtiyê hemû goştê canê te di mengena xwe de derbas dikir: Tu hûr hûrî dibûyî!.. Te digot qey wê zaroka netepitî tifa xwe a kerax ne pekandi bû ser porêñ te, hema weke dequeke ku jê naçe bi ser xeyalên te ve zeliqandi bû. Di qasikekê de hemû hêvî û xeyalên te ji serî heya binî rûxandi bûn û li bin guhê hev dabûn. Êdî tu hati bûyî rewşeke wisa ku ditirsiyayî careke din wan xeyalên tiflîkirî biramî û bînî bîra xwe.

Lê di aliyê din de ew bûyera bêtalox-her çende ku te bi xwe ji fêm nedikir-rewşeke pir sosret û balkêş bi xwe re diafirand. Her roja ku di ser temenê te re derbas dibû, wisa dikir ku li ba te zêdetir hezkirin ji porêñ te re çê bibe, ku tu caran te wêrekî bi xwe re nedidît serê meqesê nêzîkê wan bikî. Te, ji wê zaroka netepitî (û hema bibêje ji hemû zarokan) nefret dikir, lê dîsa ci sosret û balkêş bû ku her qas û her kêli tilîkên destê te ên hestîkok li ser mûyên wan poran bûn û ji hezkirina naverasta dilê xwe wan mis didan:

Te digot qey ew tif bûye misk û ember, ewqas ku li

xweşa tilîkên te diçûn.

Ne ku ji kesên din re bibêjî, te wêrekî û zîrekî bi xwe re nedidît ku li xwe mukir werî û bibêjî, çî ye ev nakokî? Tu ewqas ji aşkerekirina wê nepeniyê ditirsiyayî.

Lê tenê û tenê te dizani bû li vê cîhana ku mirov weke mîroyan zêde ne, tikûtenê mirovek hebû li ser navê ku ewqas dilêr, serkeftinêr û fêris e; di karê derbeya dijminê xwe de ji xwe re paya xwe ji nû ve afirandin derxistine. Mirovên şaristana wî welatî-weke ku te hêvî dikir ji xwestek û payînên te re her çende ku nebi bûn bersîv jî-heke ku bibana nasdarê vê rewşa te, wê li ser her du çavêن xwe, di naverasta eniya xwe de çavekî din jî hiligirtibana.

Rojek ji rojêن ku tu di nav xwêdana şanogerîya rojhilaşî de dierçiçiyayî li wî welatê rojavayî tiştekî ku nehatiye dîtin qewimî.

Piştî nîvro bû, bi mebesta her piştî nîvroya asayı ya jiyana te serê xwe danî bû keviya kursî û di xew re çû bûyî. (xewn bû yan ne xewn bû te bi xwe jî nizani bû, belkî jî rastîn bû) Tiştê ku te dizanî, navnîşanek xisti bûn nava destê te. Belkî jî cara yekem bû ku di jiyana te de ewqas per û baskên şabûnê bi te ve çêbi bûn. Lê dîsa jî dilê te biqilqal bû; weke ku tu ji aliyekî xwe ditirsiyayî. Di hişê te de baş nedihate pênaşekirin, lê hîsek bi te re çêbi bû û bi te dida raberkirin ku dê gelek tiştên erêni çêbibin.

(Kê dizane, belkî jî stérka bercîs hatî bû û li ser burca te rûnişti bû)

Ev ji bo te dihate wateya gaveka nû. Dibe ku jiyana te (ya ku li te pir zor dihat) bikeve duriyanekî û beref başbûnê ve biçe. Ev yek dihişt ku hizra te ya di der barê çarenûsê de hindek guman û şikan bihewîne. Hêdî hêdî ramana te beref ku ev jiyana ne çarenûs e, xweçêkirin êdî pêk nayê ve disewiya û dihişt ku pê re hêviyên nû derkevin rastê.

Bi rastî jî pêdiviya te bi vê zaf hebû. Tenê te dikaribû wate û girîngiya vê teslîm bikira. Ji ber ku tenê te dizani bû ka ci dijî û ci najî.

Her çende ku tiskirina wê zaroka netepitî li ser hêviyên te yên welatê rojava ê xwedî sikümên qesayı çêbibe jî, te dev jê berneda bû û heman rîgeh şopandi bû. Mirovên wan deran nedîşibiyan te, jiyana wan ne wek jiyana te bû. Pê dihesiyayî ku her tiştên virê ji te cewaz in û bi te zehmetê didine jiyandin. Hema di ciyê xwe de rûnişti dikarî hezar sedem û bahaneyên li wir nemayînê jimartiba.

Te bi xwe jî dizanî bû ku li ciyekî binê lingê mirov bixurî, hincet û bananeyên mirov weke kuvarkan şîn dibin.

Jixwe mayîna te ne ji kêfê, ji neçariyê bû: Mîna çarenûsa tevahî jinan.

Her rojêñ derbas dibûn, bi derbasbûn û dûrbûna xwe re te jî ji wê nêvengê dûr dikirin. Ev yek di aliyeķî de dihişt ku ji bilî xwe kesî esas negirî û di aliyeķî din de jî dibû sedem ku li hember xeta ronahiyê xwe negirî dest. Jiyana te, ya ku di nav vê ketûberiyê de berdewam dikir ne li gor xwesteka te bû. Te têr nedikir, qîma te pê nedihat, lewma li hember derdora xwe tim dibûyî belavkar, birîndarkar, eşandiner û jandar.

Bertekêñ te yên ji nişka ve weke birînêñ kêm girtî diman, li ser mirovan. Lewma ne keçik hevalêñ te yên ku te bidizîka toqêñ wan dişikêñand mabûn li dora te, ne jî kurik hevalêñ ku awêneyên wan biderizînî. Bêhewldan û nêrîn, hema ji ber xwe ve tu bibûyî tenahîparêz. Êdî ev ji te re nedî bûn xem, di nava destê te de navnîşaneke qirase hebû. Her tişt bi te weke jiyanekî nû xuya dikir. Ew rojêñ ku tu neçar dimayî li diji xwe şer vedî li paş diman, ew qasîn tirsa ku wê pêgirê hilweşînê bê, pir li paş mabûn-dûr bûn-niha tiştekî nû hebû. Wê pêdiviya te bi zirxêñ nû çêbibaya yan na?

Te nizani bû, jixwe yên bi te peyda dibûn besî temenekî dikirin.

Te lixwekirina zirxan baş pêk dianî, gengaz bû ku di aliye de bikevî kemasîyan, ema di vê xalê de qet û qet. Lewma di kîjan demê de bi kîjan cilûberkê-bi gotina zelal zirxê-kîjan zilam ango jinê li xwe bikî ne diyar bû. Lê heke ku deşîfre bibûyayî cîhan tev de hatibana nikari bûn careke din wê zirxê bi te bidine wergirtin, ewqas ku tu di vî karê xwe de hesas bûyî û ev yek jî dihişt ku li derve tu weke yeke ku tenêtî qet li dorê peyda nabe dihañi nasîn.

Ji bo te kesan bi xwevegirêdan bêwate bû, jixwe ci demê mebesteke te ya wisa li dar neket û diyar bû ku dê li dar nekeve jî. Te ne li jor otoriteyê dipejirand, ne jî di bin xwe de rajêriyê. Qasî ku bi wan tiştan re mijûl bibî wextê te tune bû. Hemû derdê te ew bû ku di vê navnîşana nû de mînanî wan her du lawikêñ netepitî peydakirina yekî bû.

Di rojeke tiji baran de ketî rê.

Di rojeke şapebaran de xura lingêñ te bi xwêdanê re nasdar bûn.

Di hinavêñ te de dengekî digote te; jixwe jiyan şapebaran e!

Baran dibariya û laşê te di bin barana bihara sala nû de ber bi jiyana

xwe ve diherikî.

Hatî û gihîstî şûnewarê ku te di dilê xwe de dihewand.

Mirov, pêşî şûnewarê xwe di hundirê dilê xwe de dihewîne û mezin dike.

Ji ber ku di dilê her mirovê de şûnewarek heye, (kes nizane, lê) ev şûnewar tenê û tenê Zagros e. Û te di dilê xwe de Zagrosek hildigirt û diçûyî Zagrosan.

Piştî çend salên li paş hiştinê di dilê te de Zagros û tu li Zagrosan, te dest bi nivîsandina çêrokekê dikir, di dawiya dawî de xala ku tu hati bûyê ev bû û bi ya te pêkhatineke qençtirîn bû. Te dizanî çêroknivîsandin xweçêkirin e.

Jixwe sê cure azînên xweçêkirinê hebûn li ser rûyê erdê vê cîhana bisemyan.

Te serî li ya sêyemîn xisti bû, ji ber ku şensê te yê serî li ya yekemîn ya ku bi riya Gelawêjê dihat, nav li xwe datanî evîn û ya duyemîn ya ku bi riya kuştinê ve li dar diket tune bû; Gelawêj dûrî te bû û qasî ku tu nikaribî kesan bikûjî dilê te ji xwînê li hev diket.

Te çêrokeke ku di hundir de yek dilêr peyda ye nivîsand. Tenê dilêrek, dilêrê ku ji hêla kesî ve neyê parvekirin.

Dilêrê ku dê te rizgar bike ji tenêtiyê. Dilêrê ku dê te li ser baskên sîcivîkan bi xwe re bibe paş çiyayê Qaf. Dilêrê ku keybanûya wî ya li ser pişa hespê spî tune ye. Dilêrê ku xwemalê afirandinêra xwe ye û bibe dildarê wê.

(Edî axavtinê we beref dawiyê ve diçûn. Jixwe hizra te jî ew bû, çend xulek mabûn ku agirê çemberê temam bibe-te nedixwest ku tu qet gavan bi wir ve biavêjî, hesta çûyînê mînanî mirinê bi te dihat-lê te hîs dikir ku hêdî hêdî beref hinek tiştan ve dihatî.

Ev hîskirin kujoker bû-ne birîndarkar)

Tu, bi dilêrê çîroka xwe re bibûyî yek, ku kesî nikari bû pê derxîne ka afirandinêra wî tu bi xwe yî yan na. Tevahîbûna te pê re pêk hati bû. Di heman demê de ev dihate wateya çiqilekî nû di jiyanê de, ku tu karibî pê bigirî. Cara yekem bêtenêtî, bêbirîndarkirin, bêparçebûn, bêweslebûn, bêherijîn, bêlêdan, bêletebûn û bêxorekirin xweçêkirina te pêk dihat, him jî bi afirandina gor xwesteka te.

Her tiştîn dilêr bi destê te û li gor xemla xwestekên te hati bûne

çêkirin. Lewma te xwe di vê xalê de pir şensdar hîs dikir û payek ji xwe re jê derdixist.

Stêrka Gelawêjê dûrî te bû, lê tîra evînê li nav kevçika dilê te keti bû; him jî çawa ku te xwesti bû wisa.

Tu evîndar bibûyî, evîndara afirandina xwe, evîndara dilêrê çêroka xwe.

Te xweşik afirandi bû û tu li bendê bûyî ku evîna te jî xweşik pêk were û bibe çêroka evîndariya ku ji dîrokê re bibe mal. Hebûn û tunebûna te ev bû. Çiqilê jiyanê ê mayî di destê te de tenê ev mabû.(xwedê neke ev jî biçe!..) bêyî vê ne tu ne jî jiyanâ te li ber çavên te şenber nedî bûn.

(Wî pirsa dawî ji te dikir, beriya ku derbasî axaftinên xatir xwestinê bibe:

“Di nava artêşa rastiyan de, tu weke dererastiyekê dikarî şer bikî û xwe li ser piyan bihêlî?”

Gotinên te ji birtyarmendiyê wêdetir pelçiqî û şikestî bûn:

“Ez ne dererastiyek im. Ez lêgereke azadiyê me!”)

Dererastî çî bû? Çî ye lêgera azadiyê?

Te digot ez lêgereke azadiyê me, lê hemû hewldanên te, ji bo rajêrkirina dilêrekî bûn. Belkî jî diviya bû ku tu çirokeke bêdilêr binivîsinî. Û tu bêxebera xwe hatibûyî xala ku te qet nedixwest û hêvî nedikir: Xala rajêrkirinê!

Te bi xwe jî dizanî ku ev, ne bi te ne jî bi çarenûsa we peyda dibû. Di pênasekirina xwe de jî zor bi te dihate jiyandin.

Afirandinêra ku dixwaze afirandina xwe bike kole!

Ne wêrekî ne jî hêza ravekirina vê bi te re ne peyda bû, de ka tu karibî ji dilêrê xwe re, vê rewşê vebêjî. Gotin jî li te ecêb û xerîb dihatin. Hesteke wisa bi te re çedîkir ku te ji ber xwe ve şerm û fedî dikir.

Te bi gotinan û axaftinan nedigot, lê belê yeko yeko zincîrên xwe ên binkeftinan bi hewayeke dêlindêzî û homanî ji stûyê xwe derdixist û hewl dida ku li stûyê dilêr bikî. Bi rastî jî li gora te azadî çî bû?

Kolekirina berdilka dilê me bi xwe bû yan na?

Te nizanibû ku piştî gaveke din dê di dilê te de gotinên wiha biggerin; ax dilêrên çêrokan, rasteqîna mirovên cîhana tuneyî, belkî jî hinekan xwestek nîşan nedabana da ku têkevin şûna we, ne dilêriya we dima, ne

jî rasteqîna we. Baş e hun çîma hez dikin ku tehde û azarê bi afirandinêrên xwe bidin kişandin û wan çiya bi çiyayan, diyar bi diyaran, deşt bi deştan li pey xwe bidin gerandin?

Û niha afirandinêra we bênav, û niha afirandinêra we bênasname...

Û vêga tu bênav, û vêga tu bênasname, rasteqîneke şilfûtazî û bêçare...

Û vêga tu di paşila xwe de germahiya dilêrê çêroka xwe hildigirî, bi hilgirtineke bêpêşnûma...

Wî bi derbirîneke vebir goti bû te:

“Dereng e, divê ez biçim!”

Deng bi zorê ji qirika te (ew jî bi xizêniyê) derdiket:

“Ma tu bimînî nabe?” e di qirnik de bû.

(Dûpişkan kengê stûyê xwe dixistin qirnik?)

